
# Bo Dîrokê

Mesûd Barzanî



# Bo Dîrokê

Mesûd Barzanî




خارطة مستحدثة
لولايات
المملكة العثمانية
في اسيا
١٨٩٣
تنبيه
ولايت قسطموني
ولايت طرابزون
ولايت انقره
ولايت سيواس
ولايت ارزروم
ولايت بتليس
ولايت دياربكر
ولايت قونيه
ولايت اطنه
ولايت حلب
ولايت بيروت
ولايت الشام
متصرفية القدس
متصرفية الزور
جزيرة قبرس
بادية الشام او صحراء سوريا




Nexşeya desthilata împeretoriya osmaniyan li Asyayê. Sala 1893-yê di serdema xelîfetiya Siltan Ebdulhemîdî de. Di vê nexşeyê de pir aşkera diyar e ko Kerkûk dikeve cihekê merkezî yê Kurdistanê.




Nexşeya împeretoriya osmaniyan ko Monis D'aniville 12-ê adara 1794-ê li Londonê çêkiriye û tê de behsa beşek ji cografyaya Kurdistanê dike.


A NEW MAP
OF
TURKEY IN ASIA
BY MONSR. D'ANVILLE
First Geographer to the most Christian King
with Several Additions
LONDON
SCALE
LAKE OF VAN
LAKE OF URMIA
ARMENIA
GEORGIA
KURDISTAN
SYRIA
IRAK ARABI
IRAK AJAMI
KHOSISTAN
BARRAE AL SHAM
or Desert of Syria
ARABIA DESERTA
AL DAHNA
Desert Plain
GULF OF PERSIA




Nexşeya împeretoriya osmaniyan ko di sala 1834-ê de Henry Treesdale & Co. li Londonê bilav kiriye û tê de behsa beşek ji cografyaya Kurdistanê hatiye kirin.



TURKEY IN ASIA.
British Miles 69 to a degree
20 40 60 100 120
Turkish Agachs or Leagues 22 to a degree
10 20 30 40 50
ARMENIA
KOURDISTAN
ALGEZIRA
IRAK ARABI
SYRIAN DESERT
ARABIA
PERSIA
TREBIZOND
ERZEROUM
DIARBEKIR
ALEPPO
BAGDAD
Palmyra
Mosul
Kirkook
Samara
Bayazid
Moosh
L. Van
Ooroomia Lake
Maragha
Nakshivan
Kars
Delibaba
Harran
Orfa
Sinjar
Karkisia
Taiba
R. Euphrates
Altoun Kupree
Shahrazour
Kerkook
Holwan
Mendeli
Hillah
Sumeira
BASSORA
Coma

# Bo Dîrokê

## Mesûd Barzanî

Werger: **Arif Zêrevan**

Grafîk/mîzanpaj: **Aso Mamzade**

Çapa yekê: **Adara 2021-Hewlêr-Kurdistan**

Tîraj: **1000**

Çapxane: **Roksana**

Li Birêvebiriya giştî ya kitêbxaneyên giştî hejmara referansê: 121,2021

© Bêyî destûreka nivîskî, kopîkirin, liberzêdekirin û jinûveçapkirina vê kitêbê bi her awayî qedexe ye.

© Mafê wegerandin û çapkirinê ji bo Dezgeha Xêrxwaziyê ya Barzanî parastî ye.

Pêşkêşî wan kesan

dikim

**ko serê xwe natewînin!**

# Nêverok


- Pêşgotin 14
- Dabeşbûna Kurdistanê 18
- Damezirandina dewleta Iraqê 24
- Şoreşa îlonê 30
- Plana jihalêrakirin û asîmîlekirina miletê kurd di dewleta Iraqê de 35
- Serhildan 39
- Konferansa opozîsyona Iraqê û roxiyana rejîma berê 42
- Şerê Daişê 48
- Bêhêvîbûna kurdan ji Iraqa nû 55
- Serdan bo Emerîkayê 59
- Serdana bo Bexdayê 63

- Biryara pêkanîna referandumê 66
- Reaksiyon û givaştinên nêvdewletî 80
- Civîna Sihêlan 83
- Miletî dengê xwe da 88
- Reaksiyona hikûmeta Iraqê 94
- Şazdehê oktoberê 98
- Gotina dawiyê 106
- Servehî 113
- Belgename 199
- Endeks 247
- Nexşe 265


نەتەوەیی و ئاینیی یە کانی
بە خێر هاتنی گەرمی
هەرێمی



**Başîk: 16-ê çiriya-paşiyê ya 2016-ê**
Şahiya biserketina operasyona azadkirina Başîkê

# Pêşgotin

Kurd miletek in ko xudanê tarîx, cografya, ziman, kultur, urf û adetên xwe yên xweser in û eve bi hezarên salan in li ser axa xwe dijîn. Di vê midetê de ew pêbendên xisletên lêborîn û pêkvejiyanê bûn û cihê şehnaziyê ye ko kultura pêkvejiyana digel milet û dînên dî di nêv miletê kurd de reh û rîşên kûr û tarîxî hene. Di van pêncsed salên borî de miletê kurd karî xwe ji gelek mihaweleyên asîmîlasyonê û jihalêrakirinê rizgar bike.

Pênc sedsalan berî niho welatê kurdan di nêvbera împeretoriya osmanî û sefewiyan de hat dabeş kirin û piştî şerê yekê yê cîhanê bêyî viyana xwe kurd di nêvbera çar dewletan de hatin dabeş kirin. Vê dabeşbûnê rewşeka jeosiyasî ya gelek tevlihev afirand. Pir mixabin li hîç parçeyekê îtiraf bi mafên rewa yên kurdan nehat kirin û înkara hebûna wan hat kirin. Di encama wê siyaseta çewt de rikeberiyeka dûrûdirêj peyda bû ko hêdî ne hikûmetan karî miletê Kurdistanê ji halê rakin û ne jî kurdan karî wan rejîman biroxînin. Di vê yekê de xusardîtiyên herî esasî miletên vê deverê, aştî û îstiqrar bû, û xwîneka zêde rijiya. Ev realîteya nesaxlem ji me re dibêje divêt

herdu alî li xwe vegerin. Li şona şerî û înkarê hizra xwe li çareseriyeka demokratîk û aştiyane bikin. Bi hikmê wê realîteya ko di vê sedsalê de çêbûye her parçeyeka Kurdistanê xweseriyeka xwe peyda kiriye û çênabe problem û çareserkirinên her parçeyekê bibin nimûne bo parçeyên dî. Divêt doza her parçeyekê li gor xweseriyên wê û rewşa wê, di çarçeweya diyalogê û emrazên aştiyane û demokratîk de bêt çareser kirin.

Ev kitêb lêdixebite ko ronahiyê bêxe ser tarîx û êşên wê parçeya Kurdistanê ko eve sed sal in bi Iraqê ve hatiye leziqandin. Heger bi parçeyên dî re miqayese bikî li Kurdistana Iraqê tevgera rizgarîxwaz ya kurdan zêdetir geş bû û rikeberiya hikûmetên wê jî digel kurdan dijwartir bû, û herwiha marjînalîzekirin û eziyetdana kurdan jî dijwartir bû heta gehiştiye asta jenosîdkirina miletê kurd. Lê belê di heman demê de firseta lihevkirinê û hewldanên ji bo çareserkirina doza kurdan jî zêdetir bûn û di nêv aliyên siyasî û merkezên iraqî de jî gelek şexsiyetên ereb hebûn ko dostên kurdan bûn û fêmkirineka wan ji bo doza rewa ya miletê Kurdistanê hebû.

Dewleta Iraqê ji destpêka avabûna xwe ve heta qunaxa 2003-yê şirîkatî û şirîkbûna digel kurdan pêkneanî û lêxebitî ko kurdan wekî dûvelangekê bihêle û di nêv miletê serdest yê erebên Iraqê de asîmîle bike lê belê di wê yekê de bi ser neket. Piştî sala 2003-yê kurd – piştî jêqutbûneka diwazdesalî ji Iraqê - bi awayekê dilxwaz vegeriyan nêv Iraqê û beşdarî di jinûveavakirina Iraqeka demokratîk û federal de kirin ko tê de qanûna-esasî mafên hemî aliyan garantî

bike. Lê belê mixabin piştî vê firsetê hikimdarên nû yên Iraqê jî ders ji tarîxê wernegirt û xeletiyên berî xwe dubare kirin.

Dewleta demokratîk ya federal formê dewleteka mezhebî wergirt ko xebat ji bo marjînalîzekirin û destdanîna ser îradeya herdu pêkhatiyên kurd û sunî de kir. Desthilatdarên nû yên Iraqê rêya tolstandinê ji xwe re bijart. Biryar û reftarên desthilata Iraqê mezhebî bûn û ev bi xwe jî belgeyek bû ko desthilatdarên nû yên Iraqê bi xwe gav ber bi dabeşbûna welatî ve avêtin. Wan piştî sala 2005-ê, dema hêdî hêdî cihê piyên xwe qayîm kir, partika xwe da qanûna-esasî, şirîkatiyê û prensîpên lihevkirinê û balansê. Pêncîûpênc madeyên qanûna-esasî binpê kirin. Binpêkirina qanûna-esasî û xebata wan ya bi ruhê mezhebî hîç menayek ji bo yekparçetiya Iraqê û hevdengiya niştimanî nehişt. Pêbendnebûna hikûmetên Iraqê bi qanûna-esasî ve û piştguhkirina bingehên şirîkatiyê, lihevkirinê û balansê û hewildana bo marjînalîzekirin û biçûkkirina rola Kurdistanê û wê bêîstiqrariya ko li Iraqê hebû, miletê Kurdistanê dehf da ji bo hizra xwe li rêyeka dî ya çareserkirinê bike.

Ew rewşa li Iraqê çêbûbû miletê Kurdistanê jê ne berpirs bû, belko berpirsiyariya esasî li ser milên hikimdarên nû yên Iraqê bû ko baweriya wan bi qanûna-esasî û bingehên şirîkatiyê nebû. Lewra mafê miletê Kurdistanê bû bipirse: ”Baş e piştî wan hemî neheqî û êşên bêsînor çima ew ne amade ne ko şirîkatiya kurdan di dewletê de qebûl bikin? Heger

wan şirîkek nevêt kurd çi bikin? Aya wekî dûvelang digel wan bimînin? Wan şirîkatî navêt û kurdan jî dûvelangbûn navêt. Baş e miletê Kurdistanê çi bike û kîjan rêyê bide ber xwe? Pirsiyara cewherî ew bû aya ji bo çi em rêya çareseriyeka esasî ji bo vê problema tarîxî ya ko tejî êş e nedin ber xwe, çareseriyeka ko aştiyane be û encama wê jî brayetî û aştiya daîmî be. Digel wê jî di vê rewşê de pêwist bû bêt zanîn ka miletê Kurdistanê çi dixwaze û guh lê bêt dan.

Aya kurd dixwazin di bin vê neheqî û karesatê de wekî dûvelang bimînin yan daxwaza serxwebûnê dikin? Di 25-ê îlona 2017-ê de miletê Kurdistanê bi awayekê aştiyane dengê xwe aşkera kir û wî dengê rewa biserketin bi dest ve anî. Reaksiyona Iraqê, ya dewletên cîran û ya civata nêvdewletî li hemberî dengê aştiyane yê xelkê Kurdistanê zalimane bû û ji prensîpên mirovahiyê û pêkvejiyanê dûr bû. Wisa diyar bû hemî alî li ser wê yekê musir bûn ko divêt êşên miletê Kurdistanê û jiyana digel eqliyeta înkarker berdewam be, ji ber berjewendiyên wan wisa dixwest.

**Mesûd Barzanî**
Îlona 2020-ê, Hewlêr

# Dabeşbûna Kurdistanê

Di şerê Çaldiranê de[1] ko sala 1514-ê di nêvbera împeretoriya osmanî û sefewiyan de çêbû, Kurdistan bû meydana şerê di nêvbera wan herdu împeretoriyan de. Encama wê jî dabeşbûna axa Kurdistanê di nêvbera van du împeretoriyan de û pirtûbelavbûna miletê kurd bû. Cara dawiyê sala 1639-ê împeretoriya îranî û osmanî bi navê Peymana Zehawê li bajarokê Serpol-Zehawê[2] peymana dabeşkirina Kurdistanê mohr kir. Bi vî rengî ji çaran sêyê axa Kurdistanê ket bin desthilata osmaniyan de û yek ji çarê jî ket bin desthilata îraniyan de. Lê belê ew dabeşkirin û zordarî nehat wê menayê ko ew herdu zilhêzên wê demê bikarin miletê kurd asîmîle bikin û ji halê rakin. Miletê Kurdistanê digel wê dabeşkirina bi darê zorê, heta demekê dûrûdirêj karî ziman û urf û adetên xwe biparêze û bi rêya serhildan û şoreşan û qebûlnekirina sitemkariyê parastinê li nasnameya xwe bike. Herçend şoreş û serhildanên kurdan rûbirûyê tepeserkirin û nemanê dibûn jî liberxwedana li hemberî zilmê di sedsalên borî de yek ji xisletên takemirovê kurd bû.

---

1. Şerê Çaldiranê 23-yê tebaxa 1514-ê di nêvbera împeretoriya osmanî û sefewî de çêbû. Di wî şerî de osmaniyan karî sefewiyan bişkênin û bajarê Tebrîzê yê ko wê demê paytexta sefewiyan bû bigirin.
2. Bajarokê Serpol-Zehaw ketiye ser wîlayeta Kirmaşanê ya li rojavayê Îranê û niştecihên wê kurd in.

Bihara 1907-ê, bi beşdariya Şêx Evdilselamê didoyê yê Barzanî li mala Şêx Nûredîn Mihemedê Birîfkanî yê rêberê tekiyeya qadirî li Birîfkan civînek çêbû. Herwekî berê min di kitêba ”Barzanî û tevgera rizgarîxwaziyê ya kurdan” de nivîsiye, di wê civînê de hejmareka zêde ya serokeşîr û mezinên kurdan bi telegrafekê daxwaz ji siltanê osmaniyan yê li Stenbolê kir da rê bide:

1. Zimanê kurdî li deverên kurdan bibe zimanê resmî û xwendin bi zimanê kurdî be.
2. Qeymeqam, midûrên nehiyeyan û karbidestên deverên kurdan divêt zimanê kurdî bizanin.
3. Ji ber ko dînê dewletê îslam e, divêt biryar li gor şerîeta îslamê bên dan.
4. ”Bacên xizmeta dewletê” ji bo nûjenkirina rêûdirban û avakirina xwendingehan li deverên kurdan bên xerc kirin.[3]

Di wê civînê de amadebûyiyan sond xwar ko daxwazên xwe biparêzin û dest jê bernedin û wan xwest ko Şêx Evdilselam li şona hemiyan telegrafekê îmza bike. Dema dewleta osmanî ew telegraf wergirt, ew wekî derketiyê ji bin hikmê seltenetê û daxwazkarê miameleyeka taybet û cidaxwaziyê wesif kir. Bi vê minasebetê ve girêdayî di dawiya sala 1907-ê de hêzek di bin fermandariya Mihemed Fazil Paşayê Daxistanî rêkir ser wî. Ji wan serokeşîran yekê tenê jî li ber xwe neda û hemî bargiranî xistin ser piştа devera Barzan. Şêx Evdilselamê Barzanî fermana liberxwedanê da û barzaniyan bi qasî du mehan li ber xwe da. Di encamê de Şêx hat bêçare kirin ko dest ji devera xwe berde û penaya xwe bibe cem Mar Şim‘ûnê asûrî. Daxistanî gehişt Barzan û gundê Barzan

3. Barzanî, Mesûd (2020), ”Barzanî û tevgera rizgarîxwaz ya kurdan, cildê yekê 1958–1931”, rûper 20, Çapxaneya Rojhilat

şewitand û Mistefa Barzaniyê temen sêsalî digel dayika wî êxsîr kir û bi qasî yek salê li zindana Mûsilê de hat girtin.[4]

Sala 1908-ê, Şêx Evdilselam vegeriya devera Barzan, hejmareka barzaniyan li gundê Babsêva – yê ko dikeve pişt Çiyayê Şîrîn li bakurê gundê Barzan – civand û êrişî wan hêzên tirkan yên li deverê kir û ziyaneka mezin da ordiya osmaniyan. Bi wê serketina mezin osmaniyan daxwaza diyalogê ji Şêx Evdilselamî kir û di netîceya wê diyalogê de Şêxî êxsîrên osmaniyan azad kir û wan jî tezmînata xusara barzaniyan da. Lê belê di sala 1913-ê de, Silêman Nezîf Paşayê waliyê Mûsilê ji nû ve êrişî devera Barzan kir û dîsa Şêxî terka deverê kir û vê carê berê xwe da gundê Rajanê yê li nêzîkî Urmiyeyê li Rojhilatê Kurdistanê û çû cem Seyîd Tahayê Mihemed Sidîqê Nehrî[5]. Siltanê osmanî xelateka mezin ji bo girtin yan kuştina Şêxî ragihand.

Hizra serxwebûnxwaziyê berî ko împeretoriya osmaniyan hilweşe jî li cem serkirde û zelamên mezin yên kurdan hebû. Nivîskar û seyyahê brîtanyayî William Ainger Wigram [1872–1953] di kitêba xwe ”The Cradle of Mankind: Life in Eastern Kurdistan” (Landika mirovahiyê: Jiyan li Rojhilatê Kurdistanê) de behsa wê çendê dike ko wî bi çavên xwe Şêx Evdilselamê Barzanî dîtiye. Dema ko wî xwest ji bo çend mehekê vegere Brîtanyayê, Şêx Evdilselamî amadehiya xwe nîşan da ko digel wî biçe Brîtanyayê da bikare li Brîtanyayê daxwazê ji serokê dêra Canterbury bike da dibistanan li gundên Kurdistanê ava bikin. Û paşê jî serdana Qral Goerge V-ê bike da digel wî rûne û behsa doza kurdan û serxwebûna wan bike.[6]

---

4. Barzanî, Mesûd (2020), ”Barzanî û tevgera rizgarîxwaz ya kurdan, cildê yekê 1958–1931”, Çapxaneya Rojhilat
5. Barzanî, Mesûd (2020), ”Barzanî û tevgera rizgarîxwaz ya kurdan, cildê yekê 1958–1931”, Çapxaneya Rojhilat
6. Wigram, W. A. (2010), ”Mehd El-Beşeriye fî şerq Kurdistan”, rûper 123, wergera bo erebî: Cercîs Fethullah, Weşanxaneya Aras bo çap û belavkirinê, Hewlêr

Sala 1914-ê li gundê Rajanê, Şêx Evdilselam digel Mar Şim'ûnê asûrî û Endranîk paşayê ermenî çû Tiflîsê[7] û qasidê Çarê Rûsyayê dît û li ser damezirandina dewleteka federal ko ji kurd, ermenî û asûriyan pêkbêt axaftin digel qasidê rûs kir. Qasidê rûs soza piştgiriyê da wan ko dê ji bo rizgarbûna ji osmaniyan arîkariya wan bike. Hêjayî gotinê ye dema wezîrê derve yê Rûsyayê Sergei Lavrov heftê oktobera 2019-ê hat serdana herêma Kurdistanê, li bajarê Hewlêrê ji min re got li gor belgeyên Rûsyayê kesek ji familyeya barzaniyan, mebesta wî Şêx Evdilselamê Barzanî bû, serdana Rûsyayê kiriye û Çarê Rûsyayê dîtiye.[8] Ev agahdarî ji bo min gelek nû bû ji ber heta wê demê min wisa dizanî ko Şêx Evdilselamî li Tiflîsê tenê qasidê Çarê Rûsyayê dîtiye. Rûdanên piştî wê serdanê û herwiha rûdana şoreşa oktoberê ya sala 1917-ê li Rûsyayê ew hizir-û-plana ko rûsyayî jî piştgiriya damezirandina dewleka bi wî rengî bikin ji halê rakir.

Piştî vegeriyana ji Tiflîsê, Şêx Evdilselam û hevrêyên wî bi planeka ji nişka ve hatin desteser kirin û teslîmî osmaniyan hatin kirin. Osmaniyan di destpêkê de Şêx Evdilselam neqlî Wanê kir û ji wêderê jî neqlî Mûsilê kir. Di wê dema ko ew çend roj bûn şerê yekê yê cîhanê[9] destpê kiribû de, roja 14-ê kanûna-yekê ya sala 1914-ê, Şêx Evdilselam digel hevrêyên xwe hatin îdam kirin.

Divêt ez bibêjim, piştî şehîdkirina Şêx Evdilselamî, Şêx Ehmedê

7. Paytextê komara Gurcistanê

8. Çarê Rûsyayê, Nikolay Alexandroviç Romanov, yan jî Nikolayê II-yê (1868–1918), çarê her dawiyê yê Rûsyayê bû, ji sala 1894-ê heta 1917-ê împeretorê Rûsyayê bû.

9. Bi bihaneya kuştina Archduke Franz Ferdinand bi destê Gavrilo Princip ko endamê grupeka serxwebûnxwaz ya sirbî bû, roja 28/6 1914-ê împeretorê Awisturya-Macaristanê li dijî Sirbistanê şer îlan kir û roja piştî wê împeretorê Rûsyayê, Brîtanyayê, Fransayê û paşê jî Îtalya, Portekîz, Romanyayê piştgiriya Sirbistanê kir. Li hemberî wan jî Elmanyayê û osmaniyan xwe tevlî şerî kir. Di wî şerî de ko wekî "şerê yekê yê cîhanê" têt nas kirin, zêdetirî deh milyonan kes hatin kuştin û roja 11/11 1918-ê bi şikestina cepheyê Elmanyayê (Austurya-Macaristan) û împeretoriya osmaniyan xelas bû.

brayê wî ko temenê wî tenê 18-salî bû serokatiya barzaniyan li xwe girt. Ev di demekê de bû ko ordiya ingilîzan di heman dema gurbûna şerê yekê yê cîhanê de axa Iraqê û başûrê Kurdistanê dagîr kiribû. Berî ko şer xelas bibe desthilatdarên hevpeymanan zincîreyeka rêkeftinnameyan di nêv xwe de mohr kirin da biryarê bidin aya çawa serpereştiya deverên osmaniyan bikin û kîjan hêza hevpeymanan dest dane ser kîjan beşa împeretoriya osmaniyan ya şikestî.

Her di wê çarçeweyê de bi niyeta dabeşkirina deverên osmaniyan, dîplomatê Brîtanyayê Mark Sykes û dîplomatê Fransayê yê li Beyrûtê François Georges-Picot – piştî peymaneka dualî û rêkirin û wergirtina nameyan digel Sergei Sazanovê wezîrê derve yê Rûsyayê – li bajarê Saint Petersburgê civiyan û biryara wê plana nehênî dan ko Mark Sykes û Georges-Picot ji bo dabeşkirina axa osmaniyan dariştibû. Bi vî rengî dewletên hevpeyman roja 16-ê adara 1916-ê pêşniyara xwe bi navê "Peymana Sykes-Picot" ji bo dabeşkirina dewleta osmaniyan îmza kir. Di wê peymanê de biryar hatibû dan ko devera Erzirom, Trabzon, Wan û Ermenistana osmanî bidin Rûsyaya Çar.[10] Fransayê jî herêma Sûriyeyê û Libnanê werdigirt û Brîtanya jî dibû "qeyûma" Iraq, Urdin û Filistînê.

Di wê dabeşkirinê de Kurdistana di bin destê împeretoriya osmaniyan de kirin sê beş. Beşa mezin ya ax û miletê kurd wekî xwe hiştin û herdu beşên dî bêyî rizamendiya kurdan li ser dewleta Iraqê û Sûriyeyê de hatin dabeş kirin herçend ew hêj ava jî nebûbûn. Di nîsana 1920-ê de hêzên hevpeymanan di civîna

10. Di oktobeta 1917-ê de komunîstên Rûsyayê bi serokatiya Vladimir Lenîn dawî li desthilata çarê Rûsyayê anî û ji peymana Sykes Picot xwe vekişand û roja 17/11 1917-ê teksta peymanê di rojnameya Pravdayê û Îzvestiyayê de ji bo raya giştî û miletên wê deverê aşkera kir. Sê rojan piştî hingê di rojnameya "The Manchester Guardian" de nêveroka wê hat bilav kirin.

San Remoyê[11] de li hev kir ka çawa Rojhilata-nêvê dabeş bikin. Piştî amadekirin û darijtina reşnivîsa peymanê ew bi awayekê nivîskî dan siltanê osmaniyan. Herî dawiyê jî roja 10-ê adara 1920-ê li bajarokê Sevresê li nêzîkî Parîsê peymana aştiyê di nêvbera hêzên hevpeymanan û nûnerê hikûmeta osmaniyan de hat îmza kirin û Şam (Libnan û Sûriye), Iraq, Urdin û Îzmîr ji dewleta osmaniyan hatin cida kirin.

Di beşeka Peymana Sevresê de ko dehê tebaxa 1920-ê hat mohr kirin behsa miletê kurd û Kurdistanê têt kirin. Di madeya 64-ê ya Peymana Sevresê de hat nivîsandin:

”Heger ji dema bicihbûna vê peymanê û pê ve di mideta salekê de gelê kurd yê li deverên ko di madeya 62-yê de devera wan hatiye destnîşan kirin, ew bi xwe ji Konseya Cemiyeta Miletan re bidin nîşan dan ko piraniya xelkê wan deveran daxwaza serxwebûnê ji Tirkiyeyê dikin, û heger Konsey bawer bike ko wî gelî şiyaneka wisa ya serxwebûnê heye û tewsiyeya wê yekê bike, hingê ew maf dê bête dan bo wan, û Tirkiye jî li vêderê qebûl dike ko dê wê tewsiyeyê bi cih bike, û îlan dike dê dest ji hemî maf û xudantiya xwe ya wan herêman berde.”[12]

---

11. Ev civîn nîsana 1920-ê di nêvbera Brîtanya, Fransa û Wîlayetên Yekgirtî yên Emerîkayê de çêbû û rewşa welatên ereb diyar kir. Wîlayeta Mûsilê li gor wê peymana [Syces-Picot] nihênî ya di nêvbera Brîtanyayê û Fransayê de diket bin destê Fransayê lê belê di vê civînê de Fransayê dest ji wîlayeta Mûsilê berda û da Brîtanyaya hevpeymana xwe. Karê birêvebirina Iraqê û Filistînê dan Brîtanyayê bi şertê ko Peymana Balfourê bêt pêkanîn. Sûriye û Libnan jî xistin bin destê Fransayê. San Remo bajarekê Îtalyayê ye.

12. Barzanî, Mesûd (2020), ”Barzanî û tevgera rizgarîxwaz ya kurdan, cildê yekê 1958–1931”, Çapxaneya Rojhilat

# Damezirandina dewleta Iraqê

Herêma başûrê Kurdistanê ko ji wîlayeta Mûsilê pêkdihat, digel beşeka mezin ya bakurê Kurdistanê diket nêv projeya Peymana Sevresê. Piştî wê peymanê, li ser daxwaza rasterast ya wezîrê koloniyên Brîtanyayê û berpirsê karûbarên Iraqê Winston Churchill di adara 1921-ê de ”Konferansa Rojhilata-nêvê” li Qahîreyê hat amade kirin. Di wê konferansê de biryar hat dan ko mîrnişîniya Iraqê bêt damezirandin û li gor çarçeweya siyaseta destpêkê ya brîtanyayî li Rojhilata-nêvê, Emîr Feyselê kurê didoyê yê Husên Şerîfê Mekehê wekî şahê Iraqê hat destnîşan kirin. Helbet bêyî liberçavgirtina taybetmendiyên gelên niştecihên vê herêma tevlihev û têrproblem. Bingehê dewletekê danîn ko eve bi qasî sed salan e rûyê aramiyê nedîtiye.[13] Piştî wê konferansê (Konferansa Qahîreyê) Melik Feyselê paşayê Iraqê bi du nameyan daxwaz ji nûnerê bilind yê Brîtanyayê li Iraqê kir ko Kurdistanê bêxin ser Iraqê. Winston Churchill ko wê demê wezîrê koloniyên Brîtanyayê bû wiha bersiv dayê:

---

13. Edmunds, Cecil J., “Kurd, tirk û ereb”, rûper 155, wergerandina Hamîd Gewherî, Navenda Awyer bo çap û bilavkirinê

*”Me soza dewletekê daye te, ne soza împeretoriyekê…!*
*Kurd bi xwe neteweyek in ko xudanê cografyaya xwe*
*ne û tixûbê wan jî zincîreçiyayên Hemrînê ne.”*

Li gor vê biryarê, Melik Feysel di hezîrana 1920-ê de bi paporeka ingilîzan ji Mekehê hat rêkirin bo Besrayê û roja 23-yê tebaxa 1921-ê kirin şahê Iraqê.[14]

Di roja yekê çiriya-didoyê ya sala 1922-yê de sîstema siltaniya osmaniyan hat guhortin bo sîstema komariyê û navê împeretoriya osmaniyan bû Tirkiye û Mustafa Kemal bû serokkomar. Piştî hingê Tirkiyeyê ji bo binaxesaxlemkirina komara nû ji hevpeymanan xwest ko vegerin ser maseya diyalogê. Nûnerên Brîtanya, Fransa, Emerîka, Rûsya, Îtalya, Japonya, Romanya, Tirkiyeyê û hinek welatên dî di nêvbera 15-ê çiriya-didoyê ya sala 1922-ê heta 23-yê hezîrana 1923-yê de çend caran li bajarê Lozanê yê Swîsreyê civiyan û cara herî dawiyê di bin navê “Peymana Lozanê bo Aştiyê” de Peymana Sevresê hilweşandin û rê li ber hêviya neteweya kurd ji bo gehiştina mafê rewa yê serxwebûnê girtin.[15]

***Paragrafa didoyê ya madeya sêyê ya Peymana Lozanê dibêje:***

*“Heger heta neh mehan ji tarîxa vê peymanê [li wîlayeta Mûsilê] nakokî li ser tixûbê di nêvbera Iraqê û Tirkiyeyê de çêbe û Tirkiye û Brîtanya rêya çareseriyeka aştiyane ji bo vê problemê peyda nekin, ev problem dê biçe ber destê Konseya Cemiyeta Miletan.”*[16]

---

14. Edmunds, Cecil J., “Kurd, tirk û ereb”, rûper 155, wergerandina Hemîd Gewherî, Navenda Awyer bo çap û bilavkirinê
15. Di 24-ê tîrmehê de Peymana Sevresê hat betal kirin û Peymana Lozanê hat mohr kirin. Li gor Peymana Lozanê, hemî welat ji Tirkiyeyê re ma û behsa hîç mafekê kurdan nehat kirin. Tenê bi îşaretdanekê behsa xêrxwaziya hikûmetên hevpeymanan ji bo hemî kêmîneyên li Tirkiyeyê hat kirin.
16. Barzanî, Mesûd (2020), ”Barzanî û tevgera rizgarîxwaz ya kurdan, cildê yekê 1958–1931”, Çapxaneya Rojhilat

Wan danûstandinan bi daxwaznameyeka Brîtanyayê û di bin çavdêriya Sir Percy Cox û cihgirê îdarî yê waliyê Mûsilê R. F. Jardine de roja 19-ê adara 1924-ê destpê kir lê belê ti netîce jê derneket. Cemiyeta Miletan roja 30-ê îlona 1924-ê wezîfe li xwe girt û komîsyoneka nêvdewletî ji welatê Swêd, Macaristan, Belçîka, Îtalya û Swîsreyê ji bo nivîsandina protokola komîsyonê destnîşan kir.[17] Komîsyona çareserkirina tixûbê di nêvbera Tirkiyeyê û Iraqê de roja 16-ê kanûna-didoyê sala 1925-ê gehişt Bexdayê û roja piştî wê çû Mûsilê û piştî du mehên geriyanê li deverên ko problem li ser hebû û axaftina digel xelkê deverê raporek pêşkêşî Cemiyeta Miletan kir û xwest deverên ko dikevin xwarê "xeta Brûkselê"[18] bên dan bo Iraqê bi şertê ko Iraq heta bîstûpênc salan di bin destê Brîtanyayê de bimîne û hikûmeta nûavabûyî ya Iraqê di karûbarên xwe de berjewendiyên kurdan biparêze, zimanê kurdî li dibistanan, nivîsandinên [hikûmî], îdare û dadgehan de bibe zimanê resmî.

Li gor wê raporê piraniya wan niştecihên pirs jê hat kirin ko kurd bûn, qenaeta wan ew bû şona ko vegerin bin hikmê tirkan bila li ser aliyê Iraqê bin û digel Iraqê bijîn. Vê rapirsiyê tenê du bijare dida niştecihên wan deverên Kurdistanê: Mana digel Tirkiyeyê û çûna li ser Iraqê. Di jêpirsînê de alternatîvek ji bo hilbijartina serxwebûnê nebû. Cemiyeta Miletan ev proje qebûl

---

17. Navên endamên komîteyê ev bûn: Carl Einar Thure af Wirsén (Swêd), Count Pal Janos Ede Teleki (Macaristan), Colonel Albert Paulis (Belçîka), Signor Roddolo (Îtalya) û Count Horace de Portales (Swîsre)

18. Xeta Brûkselê: Piştî morkirina Peymana Lozanê, Cemiyeta Neteweyên Yekbûyî, li Brûkselê komîteyek pêkanî da tixûbê di nêvbera Tirkiyeyê û Iraqê de xêz ke. Piştî pêkanîna wê komîteyê, Cemiyeta Neteweyan komîteyeka dî ji sê endaman pêkanî û erka wê komîteyê xêzkirina tixûbê di nêvbera Tirkiyeyê û Iraqê de bû: Carl Einar Thure af Wirsén (Swêd), Count Pal Janos Ede Teleki (Macaristan), Colonel Albert Paulis (Belçîka)

kir lê belê ew şertên ko behsa parastina berjewendiyên kurdan dikir bêguman ti encam jê derneket û wê dewleta nû ya ko li ser bingehê şirîkatiya di nêvbera kurd û ereban de hatibû ava kirin şirîkatiya kurdan binpê kir.

Kurdan wîlayeta Mûsilê ji destê Tirkiyeyê rizgar kir lê belê gelo ev li bîra ereban ma? Herwekî nûnerê Brîtanyayê Cecil J. Edmunds di kitêba xwe "Kurd, tirk û ereb" de îşaret pê kiriye "gelo li hemberî vê yekê hikûmeta Iraqê dikare çavê xwe bide wê çendê ko siyaseteka dûrbîn û dilfireh li hemberî kurdan dane pêşiya xwe?"[19] Belê em dibînin ew rûdan û karesatên ko ji aliyê dewleta Iraqê ve di ser neteweya kurd de hatin belgeyên wê çendê ne ko ereban ew qenciya kurdan ji bîr kir.

Di nêv kêşmekêşa vê rikeberiyê de, Şêx Mehmûdê Hefîd berê hêj sala 1919-ê li dijî hikimdariya ingilîzan ji bo bidestveanîna mafên jidestçûyî yên miletê Kurdistanê ji destê dewleta nûavakirî [ya Iraqê], li Silêmaniyê serî hilda û dewleta Kurdistanê îlan kir. Şêx Ehmedê Barzanî bi nameyekê serokeşîrên xwe agahdar kir da arîkariya Şêx Mehmûdî bikin û wî bi xwe jî hêzeka çekdar bi serokatiya Mistefa Barzanî ji bo arîkariya Şêx Mehmûdî rêkir devera Silêmaniyê. Mistefa Barzanî ji du aliyan ve, ji aliyê Balekayetiyê[20] û Dola Biyawê[21] ve ji bo arîkariya Şêx Mehmûdî da ser rê. Herdu hêzan piştî derbasbûna ji gelek kemînan xwe gehand dorûbera Silêmaniyê lê belê mihaweleya wan bêencam ma, ji ber ingilîzan bi êrişên hewayî û bejahiyê dewleta îlankirî ya Şêx Mehmûdî têkbir û Şêx Mehmûd bi xwe jî li Geliyê Baziyan bi

19. Edmunds, Cecil J., "Kurd, tirk û ereb", rûper 574, wergerandina Hemîd Gewherî, Navenda Awyer bo çap û bilavkirinê

20. Ev dever ketiye bakurê Ruwandizê li ser rêya Hamiltonî heta digehî gundê Rayet.

21. Dola Biyaw beşeka devera surçiyan e û dikeve rojhilatê Barzan. Rêya Xelîfan–Barzan bi vê deverê re diçe.

birîndarî ket destê ingilîzan û ew rêkirin Hindistanê, lê belê paşê di bin zexta xelkê de mecbûr bûn ko sala 1922-yê Şêx Mehmûdî vegerînin Silêmaniyê.

Piştî wîlayeta Mûsilê ko piraniya niştecihên wê kurd bûn bi dewleta nû ya Iraqê ve hat girêdan, sala 1925-ê qanûna-esasî ya yekê ji bo dewleta nû ya Iraqê hat nivîsandin ko wekî qanûna bingehî ya serdema qraliyetê navûdengê wê heye. Brîtanyayê xebata xwe ya ji bo bihêzkirin û binaxesaxlemkirina dewleta nû ya Iraqê zêde kir. Her ji bo vê sebebê [ingilîzan] du tevgerên rizgarîxwaziya kurdan, ya di sala 1931-ê û 1932-yê de bi rêberiya Şêx Ehmedê Barzanî, û ya di sala 1943-yê û 1945-ê de bi rêberiya Mele Mistefayê Barzanî, bi bombebarankirina balafirên şerî yên ingilîzan û hêzên bejahiyê yên Iraqê û bi hevkariya cehşên xwemalî şkênand û şervanên barzaniyan bêçare kirin ko roja 11-ê çiriya-yekê 1945-ê bi jin û zarokên xwe ve di ser çiyayan re xwe bigehînin devera Şinoyê û Mergewerê li Kurdistana Îranê.[22]

Min behsa vê tarîxa berê kir da balê bikişînim ser wê heqîqetê ko mixabin qismekê mezin ji iraqiyan digel kesên wan yên siyasî jî vê tarîxê nizanin û heger bizanin jî dema ko axaftin têt ser mafên miletê kurd vê tarîxê ji bîr dikin yan jî piştguh dikin û naînin ber çavên xwe. Doza kurdan berî damezirandina dewleta Iraqê hebû. Berî ko dewleta Iraqê ji aliyê ingilîzan ve bêt ava kirin û qralek bo bêt hinartin, kurd li wê devera ko paşê navê "Dewleta Iraqê" lê hat kirin xudanê cografyaya xwe bûn. Herwiha di rikeberiya di nêvbera hêzên mezin yên cîhanê û hêzên herêmî û hêzên xwecihî de mafên kurdan wekî netewe hatin binpê kirin.

22. Piştî îlankirina Komara Kurdistanê li Mihabadê di 22-ê meha yekê ya 1946-ê de, gelek barzaniyan bi serokatiya Mistefayê Barzanî bi tifaqa digel Qazî Mihemedî wekî pêşmerge beşdarî di parastina Komara Kurdistanê de kir.

Şoreş û lêgeriyanên azadîxwazên Kurdistana Iraqê di serdema qraliyetê de belgeyên wê çendê ne ko kurdan rewşa nû ya dewleta Iraqê qebûl nekir û dê li dijî hewlên hikûmetê ji bo marjînalîzekirin û asîmîlekirina neteweya kurd bi dijwarî rawestin. Dewleta Iraqê di wê demê de şirîkatiya kurdan û ereban binpê kir û ew sozên ko di destpêka avabûna Iraqê de ji bo parastina berjewendiyên kurdan hatibûn dan û di projeya komîsyona Cemiyeta Miletan de jî behsê hatibû kirin piştguh kir. Digel wê jî heger hikûmeta Iraqê di wî wextî de karîbe bi arîkariya ingilîzan ji bo midetekê şoreşên [kurdan] bifetisîne jî, her carê şoreş û serhildanên nû bi gurî û têhneka zêdetir destpê kirine. Di serdema qraliyetê de firseta jinûveavakirina dewleta Iraqê li ser bingehê şirîkatiya kurd û ereban û rêzgirtina li mafên hevwelatîbûnê ji dest çû, lê belê gelo di firsetên dî de ders ji xeletiyan hat wergirtin da kurd bikaribin bi bextewarî di nêv dewleta Iraqê de bijîn?

# Şoreşa îlonê

Şoreşa 14-ê tîrmeha 1958-ê qunax û firseteka nû bû. Piştî biserketina şoreşa tîrmehê cenabê Barzaniyê nemir û hevalên wî ji Yekîtiya Sovyetan vegeriyan Iraqê. Şoreşa tîrmehê rewşeka nû û firseteka nû xuliqandibû da dewleta Iraqê careka dî [ji nû ve] bêt dîzayn kirin û hemî pêkhatiyên Iraqê û hemwelatî bikarin bi bextewarî di bin sîwana dewleteka serdem de bijîn. Di qanûna-esasî ya 1958-ê de pir bi zelalî îtiraf bi wê yekê hat kirin ko ereb û kurd di dewletê de şirîk in û qanûna-esasî mafên neteweyî garantî dike. Lê belê mixabin cardî di bin tesîra kesên şovenîst û firsetçî de mafên miletê kurd hatin piştguh kirin û du sal û nîvan piştî biserketina şoreşa tîrmehê, Kurdistan xistin bin agirê bombebarana top û balafirên iraqî de û şoreşa kurdan di 11-ê îlona 1961-ê de destpê kir.

Şoreşa îlonê şoreşeka kurdistanî lê belê di heman demê de iraqî jî bû. Slogana serekî ya şoreşê “Demokrasî bo Iraqê, otonomî bo Kurdistanê!” bû. Şoreşa îlonê bûbû penagehek jî bo kesên têkoşer û xebatgêr yên iraqî. Di hemî tarîxa şoreşê de yek carê tenê jî kiryareka teqandin û xwînrijandinê li hemberî xelkê sivîl nehat pêkanîn. Hemî xebata cenabê Barzanî ew bû ko di dema şerî, agirbestê û rewşên ne-şer ne-aştiyê de rê li ber şerî û xwînrijandinê bêt girtin.

Di hemî demên şoreşa îlonê de gelek caran diyalog û danûstandin digel desthilatdarên wê demê yên Iraqê hat kirin lê belê herdaim Bexdayê bi niyeta taktîk û bidestxistina demê xwe dida ber danûstandina digel kurdan. Piştî derbeya eskerî ya be'siyan li hemberî Evdilkerîm Qasimî di heştê sibata 1963-yê de, bi qasî çar mehan şer di nêvbera hikûmetê û şoreşê de rawestiya û danûstandin û diyalog di nêvbera şoreşê û hikûmeta wê demê de hebû. Lê belê di rastiyê de hemî hedefa be'siyan ji danûstandinên digel kurdan ew bû ko cihê piyên xwe qayim bikin. Baweriya wan bi çareserkirina meseleyan nebû. Lewra dema rewşa wan baştir bû û li Sûriyeyê jî be'siyan derbeyeka eskerî kir wan hest pê kir ko ew xurt bûne û di meha hezîranê ya heman salê de bi hevkarî û planên herêmî cardî seferberî û şerê li dijî kurdan destpê kir.

Di çiriya-didoyê ya 1963-yê de Evdilselam Arifî derbeyeka eskerî çêkir û be'sî jî derxistin. Çend mehan piştî hingê di dehê sibata 1964-ê de peymaneka lihevkirinê di nêvbera Barzaniyê nemir û Evdilselam Arifî de hat îmza kirin ko tê de biryar li ser çend nuqteyan hat dan, yek ji wan îtirafa bi mafên neteweyî yên miletê kurd bû. Lê belê salek jî derbas nebû dîsa şer li ser miletê Kurdistanê hat ferz kirin. Ev di rewşeka wisa de çêbû ko Barzanî û serkirdayetiya şoreşê bi hemî hêza xwe xebat dikir da rê li ber şerî bêt girtin. Di sala 1965-ê de hikûmeta Iraqê şiyanên xwe yên eskerî ji bo têkbirina şoreşa îlonê seferber kir.

Şerên gelek mezin li çiyayê Sefîn, Pîremegrûn, Benî Herîr, Hendirên û devera Ruwandiz, Raniye û Qeladizê çêbûn. Di van şeran de hikûmeta Iraqê siyaseta "erda şewitî" û têkdana jêrxana aborî ya xelkê Kurdistanê peyrew kir. Vê stemkarî, ferzkirina şerî û awarekirina xelkê Kurdistanê wisa kir ko Barzaniyê nemir di yekê kanûna-didoyê ya 1966-ê de nameyekê ji Neteweyên Yekbûyî re binivîsîne û tê de daxwaza wê yekê bike

ko Neteweyên Yekbûyî komîsyoneka taybet rêke Kurdistanê da ji nêzîk ve asta wê zilm û kavilkirinê bibîne ko di heqê miletê Kurdistanê de têt kirin.

Piştî ko meha nîsana 1966-ê Evdilselam Arif di helîkopterê de şewitî, brayê wî Evdirehmanî cihê wî girt. Berî mirina Evdilselamî plana şerê seranserî li dijî Kurdistanê hebû û wezîrê parastinê yê Iraqê Evdilezîz Eqîl ew wekî plana ”Twekeltu lîl-lah” bi nav kiribû. Armanca wê planê ko têkbirina şoreşê bû, 12-ê adara 1966-ê bi destana Hendirên û Zozik ko şerekê qehremanî yê şoreşê bû hat şkênandin û derbeyeka mezin ya eskerî li hikûmetê ket. Piştî wê şikestina mezin hikûmetê daxwaza danûstandinê kir û ragihand ko amade ye bi rêyên aştiyane problemên xwe digel kurdan çareser bike. Piştî hingê, di 29-ê hezîrana 1966-ê de beyannameyeka 12-madeyî di nêvbera şoreşê û hikûmetê de hat îmza kirin. Lê belê di rastiyê de ev beyanname ne lihevkirinek bû, belko rengekê agirbestê bû. Herçend çar mehan piştî hingê cenabê Barzanî û Evdilselam Arifê serokkomarê Iraqê[23] hevdu dît jî binpêkirin û destdirêjiya li ser mal û milkê kurdan û siyaseta erebkirinê berdewam bû.

Di mideta deh salan de heft derbeyên eskerî li Iraqê çêbûn. Yek ji wan derbeyan tenê jî nekarî asayîş û emniyeta Iraqê biparêze û derbekaran jî şiyana wê çendê nebû ko Iraqê ber bi demokrasiyê ve bibin û mafên mirovî biparêzin û îtirafê bi mafên neteweya kurd, tirkmen û xiristyanên li Iraqê bikin. Derbekaran ko hemî jî endamên ordiyê bûn hikûmet ji destê efserekî neqlî destê efserekê dî yê derbekar dikir, bi hezaran kesên bêtawan kuştin û bi bihayê sedan milyar dolaran xusar dan aboriya Iraqê û heta nekarîn ruhê xwe jî di wan derbeyan de xelas bikin.

---

23. Evdirehman Arif ji brayê xwe cidatir bû û ehlê xêrê û aştiyê bû lê belê ”dewleta kûr” ji wî xurttir bû.

Sebebê derketina wan derbeyên eskerî li Iraqê girêdayî du diyardeyan e: Yê yekê ew e ko welat ji aliyê ordiyê ve dihat bi rê ve birin û hikûmet jî hikûmetên eskerî bûn. Ya didoyê ew bû ko ji bilî bi rêya derbeya eskerî hîç guhortinek di sîstem û şêweyê birêvebirina welatî de çênedibû. Di wan derbeyên eskerî de zêdetir tecribeya derbeya eskerî ya sibata 1963-yê û wan kesên ko di nêv hikûmetê de xudandesthilat bûn qezenc didît.

Roja 17-ê tîrmeha 1968-ê Evdirezaq Nayif, Îbrahîm Dawid û Sedûn Xêdan li hemberî Evdilselam Arifî derbeyeka eskerî kir. Piştî wê derbeya eskerî be‘siyan di 30-ê tîrmeha 1968-ê de ji nû ve derbeyeka eskerî bi serokatiya Ehmed Hesen Bekir kir û Evdirezaq Nayif li balafirekê siwar kir û ji Iraqê derxist.

Bidestketiya herî mezin ya şoreşa îlonê peymana yazdehê adara sala 1970-yê bû ko di nêvbera Barzaniyê nemir û Sedam Hisênî de hat îmza kirin. Vê pêngavê miletê kurd derbasî qunaxeka nû ya jiyana siyasî kir. Bi wê peymanê kurdên vê beşa Kurdistanê li ser axa xwe gehiştin hinek ji mafên xwe yên neteweyî û qanûnî. Dewleta Iraqê qebûl kir ko kurd netewe ne û li ser axa xwe ji mafên xwe hatine bêbehr kirin û zilimlêbûyî ne. Ev biserketineka mezin bû ji bo hemî neteweya kurd li herçar parçeyên Kurdistanê, ji bo serkirdayetiya şoreşê, ji bo Partiya Demokrat û ji bo pêşmergeyên qehreman yên Kurdistanê ko bi dil û can li pişt serokê xwe Mistefayê Barzanî bûn.

Peymana yazdehê adarê momenteka tarîxî bû di têkiliyên di nêvbera miletê Kurdistanê û dewleta Iraqê de, lê belê mixabin hikûmeta Iraqê di siyaseta înkarkirinê ya li dijî şoreşê û kurdan de bi rengên guhortî berdewam kir. Çend mehan piştî peymanê hikûmetê destpê kir ko eziyetê li kurdên feylî bike û wan ji cihên wan derxe. Bi rêya teqandina melayan di 29-ê îlona 1971-ê de teşebisa kuştina cenabê Barzanî kir. Ev kiryarên henê bûn sebebê wê yekê ko baweriya di nêvbera şoreşa Kurdistanê û hikûmeta

Iraqê de kêm bibe. Herwiha bi hêcetên cida-cida hikûmetê xwe ji bicihkirina bendên peymanê û derxistina qanûna otonomiyê wekî ”carnameya otonomiyê” di 1974-ê de vedidizî. Di heman demê de hikûmetê dest bi girtin, eziyetdan û îdamkirina endam û rêxistinên Partiyê li Bexdayê kir û yek ji wan şehîdkirina Leyla Qasimê û hevrêyên wê bû. Şehîd Leyla Qasima ko berpirsa rêxistinên hizbî yên Partiya Demokrat ya Kurdistanê yên li Bexdayê bû, keça pêşiyê ya kurd bû ko ji aliyê hikûmeta Iraqê ve û ji ber sebebên siyasî di 12-ê adara 1974-ê hat îdam kirin û şehîd bû.

Cara herî dawiyê jî hikûmeta Iraqê sala 1975-ê bi komployeka nêvdewletî ya li dijî kurdan bi navê ”Peymana Cezayîrê” ji bo şahê Îranê dest ji ax û serweriya Iraqê berda û ji ber hindê şoreşa îlonê rûbirûya şikestinê bû û peymana yazdehê adara 1970-yê jî nehat bi cih kirin.

Piştî sala 1975-ê qunaxeka nû ya xebata miletê Kurdistanê û tevgera rizgarîxwaz ya kurdan li Iraqê destpê kir. Herçend şoreş rûbirûya şikestinê bûbû û bi sedhezaran kes awareyî welatan bûbûn jî di heman demê de tevgera rizgarîxwaz ya kurdan li Kurdistana Iraqê berfirehtir bû û ber bi cîhana derve ve çû û têkiliyên wê yên digel dinyaya derve gehiştin qunaxeka nû. Şerê heşt salan yê di nêvbera Iraqê û Îranê de balans û firseteka nû ji bo hêz û aliyên kurdistanî li Iraqê berpê kir.

# Plana jihalêrakirin û asîmîlekirina miletê kurd di dewleta Iraqê de

Di proseseka dûrûdirêj de axa miletê Kurdistanê di nêvbera çar dewletan de hat dabeş kirin. Herwekî me berê bal kişand e ser, li wê beşa ko ket ser Iraqê şirîkatiya di nêvbera kurdan û ereban de hat binpê kirin û taybetmendiyên neteweyî yên miletê kurd li ber çavan nehatin girtin. Ew zilma ko li kurdan hat kirin, ne tenê ew bû ko mafên wan yên neteweyî bên piştguh kirin, belko di mideta sed salên borî de plan û programên tîr/dijwar yên desthilatdarên Iraqê ji bo jihalêrakirin û asîmîlekirina miletê Kurdistanê jî hatin bi cih kirin. Li gor siyaseteka organîzekirî û di qunaxên cida-cida de kar ji bo wê hat kirin da demografiya deverên Kurdistana Iraqê biguhorin ko ji zemanê kevin ve neteweya kurd û pêkhateyên dî lê niştecih bûn.

Teşebisa yekê ya guhortina demografiya deverên kurdnişîn di çarçeweya siyaseta veguhostina bi darê zorê de bû. Veguhostin û erebkirina wan deverên kurdistanî yên ko ketibûn ser dewleta Iraqê berî dewleta Iraqê ava bibe hat peyrew kirin. Di sedsala nozdehê de, wê dema ko Mîthat Paşa[24] waliyê Bexdayê bû, hejmareka mezin

24. Mîthat Paşa, ji 1869-ê heta 1872-yê waliyê osmaniyan yê Bexdayê bû.

ya eşîrên ereban li deştên Mendelî û Beledrûz, Qeretepe, Kifrî, Dûz, Hewîce, Qerac, başûrê Mexmûrê û deşta Mûsilê hatin bi cih kirin. Piştî avabûna dewleta Iraqê û di serdema qraliyetê de ji bo bicihkirina hesta iraqîbûnê di nêv hemwelatiyên dewleta nû de, di proseseka berdewam de kar ji bo programa erebkirinê hat kirin. Di dehsalên sihê, çilê û pênciyê yên sedsala borî de hejmareka zêde ya ereban li Hewîce, Mendelî, Celewla, Qerac, deşta Mûsilê û Şingalê hatin niştecih kirin û bi sedan gundên nû ji wan re hatin ava kirin. Piştî şoreşa 14-ê tîrmeha 1958-ê jî heta hatina be'siyan, siyaseta erebkirinê li devera Şingalê, Zumarê û deverên li ser tixûbê Iraqê û Sûriyeyê berdewam bû.

Sala 1963-yê û piştî hatina be'siyan ya ser desthilatê, plana veguhostin, erebkirin û be'sîkirinê ket qunaxeka berfireh û dijwartir de. Di wê midetê de ji % 42-yê axa Kurdistanê ket ber êrişa veguhostin û veleqandina niştecihên ko li ser erdê bab û bapîrên xwe dijiyan. Di sala 1970-yê de hikûmeta Iraqê dest bi tawana veguhostina bi darê zorê ya hezaran kurdên feylî kir. Herwiha piştî wê, qunaxeka dî ya veguhostinê ko paralel bû digel wêrankirina gundan, ji sala 1970-yê destpê kir û heta sala 1979-ê dewam kir. Di vê qunaxê de devera Barzan, Balekayetî, Quretû, Kirmek, Navdeşt, Helebce, Karêze û Zaxoyê ketin ber êrişa kavilkirin û wêrankirina gundan. Di meha çiriya-didoyê ya sala 1975-ê de gewretirîn kampanyaya veguhostin û wêrankirina gundan li devera Barzan ji aliyê hikûmeta Iraqê ve hat pêkanîn. Niştecihên devera Barzan bi darê zorê ji bo sehra û giştîkampên mecbûrî [concentrations camp] yên li başûrê Iraqê hatin veguhostin û bi awayekê neheq ji niştimana xwe hatin dûr xistin. Piştî pênc salên jiyanê yên di zehmetî, dijwarî û perîşaniyê de, di destpêka sala 1980-yê de ew barzaniyên veguhostî ji başûrê Iraqê anîn Kurdistanê lê belê vê carê li dorûbera Hewlêrê bi darê zorê li giştîkampên mecbûrî yên wekî Qadisiye û Qudsê hatin niştecih kirin.

Tawaneka dî ya hikûmetên Iraqê bêserûşonkirin, enfal û komkujiya hemwelatiyên kurd bû. Sala 1980-yê diwazde hezar ciwanên kurdên feylî ji aliyê hikûmeta Iraqê ve hatin bêserûşon kirin. Her di berdewamiya tawanên li dijî kurdên feylî de bi deh hezaran ji wan bi darê zorê ji Iraqê hatin derxistin û nasnameya wan jê hat standin û ew rêkirin Îranê. Tawanên organîzekirî yên hikûmeta Iraqê li dijî neteweya kurd berdewam bûn. Her ew tawan bû ko di 31-ê tîrmeha 1983-yê de hêzên rejîma Iraqê êrişî giştîkampên mecbûrî yên li Quştepe (Quds û Qadisiye) û yên li Herîr, Behirkê û Diyanayê kir û heşt hezar mêrên barzaniyan desteser û bêserûşon kir, ko bîstûçend salan piştî hingê, piştî roxandina rejîmê termên wan di gorên giştî de li sehrayên başûrê Iraqê hatin peyda kirin.

Di berdewamiya tetbîqkirina plana jenosîdkirina neteweya kurd de hikûmeta berê ya Iraqê sala 1988-ê bi operasyoneka nemirovane ya bi navê "Enfalê" ko ji heşt qunaxan pêkdihat 182 000 hemwelatiyên kurdên bêtawan yên Germiyan, Qeredax, Behdînan, wîlayeta Kerkûk, Hewlêr û Silêmaniyê bêserûşon kirin. Her heman salê tawana kimyabarankirina Helebceyê ji aliyê rejîmê ve hat pêkanîn ko bû sebeba şehîdbûna pênc hezar kesên medenî. Kimyabarankirina Kurdistanê piraniya deverên Kurdistanê vegirt lê belê Helebce – ji ber hejmara zêde ya şehîdan di yek wextî de – bû sembola tawana kimyabarankirina Kurdistanê.

Digel van hemî tawanan, wekî dî têkdana jîngeha Kurdistanê û mayînkirina daristan, çiya, rê û dirban û wêrankirina 4 500 gundan û hilweşandina jêrxana jiyana gundnişîniyê û ziraetê û niştecihkirina bi darê zorê ya li giştîkampan û têkdana jêrxana aborî û şîrazeya jiyana civatî ya neteweya kurd, girtina bi qefleyî û zîndanîkirina wan; şikence, îdamkirin, gulebarankirina hemwelatiyên kurd û awarekirina bi sed hezaran hemwelatiyên

kurd û bombebarankirina Qeladizê di 24-ê nîsana 1984-ê de û bombebarankirina penaberan li kampa penaberan ya li Zêwe di nehê hezîrana 1985-ê de beşeka dî ji wan tawanên dewleta Iraqê ne ko li dijî miletê Kurdistanê kirine. Ev tiştên ko me behsê kirin bi gelek hezar belgeyan hatine piştrast kirin û hemî jî dikevin çarçeweya tawanên li dijî mirovayetiyê û tawanên komkujiyê û ew hemî teşebisên hedefdiyar û sîstematîk yên dewleta Iraqê ne ko eve bi zêdetirî sed salan e ji bo asîmîlekirin û jihalêrakirina neteweya kurd dike.

# Serhildan

Piştî serhildana miletê Kurdistanê ya bihara 1991-ê firseteka nû ji bo miletê Kurdistanê û tevgera rizgarîxwaz ya Kurdistanê peyda bû. Ew serhildan di tarîxa miletê Kurdistanê de momenteka giring bû. Di serhildanê de miletê Kurdistanê nimûneya exlaq û kultura xwe ya bilind nîşan da. Wê demê miletê Kurdistanê destê xwe dirêjî hizra tolstandinê nekir. Berovajiyê wê, [kurdan] ruhê bi hezaran serbazên iraqî yên ko xwe teslîm kiribûn parast. Ji bo vekirina rûperekê nû digel dewleta Iraqê serkirdayetiya kurdan daxwaza hikûmetê ya ji bo diyalogê û danûstandinê qebûl kir û biryara danûstandinê digel desthilatdarên wê demê yên Iraqê da. Em digel xwedêjêrazî Mam Celal dema ko ji bo danûstandinan çûn Bexdayê, di rastiyê de ew hemî tawanên dirindane yên ko dewleta Iraqê li dijî miletê Kurdistanê pêkanîbûn li ber çavên me bûn, û em di nêv robarê xwînê de meşiyan û me destê xwe da wan destên ko bi xwîna miletê me sor bûbûn. Belê, niyeta esasî ya me vekirina rûper û qunaxeka nû û bidestxistina aştiyê bû, û ew biryar zehmettirîn biryara jiyana min bû. Sihûheşt kes ji familyeya min, heşt hezar

kes ji eşîreta min û sedûheştî hezar kesên ji neteweya min bi awayekê dirindane hatibûn enfal kirin, digel wê jî min biryar da biçim Bexdayê da paşê nebêjin wî ji ber kîna xwe ya şexsî nexwest danûstandinê bike û firseta çareseriyê ya ji bo miletê kurd ji dest da.

Ew baca insanî û madî ya ko miletê Kurdistanê ji salên bîstê yên sedsala borî heta serhildana [1991-ê] di encama jiyana digel dewleta Iraqê de da êkcar zêde bû. Netîceya endambûna me di dewleta Iraqê de û şirîkbûna kurdan digel Iraqê şer, şoreş, kavilkirin, zehmetî, xwîn û eziyetdana miletê kurd bû. Iraq bi petrola Kurdistanê bû dewlet û Iraqê bi pereyên wê petrolê şerê miletê Kurdistanê dikir û êrişî dewletên cîran jî dikir. Mixabin mijara petrolê her ji destpêkê ve bû sebebê liberçavnegirtina mafên xelkê Kurdistanê. Di wexta xwe de dema ingilîzan soza hikimdariya dewletê dabû Şêx Mehmûdê nemir jî, çi dema ko wan zanî li Kerkûkê petrol heye ji soza xwe paşgav bûn û xwest ko bi petrola Kerkûkê û Kurdistanê dewleta Iraqê xurt bikin. Belê me dît di sedsala bîstê de ew serweta ko diviya ji bo refah û pêşketinê îstifade jê bêt wergirtin, ji bo qirkirina miletê Kurdistanê hat bi kar anîn.

Bombebaran û nefîama berdewam ya li ser miletê kurd, çend derbeyên eskerî, dîktatorî û şovenîzm, bêserûşonkirina diwazde hezar kurdên feylî, enfalkirina heşt hezar barzaniyan û sedûheştîûdu hezar hemwelatiyên bêguneh yên Kurdistanê li Germiyanê û deverên dî; kimyabarankirina Helebceyê û deverên cida-cida yên Kurdistanê; veguhostin, erebkirin, be'sîkirin, derxistin û awarekirin netîceya avabûna dewleta Iraqê û jiyana me ya digel wê dewletê bû. Digel van hemiyan jî kurdan aştî, pêkvejiyan û rûperekê nû dixwest.

Danûstandinên piştî serhildanê yên digel rejîma Iraqê bi ser neketin. Wê demê eqliyeta înkarkirinê, şovenîzmê û dûvelangdîtina

kurdan her berdewam bû. Di ser hemî vê tarîxa tejî xwîn, neheqî û sitemkariyê wisa bûbû ko li Bexdayê bi çavê tawankaran li me temaşa dikirin. Ji ber ko kurdan zilim qebûl nekiribû û li hemberî jenosîd û dîktatoriyê xwe teslîm nekiribûn.

Piştî serhildana miletê Kurdistanê, di bin tesîra rewşa nû û şikestina eskerî ya li Geliyê Korê, rejîmê karmendên hikûmetê yên li beşeka Kurdistanê paşde kişandin û yekîneyên îdarî yên li Kurdistanê vekişandin û di mideta diwazde salan de bi hîç rengekî têkiliyên siyasî û aborî di nêvbera Kurdistanê û Bexdayê de neman. Herêma Kurdistanê wê demê di bin ablokaya rejîmê û ablokaya nêvdewletî de bû ko piştî şerê Kuwêtê li ser Iraqê hatibû ferz kirin. Digel wê jî li Kurdistanê cara pêşiyê 19-ê gulana 1992-yê bi hilbijartinên azad û demokratîk parlamento û hikûmeta herêmê hat ava kirin. Zêdebarî hebûna problemên mezin yên aborî û nakokiyên nêvxweyî yên di nêvbera aliyên siyasî yên Kurdistanê de, di encamê de herêma Kurdistanê di wan diwazde salan de karî xwe îsbat bike û pêşde biçe. Di heman demê de jî herêma Kurdistanê bû penagehek ji bo beşeka mezin ya lêqewimî, têkoşer û azadîxwazên Iraqê û bo wan hêzên opozîsyonê ko niho li Iraqê hikim di destê wan de ye, û [herêma Kurdistanê] bi hîç rengekî nebû tehdîd li ser dewletên cîranên xwe.

# Konferansa opozîsyona Iraqê û roxiyana rejîma berê

Sala 2003-yê û êrişa Emerîkayê ya li ser Iraqê û roxiyana rejîma berê, ji bo gelên Iraqê destpêka qunaxeka giring û yekalîker bû. Berî êrişa Emerîkayê, di heqê paşeroja Iraqê de civîn û danûstandinên me digel hêzên opozîsyonê yên Iraqê hebûn. Me bi awayekê aktîv beşdarî di konferansa opozîsyona iraqî ya li Londonê de kir. Wê demê jî hemî xebata me ji bo wê yekê bû ko piştî her guhortineka li Iraqê bila ti kes hizra tolstandinê neke. Di konferansê de min bi zelalî ji aliyên iraqî re got heger hemî bên û hizra tolstandinê bikin hingê ti kes li Iraqê namîne. Di konferansa opozîsyona iraqî de ko di roja 14 û 15-ê kanûna-yekê ya sala 2002-yê li Londonê hat çêkirin, aliyên kurdistanî kar ji bo wê yekê kir ko rûperekê nû digel dewleta Iraqê vekin. Konferansa opozîsyona iraqî li Londonê di projeya ”qunaxa derbasbûnê” û beyannameya xwe ya siyasî de biryar li ser wê yekê da ko Iraqa paşerojê dê Iraqeka demokratîk, parlameterî, pluralîst û federal be ji bo ”hemî Iraqê”. Herwiha binemayên şirîkatî û lihevkirina di nêvbera pêkhatiyan de bibin bingehê jinûveavakirina dewletê.

Di wan herdu belgenameyan de opozîsyona wê demê ya iraqî xwest hemî hewlên ko hikûmetên Iraqê ji bo guhortina

demografî û realîteya neteweyî ya Kerkûk, Mexmûr, Xaneqîn, Şingal, Şêxan, Zumar û Mendeliyê dane nemînin û di wê çarçeweyê de hemî rê û tedbîrên îdarî ko piştî sala 1968-ê bi niyeta guhortina demografiyê ji aliyê hikûmetê ve hatine girtin divêt bên hilweşandin. Konferansê digel îtirafkirina bi [pêkhatina] tawana Enfalê û jenosîdkirina miletê Kurdistanê xwest ko mexdûrên Enfal, kimyabaran, veguhostin û jenosîda miletê Kurdistanê bên tezmîn kirin. Herwiha rêz li îradeya azad ya miletê Kurdistanê bêt girtin da piştî roxiyana rejîmê bikare bi formekê ko ew ji xwe re minasib dibîne şirîkatiyê di çarçeweya ”yekgirtina dilxwaz” de digel dewleta Iraqê hilbijêre.[25]

Berî roxiyana rejîma berê ji aliyê Emerîkayê ve û berî konferansa opozîsyona iraqî li Londonê, hingê herêma Kurdistanê qewareyeka nîvserbixwe bû û hîç têkilî bi Iraqê ve nemabû. Di salên piştî serhildanê de li herêma Kurdistanê bingehekê baş yê hikimdariyê hebû û federalî ji aliyê Parlamentoya Kurdistanê ve hatibû qebûl kirin. Hizra federaliyê vedigere bo demên dawiyê yên şoreşa îlonê. Wê demê cenabê Barzanî, Îbrahîm Ehmed, Cercîs Fethullah û pisporekê dî raspard da kar li ser wê projeyê bikin. Federalîzm û hikûmeta herêma Kurdistanê bi serê xwe bidestketiyeka baş bû ji bo miletê Kurdistanê. Herçend di qunaxa nivîsandina qanûna-miweqet ya ji bo birêvebirina Iraqê bi destê ”Konseya birêvebir ya miweqet” de Paul Bremerê[26] hikimdarê sivîl yê Iraqê zêde lêxebitî ko ji hedê xwe derkeve û tenga herêmê bişidîne û tecawizî kiyanê herêma Kurdistanê û bidestketiyên miletê Kurdistanê bike jî ew di teşebisên xwe de bi ser neket.

Sala 2005-ê qanûneka-esasî ya nû ji bo Iraqê hat nivîsandin û ji aliyê miletên Iraqê ve hat qebûl kirin. Qanûna-esasî (destûr) ya

25. Ji bo agahdariyên zêdetir li teksta beyannameya dawiyê ya konferansa Londonê ya opozîsyona îraqî binêre / lapera 147.
26. Piştî roxiyana rejîma berê ji aliyê Emerîkayê ve, di şeşê adara 2003-yê de serokê wê demê yê Emerîkayê serok Bush bi biryarekê Paul Bremer kir hakimê sivîl yê Iraqê.

nû ji bo wê çendê bû ko Iraqeka demokratîk, pluralîst û federal bêt ava kirin û şirîkatî di nêvbera pêkhatiyan de hebe û mafên hemî aliyan parastî bin. Qanûneka-esasî ko heger tu bi qanûnên-esasî yên berê yên Iraqê re û heta bi qanûnên-esasî yên deverê re jî miqayese bikî têra xwe baş û modern bû herçend ne bêyî kêmasî jî bû. Aliyên kurdistanî di darîştin, dengdan û biserxistina qanûna-esasî ya nû ya Iraqê de roleka tesîrbar di meseleya bicihkirina mafên pêkhatiyan û dirûvê şirîkatî û demokrasiyê de hebû. Heger Kurdistan beşdarî nivîsandinê nebûya qanûna-esasî bi vî rengî nedihat nivîsandin.

Û heger ew qanûna-esasî wekî xwe bihata bi cih kirin niho Iraqê dê gelek ji wan problemên ko beden-û-pistoya wê girtine nebûna. Di prosesa nivîsandina qanûna-esasî de ez demekê dirêj li Bexdayê mam. Tîma kurdistanî ya ji bo nivîsandina qanûna-esasî ji bilî min, ji xwedêjêrazî Newşîrwan Mistefa, doktor Roj Nûrî Şawês, mamosta Selahedîn Behaedîn, Mihemedê Hacî Mehmûd, Mesrûr Barzanî, nûnerê pêkhatiya tirkmenan Kerxî Altiparmak û nûnerê pêkhatiyên xiristyanan Romyo Hekarî pêkdihat. Tîma Kurdistanî di nivîsandina qanûna-esasî û biserxistina wê de û herwiha di israra di mafên miletê Kurdistanê û pêkhatiyên neteweyî û dînî yên Iraqê de hemahengî, hevdugirtin û harmoniyeka gelek baş digel hevdu hebû.

Mixabin hevpeymanên me yên şî‘î ko me bi hev re Iraqa nû ava kiribû, dema dît ko cihê piyên wan li Iraqê qayîm bû, ketin nêv proseseka xeternak û şaş de ko ew jî binpêkirina qanûna-esasî, marjînalîzekirina pêkhatiyan û hewildana kêmkirina kurdan di avahî û dezgehên dewletê de bû. Serkaniya wê binpêkirinê jî digehî nebûna baweriya wan bi qanûna-esasî ya nû ya Iraqê. Di dîbaceya qanûna-esasî ya nû ya Iraqê de hatiye nivîsandin ko ”pêbendbûn bi vê qanûna-esasî ve şertê biyekvemayîna yekparçetiya Iraqê ye”. Her ji ber vê hindê kurdan dengê xwe da

qanûna-esasî. Di rastiyê de di dema nivîsandina qanûna-esasî de me endîşeya wê yekê hebû ko hizra şovenîzmê li Iraqê dê berdewam be, ji ber hindê me ew îfadeya ko di dîbaceya qanûna-esasî de derbas dibû wekî sedekê li hemberî vegeriyana hizra şovenîsmê û xweferzkirinê didît.

Nîşanên binpêkirina qanûna-esasî û piştaxwedana soz û peymanan di xwevedizîna ji bicihkirina madeya 140-ê de diyar bûn. Li gor qanûna-esasî pêwist bû qunaxa normalîzekirin, serjimêrî û rapirsiyê li deverên ko cihê nakokiyê bûn heta 2007-ê bi awayekê pratîkî bên temam kirin. Heta niho jî yek tenê ji wan pêngavan nehatine avêtin û sebebê wê jî xwevedizîn û pêbendnebûna hikûmeta Iraqê ya bi qanûna-esasî ve ye.

Ji sala 2005-ê û pê ve her hilbijartineka [giştî] ko hatibe kirin qanûnên hilbijartinan bi rengekî hatine dariştin ko di encamê de nisbeta kursiyên herêma Kurdistanê kêm bibin. Heta niho ji sebebên cida-cida serjimêrî li Iraqê nehatiye kirin herçend biryar ew bû ko serjimêrî bêt kirin. Gelek caran li ser sozên emerîkiyan em li hinek mafên xwe diborîn û em beşdarî prosesa siyasî dibûn lê belê wan jî xebat ji bo pêkanîna sozên xwe nedikir. Meqamê serwer yê serokkomariyê ko pişka miletê kurd bû, piştî roxiyana rejîmê di dewreya yekê ya serokkomariyê de bû nesîbê Mam Celal û ew bû serokkomar, lê belê sala 2010-ê di dewreya didoyê de emerîkiyan dixwest ew meqam neyêt dan bo kurdan. Piştî hilbijartinên sala 2010-ê yên Iraqê lîsteya Eyad Ellawî di hilbijartinan de bi ser ket lê belê Îranê û Emerîkayê bi bihaneyên cida-cida nehişt ko Ellawî bibe serokwezîrê Iraqê. Herwiha emerîkiyan dixwest kesekê sunî bikin serokkomar û serokatiya Parlamentoyê jî bidin kurdan.

Dema emerîkiyan ji min re behsa vê meseleyê kir min ji wan pirsî aya mebesta we ew e ko Mam Celal wekî serokkomar nemîne yan mebesta we ew e ko meqamê serokkomariyê hema ne ji kurdan re be.

Wan got mebesta wan herdu jî ne. Min jî bersiva wan da û got: ”Meqamê serokkomariyê pişka kurdan e û divêt her Mam Celal bibe serokkomar. Çênabe ko serokwezîrî û serokkomarî herdu ji bo ereban bin.” Bi vî rengî Mam Celal cara didoyê jî bû serokkomarê Iraqê. Di kitêba Michael R. Gordon û General Bernard E. Trainor ya bi navê “The Endgame: The Inside Story of the Struggle for Iraq, from George W. Bush to Barack Obama” de bi hûrî behsa vê mijarê hatiye kirin.[27]

Gelek caran emerîkî di xwendina kêşûvekêşên Iraqê de nediketin ser rêyeka rast û heger şaşiyek jî kiribûna hemî caran diviya kurdan baca wê daba û li mafên xwe biborîna. Me dît di dema referandumê de jî mezintirîn sebebê dijayetiya Emerîkayê li hemberî referandumê ew bû ko li gor wan referandum dibe sebebê lawazbûna Heyder Ebadî û heger referandum neyêt kirin Ebadî dê xurt bibe û Îranê ji meydana siyasî ya Iraqê derxe. Ew analîza emerîkiyan ne rast bû, wan dixwest ko miletê Kurdistanê ji bo xatirê kesekê li mafên xwe bibore.

Di heqê babeta petrol û gazê de jî herêma Kurdistanê hîç pêngaveka berovajî qanûna-esasî neavêtiye. Di sibata 2007-ê de hemî amadekarî ji bo [derxistina] qanûna petrol û gazê temam bûn lê belê hikûmeta Iraqê dest bi kuştina demê û peydakirina bihaneyan kir. Di civînekê de ko Zalmay Xelîlzad[28] jî amade bû, wezîrekê destdirêj yê şî‘î behsa wê yekê kiribû ko pêwist e hikûmeta Iraqê xemsariyê di wê yekê de bike û demê bikuje û jixwe kurdan şiyana wê çendê nîne ew bi xwe petrolê derxin.

Vê yekê, niyeta hikimdarên Bexdayê zelaltir kir ko baweriya wan bi qanûna-esasî û şirîkatiyê nîne. Herêma Kurdistanê bi xwe

27. Gordon, Michael R. & Trainor, General Bernard E. (2013), “The Endgame: The Inside Story of the Struggle for Iraq, from George W. Bush to Barack Obama”, Pages: 642–646, Random House

28. Dîplomatê emerîkî yê bi eslê xwe efxanî ko di salên 2005–2007 de ambasadorê Emerîkayê bû li Iraqê.

petrol keşif kir û derxist, û dema herêm mecbûr bû petrolê rêke derve, hikûmeta Iraqê di meha sibata 2014-ê de butçeya herêmê qut kir. Qutkirina butçeya xelkê Kurdistanê pêngaveka neqanûnî û ne li gor qanûna-esasî bû û tawaneka mezin bû ko hîç ne ji tawana kimyabarankirina xelkê Kurdistanê ya ji aliyê rejîmên berê ve kêmtir bû û heta ji wê tawanê jî mezintir bû. Ji ber qutkirina butçeyê hemî xelkê Kurdistanê û heta zarokên li ber şîrî jî kir hedef.

Her ji ber wê kiryara hikûmeta Iraqê ya ne li gor qanûna-esasî û ji bo herêma Kurdistanê bikare butçeyê peyda bike, hikûmeta herêmê dest bi eksportkirina petrolê kir. Û piştî hingê mixabin li Bexdayê dest bi kampanyaya berovajîkirin û serobinkirina rastiyan û avakirina atmosfereka wisa kirin her kesê ko zêdetir dijminahiya kurdan bike li cem xelkê cihê wî bilindtir dibe û di hilbijartinan de jî zêdetir dengan distîne.

# Şerê Daişê

Siyaseta şaş ya hikûmeta Iraqê welat ber bi qeraxê roxiyanê ve bir. Siyaseta mezhebî û yekdest û marjînalîzekirina pêkhatiyan û gendeliyê Iraq ji qalibê dewletbûnê derxist. Ordî û hêzên ewlekariyê li ser bingehê girêdana bi şexsan ve û ne li ser bingehê girêdana bi niştimanê ve hatin organîze kirin. Wê siyaseta şaş atmosfereka minasib ji bo xuliqandina terorîstan li rojavayê Enbarê û Mûsilê çêkir. Di encamê de, dehê hezîrana 2014-ê di çavneqîngekê de bajarê Mûsilê ket destê terorîstên Daişê de û terorîst heta derwazeyên Bexdayê pêşde çûn. Çend mehan berî vê rûdanê bi rêya seyîd Emar Hekîm û doktor Roj Nûrî Şawês ko cihgirê serokwezîrê Iraqê bû, herwiha bi rêya ambasadorê Emerîkayê yê berê li Iraqê Robert Stephen Beecroft, min desthilatdarên Bexdayê ji wê yekê agahdar kirin ko terorîst li rojavayê Mûsilê li nêzîkî Hezerê[29] zêde aktîv in û tevgereka zêde dikin û xetera ketina Mûsilê di halê de ye. Lê belê serokwezîrê wê demê yê Iraqê Nûrî Malikî ev hişdariyên min cidî wernegirt û paşê beşeka zêde ya rojavayê Iraqê û wîlayetên li merkezê ketin bin destê dagirkariya terorîstan de. Min bi xwe jî berî ketina Mûsilê demekê bi telefonê Nûrî Malikî ji xetera tevgera zêde ya Daişê ya li rojavayê Mûsilê agahdar kir. Herwiha hêzên pêşmergeyan

29. Qezaya Hezer dikeve başûrê rojavayê bajarê Mûsilê û nêzîkî tixûbê Sûriyeyê ye.

pêşniyarek da hêzên iraqî da bi hev re ji bo paqijkirina Daişê ji wê deverê operasyoneka eskerî bikin lê belê mixabin têbînî û pêşniyarên pêşmergeyan cidî wernegirtin.

Piştî ko di dehê hezîrana 2014-ê de Daişê dest danî ser Mûsilê, pêşdeçûna Daişê li nêva axa Iraqê de bilez bû û nêzîkî Bexdayê bû. Lê belê bi rengekê jinişkave berê şerê xwe guhort û da aliyê Kurdistanê û êrişî Kurdistanê kir. Ev mesele yek ji nihêniyên mezin yên şerê Daişê ye û ji bo çi Daişê êrişî Kurdistanê kir! Dibe ko ev êriş bi dilê gelek aliyên şovenîst yên deverê jî be. Kurdistan cihekê stratejîk bû û dewlemenda samana avê û petrolê bû û ev jî sebebek bû ko Daiş çavê xwe berdiyê û dagîr bike. Daişê ji xwe re wisa hesibandibû ko kurd nikarin li ber xwe bidin û dê zû ji hev bikevin û xwe teslîm bikin. Daiş agahdara wê yekê bû ko pêşmergeyan sîlehên baş nînin û ablokaya Bexdayê û cîhanê li ser e. Digel wê jî Kurdistanê hêj lingê xwe neavêtibû ser rêya refah û pêşketinê. Yek ji sebebên êrişa Daişê jî rêlibergirina serxwebûn û pêşketina Kurdistanê bû. Ji bilî wê jî baskê şovenîst yê di nêv Daişê de dixwest deverên ko nakokî li ser in bi zora sîlehan ji bin destê kurdan derbêxe û kurdan û pêkhatiyên li wan deveran nehêle. **(nexşeya jimare 1)**

Ew li hêviyê bûn ko pêşmerge têkbiçe da ew bi hêsanî deverên madeya 140-ê vegirin û cîhan jî xwe lê bêdeng bike. Em, nemaze bi referandumê û rûdanên şazdehê oktoberê gehiştin wê netîceyê ewên ko arîkariya Daişê kirin da xurt bibe û pêşde biçe, ewên ko terbiyeya eskerî didan endamên Daişê û ew têrsîleh dikirin, ewên ko rêberiya wan dikirin û lojîstîka pêwist bo wan berdest dikir, her ew bûn yên ko Daiş dehf didan da meha adara 2014-ê êrişî Kurdistanê bikin. Daiş sîlehek bû di destê hêzên şovenîst yên deverê de ji bo rawestandina refah û serxwebûna Kurdistanê.

Di şerê Daişê de miletê Kurdistanê baceka pir mezin ya insanî û aborî da. Di wê demê de ko butçeya herêma Kurdistanê ji aliyê

hikûmeta Iraqê ve hatibû qut kirin û bihayê petrolê jî zêde daketibû mesrefa şerekê dijwar û zehmet li ser dirêjahiya hezarûpêncî kîlometreyan barekê yekcar mezin bû. Ji bilî wê jî herêma Kurdistanê mêvandariya milyonek û şeşsed hezar mişextiyên iraqî û sûriyeyî dikir. Di wî şerî de 1 921 pêşmergeyan canê xwe fidayî milet û niştimana xwe kir, 10 757 pêşmerge birîndar bûn û 63 jî êxsîr û bêserûşon bûn. Bi sedan destanên qehremaniyê hatin qeyd kirin û pêşmergeyên gelek ezîz û qehreman ji kîsê me çûn. Her bosteka axa dagirkirî ya Kurdistanê bi xwîna ezîz û qehremanekî ji destê terorîstan hatibû azad kirin. Lê belê mixabin me dît di nêv kurdan bi xwe de jî hinek kes hebûn ko dixwest qîmetê qehremanî û qurbandanê ya pêşmergeyan kêm bikin û li gor wan balafirên şerî yên hevpeymanan şerê Daişê kir û roleka pêşmergeyan nebû. Rast e ko piştgiriya asîmanî ya hevpeymanan arîkariyeka gelek baş bû û em hertim spasiya rola hêzên hevpeymanan û arîkariya wan ya ji bo pêşmergeyan dikin, lê belê ewên ko di meydanê de xwîna xwe dan û dijmin şkênandin pêşmerge bûn û ev heqîqet divêt wekî xwe bêt veguhostin bo neslên bên.

Daişê eziyet û ziyaneka zêde gehand miletê Kurdistanê. Tawanên naxhejîn li hemberî kurdên êzdî hatin kirin ko asta dilxelîniya terorîstan û îdeolojiya wan nîşan dida. Di destpêka şerê Daişê de sîlehên pêwist li ber destê hêzên pêşmergeyan nebûn. Iraqê ablokeya sîlehan danîbû ser pêşmergeyan û Emerîkayê jî rênedida welatan ko sîlehan bifiroşin pêşmergeyan. Halbûkî beşeka mezin ji sîleh û îmkanên ordiya dewleta Sûriyeyê û ya Iraqê ketibûn destê Daişê de. Dema Daişê di sêyê tebaxa 2014-ê de Şingal dagîr kir di destê pêşmergeyan de tenê sîlehên sivik hebûn. Ew pêşmergeyên ko wê demê li Şingalê bûn ne hêzeka mezin û têrsîleh bû. Ji aliyê cografî ve Şingal wekî giravekê bû ko 70 kîlometreyan ji herêma Kurdistanê û çeperên pêşmergeyan dûr bû. Û ew rêyên serekî yên ko herêma Kurdistanê bi Şingalê

ve girêdidan ji aliyê wan eşîrên ereban ve hatin girtin ko destê xwe xistibûn destê Daişê de û di demekê kêm de wan rê li ber çûna hêza piştgir ya pêşmergeyan bo Şingalê girt. Wê demê Emerîka û hêzên hevpeymanan jî hêj tevlî şerî nebûbûn heta ko bikarin piştgiriya pêşmergeyan bikin. Ji ber wan sebeban Daişê karî Şingalê dagîr bike.

Wan pêşmergeyên ko li çiyayê Şingalê digel xelkê û mişextiyan man bi qehremanî çiyayê Şingalê û Şerfedîn ji êrişên Daişê parast û rênedan ko destê Daişê bigehî bi sedan hezar kesên ko xwe spartibûn çiyayê Şingalê. Mixabin gelek caran dengê navlixwedana hinek aliyan têt guhê me ko li gor hesabê wan, wan Şingal parast. Halbûkî heta pêşmergeyan xwe organîze nekir û êriş nebir ser Daişê û rêya Sihêlan ya ko diçe Şingalê û hewza Zumarê û çiyayê Şingalê û bajarê Şingalê rizgar nekir[30] hîç kesek ji wan li meydanê

30. Her ji destpêka êrişa Daişê ya ser Kurdistanê û heta dawiya meha îlona 2014-ê guman û xema min ya serekî ew bû ka em çawa bikarin Kurdistanê, xelkê wê û pêşmergeyan ji bo rewşeka xwezayî ya wisa amade bikin da Kurdistan ji bo şerekê demdirêj amade bibe û pêşmerge jî ji aliyê plan, amadekarî û cesaretê ve bigehîn wê asta ko em pê dest bi êrişkirinê bikin û deveran bi quweta şerî ji nêv penceyên Daişê derxin; da zêdetir firset neyêt dan bo Daişê heta hizra xwe li vegirtina erd û deverên dî bike. Piştî ez gehiştim wê qenaetê hem pêşmergeyan û hem jî hemwelatiyan xwe ji wê çendê re amade kirine ko Kurdistan bikeve pozîsyona êrişbirineka temam ji bo azadkirina deverên dagirkirî, hingê min fermana destpêkirina operasyona Rebîeyê da û di berbanga roja 30-ê îlona 2014-ê de bi niyeta nehiştina tehdîda Daişê li deverên li ser tixûbî û herwiha astengkirina têkiliyên Daişê di nêvbera Sûriyeyê û Iraqê de, operasyona Rebîeyê bi beşdariya pênchezar pêşmergeyan destpê kir **(nexşeya jimare 2).**

Ev operasyon yek ji wan zincîreoperasyonanên herî giring bû ko bû sebeba şkênandina efsaneya Daişê li ser destê pêşmergeyan. Herwiha rêya gehiştina Çiyayê Şingalê xweş kir ji ber heta hingê gehiştina Çiyayê Şingalê armanceka stratejîk ya hêzên pêşmergeyên Kurdistanê bû. Piştî wê biserketinê, di berbanga roja 25-ê oktobera 2014-ê de hêzên pêşmergeyan nehiyeya Zummarê û gundên dorûbera wê ji destê terorîstan derxistin û gurzeka kujende li terorîstên Daişê da **(nexşeya jimare 3)**. Piştî hingê hemî êrişên dijminî li hemî cepheyên şerî yek li dûv yekê hatin têk birin.

Azadkirina Rebîe û Zummarê rê ji bo azadkirina devera Şingalê û şkênandina ablokaya li dor Çiyayê Şingalê xweş kiribû. Ji ber hindê di berbanga roja 17-ê

nebûn. Kengê pêşmerge li hemberî Daişê bi ser ket wê hingê wan destpê navlixwedan û xwederxistina pêş kir.

Digel vê hemiyê pêşmergeyan di şerê Daişê de destê xwe dirêjî tolstandinê nekir. Pêşmerge di wî şerî de pêbendê hemî qanûnên şerî bûn û heta yek carê tenê jî yek cih tenê jî yê sivîlan nekir hedef. Pêşmergeyan efsaneya Daişê şkênand û merdane di meydana şerî de tola xwişk û brayên xwe yên êzdî stand û serê Daişê êxist bin lingên kurdên êzdî.

Cihê mixabiniyê ye ko dewleta Iraqê di şerê Daişê de hîç nekarî pêkhatiyên [dînî û etnîkî] biparêze û arîkariya pêşmergeyan jî nekir. Ji aliyê hikûmeta Iraqê ve yek fîşek tenê jî ji bo hikûmeta herêmê nehat rêkirin. Ev hemî di rewşeka wisa de çêbû ko pêşmerge di mideta deh salan de ji para xwe ya li cem hikûmeta Iraqê hatibû bêbeş kirin; herçend li gor qanûna-esasî û peymanan pêşmerge beşek ji sîstema parastinê ya Iraqê bûn. Hikûmeta Iraqê neko tenê arîkariya pêşmergeyan nekir belko asteng û kelem jî li hemberî wê arîkariya ko ji aliyê welatên cîhanê ve ji bo pêşmergeyan dihat didanî. Li vêderê pirsiyara esasî ev e: Çima Iraqê di şerê Daişê de hevkariya herêma Kurdistanê nekir û di sepandina

desembera 2014-ê de ko roja alaya Kurdistanê jî bû fermana destpêkirina operasyona azadkirina devera Şingalê hat dan **(nexşeya jimare 4)**. Êrişa pêşmergeyan li mîhwera Zummarê bi êrişkirina ser sêriyana Herdanê ya di nêv dilê dijminî de destpê kir. Herwiha wan pêşmergeyên ko ew çar meh bûn li Çiyayê Şingalê bi qehremanî li ber xwe dida û rênedabûn Daişê ko Çiyayê Şingalê bigire, ji serê çiyayî ve êrişî çekdarên Daişê kir û di mideteka kêm de herdu hêzên pêşmergeyan li Herdanê gehiştin hevdu û serfiraziyeka tarîxî qeyd kirin û ablokaya li dor Çiyayê Şingalê ko diwazde hezar êzdî lê bûn şkênand.

Di roja 12-ê novembera 2015-ê de, bi niyeta azadkirina temamiya bajarê Şingalê û dorûbera wê ji destê terorîstên Daişê û paqijkirina wê deverê ji Daişê û qutkirina têkiliyên Daişê yên di nêvbera Iraqê û Sûriyeyê de, operasyona azadkirina Şingalê ji aliyê hêzên pêşmergeyên Kurdistanê ve bi piştgiriya asîmanî ya balafirên şerî yên hevpeymanan, ji sê aliyan ve destpê kir. Di wê operasyonê de bajarê Şingalê hat azad kirin.

ablokaya xwe û qutkirina butçeya herêmê de berdewam bû? Li hemberî vê cardî jî di şerê Daişê de yên ko arîkariya Iraqê kirin da Kerkûkê û deverên veqetandî biparêzin pêşmerge bûn. Heger hêza pêşmergeyên Kurdistanê bergiriya Kerkûkê nekira çarenivîsa wî bajarî dê ji ya Mûsilê ne baştir bûya û dê biketa destê terorîstên Daişê de. Gelek caran me dibihîst ko li gor qenaeta şovenîstan pêşmergeyan Kerkûk û deverên dî dagîr kirine lê belê berovajiya wê rast bû. Pêşmergeyan Kerkûk û deverên veqetandî û bîrên petrolê ji dagîrkarî û êrişên terorîstan parastin. Di şerê Mûsilê de pêşmergeyan xetên Daişê yên xweparastinê şkênandin û kilîta biserketinê da dest Heyder Ebadî. Bi hemî bawerî û dilfirehiya xwe pêşmergeyan dergehê cepheyên xwe ji bo hatina hêzên iraqî vekir.

Herêma Kurdistanê zêdebarî wî şerê giran û ablokaya malî ji aliyê Bexdayê ve û daketina bihayê petrolê li cîhanê, bû penageha milyonek û şeşsed hezar mişextiyên sûriyeyî û iraqî. Ev hejmar miadila ji % 25-ê niştecihên herêmê bû. Xelkê, hikûmetê, rêxistinan û organên hizbî yên herêmê roleka mezin di arîkarîkirina mişextiyan û pêşmergeyan de dît. Hejmareka zêde ya xelkê xwebexş çûne cepheyên şerî û arrîkariya mişextiyan jî kir. Cardî jî hikûmeta Iraqê ji bo vehewandin û niştecihkirina mişextiyan arîkariya hikûmeta herêmê nekir, herçend beşa herî mezin ya mişextiyan hemwelatiyên wîlayetên ji nêva Iraqê û suniyên Iraqê bûn, yanî iraqî bûn.

Çima hikûmeta Iraqê ko pereyekê zêde jî li ber destê wê bû di vehewandina mişextiyan de arîkariya herêmê nekir? Gelo herêma Kurdistanê ne beşek bû ji Iraqê? Yan jî desthilatdarên Iraqê her ji bingehê ve Kurdistan wekî beşeka ji Iraqê nedihesiband? Min bi dehê caran ev meseleya ko hikûmeta Iraqê di pirsa vehewandina mişextiyan de arîkariya herêmê nekiriye digel mêvanên biyanî û heyetên iraqî axaft lê belê ti netîceya wê nebû. Sekreterê giştî

yê Neteweyên Yekbûyî Ban Ki-moon du caran, di 24-ê tîrmeha 2014-ê û 26-ê adara 2016-ê de, serdana herêmê kir. Herdu caran jî min jê re got ko barê mişextiyan gelek giran e, herêmê tenê milê xwe xistiye bin vî barî, arîkariya civata nêvdewletî jî ne di asta pêwist de ye û hikûmeta Iraqê jî bi hîç rengekî arîkariya herêmê nekiriye. Min ji Ban Ki-moonî[31] re got gelo Bexda mişextiyên iraqî wekî hemwelatiyên xwe nahesibîne ji ber wê arîkariya wan nake.

31. Ban Ki-moon dîplomat û wezîrê derve yê berê yê Koreya Başûr bû ko ji sala 2006-ê heta dawiya 2016-ê bi qasî deh salan sekreterê giştî yê Neteweyên Yekbûyî bû.

# Bêhêvîbûna kurdan ji Iraqa nû

Her ji sala 2010-ê ve min hest bi wê yekê kir ko Iraqa nû ya piştî 2003-yê ber bi hilweşiyan û yekdestiyê ve diçe û di gelek civîn, hevdîtin û daxuyaniyan de min îşaret bi wê metirsiyê da. Ez lêxebitîm hemî aliyan agahdar bikim ko heger binpêkirina qanûna-esasî berdewam bike û şirîkatî li ber çavan neyêt girtin Iraq dê tûşî zehmetiyên gelek mezin bibe. Mixabin qîmet bi van hişdarî û rênîşandanan nehat dan û rewşa Iraqê û têkiliyên herêma Kurdistanê û Bexdayê jî roj li dûv rojê têrproblemtir dibûn.

Miletê Kurdistanê ev pirsiyar ji xwe dikir: Gelo em berê xwe bidin kîjan rêyê? Çareseriya esasî divêt çawa be? Di serdema qraliyet, komarî û be‘sê de şirîkatiya kurdan êxistin bin pêyan û miletê Kurdistanê hat jenosîd kirin. Di Iraqa federal û demokratîk ya piştî 2003-yê de jî hîç hêviyek nemaye. Divêt kurd çi bikin? Gelo sedsaleka dî jî şerî bikin? Ne em dikarin bi rêya şerî dawiyê li dewleta Iraqê bînin û ne jî hikûmetên Iraqê dikarin bi darê zorê, abloka û jenosîdkirinê dawiyê li miletê Kurdistanê bînin û bihelînin. Baş e, ji bo çi ev dozex wiha berdewam bike? Çima divêt hertim şer, problem û rikeberî di nêvbera me de hebe? Çima em hizrê li rêyeka dî nekin da aştî û brayetî heta ebedilabidînê di nêvbera me de binecih bibe?

Tecribeyên tarîxî ji me re dibêjin ko jêkveqetandina bi darê zorê ya miletan bi ser nakeve. Bi heman awayî jî pêkvekelandina bi darê zorê jî bênetîce ye. Piştî şerê didoyê yê cîhanê Elmanya ji aliyê hêzên hevpeymanan ve wekî Elmanyaya Rojhilatê û Elmanyaya Rojavayê hat dabeş kirin. Herçend vê dabeşkirinê çend dehsalekê dewam kir jî di netîceyê de, di dawiya salên heştiyê yên sedsala borî de bi roxandina dîwarê Berlînê dawî li vê dabeşkariya bi darê zorê hat anîn û niho herdu beşên Elmanyayê hevdu girtine. Ev babet ji bo Çekistan û Slovakyayê jî bi rengekê dî bû. Çekistan û Slovakya berê bi darê zorê pêkve hatin girêdan û dewleta Çekoslovakyayê jê hat çêkirin. Lê belê paşê ji êkdu cida bûn û niho du dewletên cida ne û bi aştî li tenişta êkdu dijîn.

Ji pêkveleziqandina bi darê zorê ya pêkhatiyên Iraqê jî, di sedsala borî de, karesatên mezin çêbûn. Dibe ko du bira di nêv yek malê de tûşî problem û nakokiyan bibin. Lê belê heger herdu bira malên xwe jêk cida bikin dawî bi nakokiyan têt û dê hetahetayê bira û pişta êkdu bin. Ev çareseriyeka esasî ye ji bo têkiliyên di nêvbera Kurdistanê û beşên dî yên Iraqê de jî. Helbet ev pirsiyar bûbûn mijara rojane ya xelkê Kurdistanê û merkezên siyasî. Çima em bi jêkfêmkirinê û birayane nebin du bira û du cîran û heta hetayê li tenişta êkdu bi aştî nejîn? Çima em nebin pişta êkdu û kûrahiya stratejî, aborî û emniyeta êkdu?

Çima em nebin temamkerên refah û pêşketina aborî û warên dî li devera xwe û ji bo heta hetayê dawiyê li karesat, girift û aloziyên xwe neînin? Ev pirsiyar ji ber hindê derketin meydanê çimko mixabin ji bo miletê Kurdistanê rêyên dî nehiştin heta ko em bikarin bi aştiyê û bêyî problem di nêv dewleta Iraqê de bijîn. Me hemî rê tecribe kirin lê belê netîceya wan şikestin bû. Di çend salên borî de min ev rastî digel gelek kesayetî û berpirsên iraqî, herwiha digel kesayetî û dîplomatên biyanî berbehs kir. Min ji wan re got em rûbirûyê problemeka çaresernekirî ya sedsalî ne.

Em westiyayî ne û zêdetir taqeta me nemaye ko bi problem, krîz û şerî vê meseleyê hel bikin. Hon werin û ji me re bibêjin ka miletê kurd çiyî dî bike da Iraq yekparçe bimîne û miletê Kurdistanê çi rêya dî tecribe bike da bikare di Iraqê de bimîne. Garantiya tikîtenê ya mana me digel Iraqê qanûna-esasî ye. Qanûna-esasî jî hatiye binpê kirin û rojane zêdegavî li hemberî daxwaz û mafên xelkê Kurdistanê tên kirin.

Tevgera rizgarîxwaz ya kurdan qet problem digel birayên xwe yên ereb nebû. Li Iraqê problema me digel rejîman û eqliyeta serdest bû. Her li ser bingehê wê baweriyê jî slogana esasî ya şoreşa îlonê ”Demokrasî bo Iraqê, otonomî bo Kurdistanê!” bû. Di hemî xebat û şoreşa miletê kurd de yek carê tenê jî şoreşa kurdan destê xwe nebir kiryarên terorîstî yan tirsandin û teqandina xelkê sivîl yê ereb da problemên siyasî yên di nêvbera me û hikûmetê de nebin problemên neteweyî. Heger ew problemên ko niho hene hertim wekî xwe bimînin hingê îhtimal zêde ye ko ew problem bibin mesele û nakokiyên neteweyî û etnîkî û karesata jidil jî hingê dê destpê bike.

Her di vê nêvberê de û paralel digel şerê Daişê, mixabin me didît baskek bi qestî lêdixebite ko cadeya erebî li dijî kurdan gur bike. Ew karekê neberpirsane û bêwijdan bû ko hinek aliyên iraqî dixwest bi vî rengî li ser esasê dijminahiya mafên kurdan cihekî û dengan ji bo xwe garantî bikin. Ev hemî, zengilê xetereka cidî bûn ko paşeroja Iraqê tarîtir û nediyartir bikin. Ew bi pêşketin, avakirin û refaha jiyanê li herêma Kurdistanê tengav bûbûn. Wan digot kurd dewlemend bûne û pere û petrola Iraqê dibin. Herçend eve sed sal in ko dewleta Iraqê petrola Kurdistanê dibe û bi petrola Kurdistanê bûye dewlet û pê sîleh kiriye û pê şerê kurdan û dewletên cîran jî kiriye.

Di vê rewşê de em bi temamî ji wê çendê bêhêvî bûn ko digel Iraqê bimînîn. Pêwîst dikir em bi aşkerayî behsa mafê

rewa yê miletê xwe bikin ko serxwebûn û serwerî ye. Miletê Kurdistanê hemî ew şertên bingehî hene ko wekî miletên dî yên cîhanê dewleta xwe hebe. Lê belê divêt praktîzekirina wî mafî bi metodeka aştiyane û bi rêya diyalogê digel Bexdayê, welatên deverê û cîhanê be. Me ew jî baş dizanî ko heger maf neyêt standin nayêt dan. Heger Kurdistan li hêviya wê yekê be serxwebûn li ser sêniyeka zêrîn jê re bêt pêşkêş kirin, bi dilekê emîn em dizanin ko ew hêvî qet pêknayêt.

Me ji sala 1991-ê ve ji bo dewletên cîran piştrast kir ko em ne serkaniya tehdîdê ne. Cîranên me berê bi guman û bi çavê tehdîdê li meseleya federalîzmê temaşa dikir. Li Iraqê bi xwe jî bi heman rengî dudilî û dijminahî li hemberî sîstema federaliyê hebû. Lê belê menaya federalîzmê gelek besît bû. Federalîzm dabeşkirina adilane ya hêz û samanê ye ko li gelek welatên cîhanê têt peyrew kirin ji ber ew piretnîk û pirneteweyî ne.

Di didoyê sibata 2015-ê de min li Konfersansa Munchenê[32] hejmarek ji rêberên welatan dîtin. Yek ji wan şansolyeya Elmanyayê banû Angela Merkel û yek jî cihgirê serokê Emerîkayê Joe Biden bû. Hemî serok û rêberên welatan bi serketin û qehremaniya pêşmergeyan di şerê terorê de sersam bûn. Hesteka wisa li cem min peyda bû ko behskirina serxwebûnê ji bo Kurdistanê wekî berê li cem civata nêvdewletî ne tabû û ne jî qedexe ye. Diviya bi awayekê aşkera behsa wî mafê xwezayî yê miletê Kurdistanê bêt kirin. Her di Konferansa Munchenê de min meseleya pêngavavêtina ber bi serxwebûnê digel serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî axaft û min jê re got divêt ev mesele bi jêkfêmkirin, diyalogê û awayekê aştiyane bêt çareser kirin.

32. Konferansa ewlekariyê ya Munchenê konferanseka nêvdewletî ya berfireh e ko salane bi beşdariya nûnerên welatan di warê siyasî, aborî, eskerî û ewlekariyê de li bajarê Munchenê yê Elmanyayê çêdibe.

# Serdana bo Emerîkayê

Di meha adara 2015-ê de me serdana Emerîkayê kir û digel serok Barack Obama û Joe Biden ko wê demê cihgirê serok bû, em civiyan. Berî serdanê ez digel hemî partiyên siyasî yên Kurdistanê civiyam û min ji wan pirsî gelo bi dilê we ye ko ez meseleya serxwebûnê digel serokê Emerîkayê baxivim. Bi dilê hemî aliyan bû ko ez ji serok Obama re behsa serxwebûna Kurdistanê bikim.

Piştî bidestxistina wê piştgiriya siyasî ya aliyên herêma Kurdistanê, amadekariyên ji bo serdana me ya bo Emerîkayê hatin kirin. Di seferê de bi zanîn min xwest cihgirê serokê hikûmetê Qubad Talebanî ko kurê xwedêjêrazî Mam Celal e û wezîrê dewletê Derbaz Kosret ko kurê Kosret Resûl e û herwiha Mistefa Seyîdqadir ko ji Tevgera Goranê û wezîrê pêşmergeyan bû, digel wê heyeta kurdistanî bin ko serdana Koşka Spî dike. Min xwest ko ew paşê şahidiya wê yekê bidin ka digel serok Obama û berpirsên emerîkî min çawa behsa serxwebûnê û mafên miletê Kurdistanê kiriye û helwêsta Emerîkayê jî bibînin û ji bo partiyên xwe û xelkê xwe behsê bikin. Min xwest ew digel min bin û şahidê wê yekê bin da paşê ti kes nebêje serxwebûn meseleyeka şexsî ya Mesûd Barzanî ye. Belko da bizanin serxwebûn girêdayî jiyan û

çarenivîsa hemî hemwelatiyan e û bêyî ferqûcidahiya siyasî, neteweyî û dînî mafê hemiyan e.

Li gor cetwela serdana heyeta herêma Kurdistanê bo Emerîkayê, pêncê adara 2015-ê roja sêşemê serok Obama li Koşka Spî pêşwazî li me kir. Di civînê de cihgirê serokê Emerîkayê Joe Biden, ambasadorê Emerîkayê yê li Iraqê û hinek şêwirmendên Koşka Spî amade bûn. Min pir bi zelalî ji serok Obama re behsa cefaya sedsalî ya miletê Kurdistanê kir û jê re got:

> "*Me hemî rê ceribandin û em ji vê rewşê westiyayî ne. Miletê Kurdistanê jî eve sed sal in ko qurbanan dide û li gor hemî qanûn û urfên asîmanî û insanî jî mafê wî heye ko biryarê li ser çarenivîsa xwe bide û ew bi xwe bibe xudanê biryara xwe û bide ser wê rêyê ya ko ji xwe re baş dibîne. Em ber bi referandumê ve diçin lê belê niho bijareya me ya esasî şerê Daişê ye. Bexda şirîkatiyê qebûl nake û em jî nikarin dûvelangbûnê qebûl bikin. Heger ev siyaseta Bexdayê berdewam bike em nikarin bi vî rengî digel wan berdewam bikin.*"

Serok Obama qenc guhê xwe dabû gotinên min. Got: "Min di heqê kurdan de xwendiye û ez agahdarê tarîxa kurdan û xebat û zehmetiyên miletê Kurdistanê me. Ez niyet û timahiya miletê Kurdistanê ya ji bo serxwebûnê fêm dikim û bextewar im jî ko ji we dibihîsim niho bijareya we ya pêşiyê ramaliştin û nehiştina Daişê ye." Serok Obama got dosyaya kurdan û Iraqê di destê cihgirê wî Joe Biden de ye. Got digel cihgirê min rûnin û li ser vê meseleyê baxivin.

Roja piştî wê, şeşê adara 2015-ê ji bo taştêya sibehê ez bûm mêvanê cihgirê serokê Emerîkayê. Rûniştina me gelekê dirêj bû û çendseetekê dewam kir. Me gelek bi hûrî di heqê tarîxa me ya

mişterek ya sedsalî digel Iraqê û meseleya serxwebûna Kurdistanê de sohbet kir. Wî bi hûrî nêrîna welatê xwe di heqê serxwebûna Kurdistanê û problem û aloziyên Rojhilata-nêvê de raberî min kir û di dawiya axaftina xwe de ji min re got: "Ez û tu, em herdu dê di temenê xwe de bi çavên xwe serxwebûna Kurdistanê bibînin."

Her di wê serdanê de li Emerîkayê ez digel wezîrê parastinê Ashton Carter û hinek endamên Kongreya Emerîkayê civiyam. Herwiha digel serokê Odeya Ticaretê ya Emerîkayê (United States Chamber of Commerce) û hinek akademîsyen û berpirsên medyayê û diyasporaya kurdan ya li wî welatî hevdîtinên min çêbûn. Di yek ji wan hevdîtinan tenê de jî kesekê negot çênabe ko hon referandumê bikin yan çênabe ko hon ber bi serxwebûnê ve biçin, tenê pirsa dema wê ji me dikirin. Berpirs û siyasetmedarên Emerîkayê gelek spasiya fedakariya pêşmergeyan dikir û rêza wan ji bo xweragiriya miletê Kurdistanê û dilfirehiya xelkê Kurdistanê hebû: ji ber vehewandina bi sed hezaran mişextiyên bêçare ko ji tirsa tehdîd û sitemkariya terorîstên Daişê berê xwe dabûn herêma Kurdistanê.

Piştî vegeriyana min ji Emerîkayê her di cih de ez digel aliyên siyasî yên Kurdistanê rûniştim û min ji bo wan aliyan behsa encamên serdana xwe kir. Di civîna tarîxî ya 18-ê adara 2015-ê de hemî aliyan bi awayekê aşkera fikr û boçûna xwe ji bo piştgiriya prosesa serxwebûnê diyar kir. Têt bîra min her di wê civînê de emîrê Komeleya Îslamî rêzdar Elî Bapîr ji bo encam û bidestketiyên serdana me ya bo Emerîkayê sersamiya xwe nîşan da û go: "Cenabê kek Mesûd, wisa xuya dike ko tu bi destekê tejî vegeriyabî Kurdistanê, ev karekê gelek mezin e û berpirsiyariya wê jî mezin e. Gelo tu amade yî wê berpirsiyariyê li xwe bigirî?" Wekî bersiv min jê re got: "Belê mamoste, berpirsiyariyeka mezin û tarîxî ye û ez amade me vî barî hilgirim lê belê bi şertê ko em di nêv xwe de têknedin."

Sebebê wê bersiva min ew bû ko ez ji wê yekê ne piştrast bûm ka gelo hinek partî dê heta dawiyê di prosesa serxwebûnê de digel miletê Kurdistanê bimînin, yan jî berovajiyê wê dê di nîvê rêyê de pişta xwe bidin viyan û îradeya miletê xwe. Mehekê piştî wê civînê li şona karkirinê ji bo meseleyeka çarenivîssaz ya wekî serxwebûnê, me dît ko hinek partî li parlamentoyê mijûlî çêkirina krîzan û derbeyan in û rûdanên bîstûsêyê hezîranê û yên piştî wê çêbûn. Heger sala 2015-ê aliyên siyasî xebat ji bo sozên xwe bikira û ber bi krîzçêkirinê ve neçûna niho em hemî dê di rewşeka dî de bûna. Me dît jî di referanduma 2017-ê de çawa hinek alî bi hemî hêza xwe ve li dijî referandumê rawestiyan û rûdanên piştî referandumê jî delîl û belge ne ji bo piştrastkirina wê tirsa min ko hertim li cem min hebû.

# Serdana bo Bexdayê

Bîstûnehê meha îlonê ya 2016-ê, dema ko Daiş rûbirûya şikestinên yek li dûv yekê bû û lawaz bû, min digel heyeteka bilind ya aliyên siyasî yên Kurdistanê serdana Bexdayê kir. Rawestgeha yekê ya serdana me dîtina serokwezîrê wê demê yê Iraqê Heyder Ebadî bû. Me digel Heyder Ebadî behsa şerê Daişê û meseleya mişextiyan ko çîxê herêma Kurdistanê û Iraqê dixwest kir. Min jê re got jî heyeta Kurdistanê bo hindê hatiye da ronahiyê bêxe ser paşeroj û rengê têkiliyan û ser mihaweleyên hevbeş yên herdu aliyan yên ji bo îstiqrar, emniyet, refaha aborî û jinûveavakirinê. Me xwest ji serokwezîrê Iraqê re bibêjin ko em hatine da bi zimanê jihevdufêmkirin, diyalog û niyeteka saf di heqê paşerojê de baxivin da Iraq û herêma Kurdistanê bibin kûrahiya berjewendî û stratejiya êkdu.

Her heman rojê hevdîtineka me ya berfireh digel şexsiyetên iraqî û serokên grupên siyasî yên Iraqê hebû û min ji wan xwest ko ji bo nehiştina probleman hizrê li rêya çareseriyeka esasî bikin. Herwiha hevdîtina me digel gruba Muqteda Sedir, Îtilafa Niştimanî, Îtilafa Erebî û rêberên suniyan û rêberiya Partiya Dewayê çêbû. Êvara heman rojê li mala seyîd Emar Hekîm civîneka me ya berfireh digel alî û şexsiyetên şî‘iyan çêbû.

Di wê civînê de min axaftinek pêşkêşî amadebûyiyan kir û behsa wê yekê kir ko hatina me mesajek e ji bo çareserkirina girifta sedsalî ya di nêvbera me de. Min got vaye bi xebata hemî aliyan Daiş ber bi şikestinê ve diçe û pêwist e em xwe ji bo qunaxa piştî Daişê amade bikin. Min bi aşkerayî ji nûner û şexsiyetên şî'î re zelal kir ko kurdan piştî sala 2003-yê û hirve wisa dizanî ko qanûna-esasî bingehê prosesa siyasî û jiyana nû ye. Mixabin jihevqutbûnek çêbûye û wisa lêhatiye ew şî'iyên ko bi pakî û başiyê tên wesif dan jî dijayetiya mafên kurdan dikin. Min got para me di şirîkatiya digel dewleta Iraqê de 4 500 gundên wêran, 12 000 ciwanên kurdên feylî yên bêserûşon, enfalkirina 8 000 barzaniyan û 180 000 hemwelatiyên dî ji neteweya kurd bû, û bi hezaran kurd jî bûn qurbana sîlehên kimyayî.

Piştî sala 1991-ê ji bo xatirê Iraqê û ji bo vekirina rûperekê nû û aştiyê em digel tawanbaran rûniştin û me destê xwe da destê wan herçend ew dest bi xwîna miletê me sor bûbûn. Ez wê hingê dema ko hatim Bexdayê di nêv robarê xwîna miletê xwe de hatim Bexdayê. Belê em ji bo wê yekê hatin Bexdayê da ji bo xatirê Iraqê û ji bo xatirê pêkvejiyanê û aştiyê rûperekê nû vekin. Wan ew jî layiqê me nedît û wekî tawankaran li me temaşa dikir. Niho jî mixabin piştî qunaxa 2003-yê wisa lêhatiye şî'iyên ko berê hevpeymanên kurdan bûn nanê kurdan qut kir. Nedibû wisa bi hêsanî destê xwe dirêjî wê çendê bikin ko miletê kurd pê ceza bikin.

Min ji rêberên şî'iyan re got: "Em di herdu qunaxên şirîkatiyê de feşilîn û divêt li dûv çareyeka nû bigerin û paşerojê li ser esasekê dî ava bikin. Madem em nikarin bibin şirîkên êkdu, werin bila bi jihevdufêmkirinê em bibin du bira û du cîranên jidil. Em dixwazin ko hon me fêm bikin." Her di wê civîna berfireh de piraniya şexsiyetên şî'î li ser wê yekê hemfikir bûn ko di dema borî de gelek xeletî çêbûne û divêt em li dûv çareyekê bigerin.

Lê belê bi kîjan rê û alternatîvê jî be çênabe ko şer û xwînrêtin tê de hebe. Her li wêderê biryar li ser wê çendê hat dan ko li Bexdayê komîteyeka taybet bêt ava kirin ji bo diyalogê û ji bo lêkolîna tîkiliyên paşerojê û ka gelo em wekî şirîk bimînin yan bibin cîran. Di hemî haletan de jî her divêt jihevdufêmkirin hebe.

# Biryara pêkanîna referandumê

Serdana Bexdayê û gihandina mesaja herêma Kurdistanê bo aliyên iraqî hîç tiştek ji rewşê neguhort û hikûmeta Iraqê di qutkirina butçeyê de berdewam bû herçend di şerê Daişê de hêzên pêşmergeyan û hêzên iraqî hemahengî hebû. Berî serdana min ya bo Bexdayê jî heyeteka aliyên şî'î ko ji Hadî Amirî, Xalid Etiye û Sadiq Rikabî pêkdihat serdana min kir. Min ji wê heyetê re got: "Werin em çareyekê ji vê rewşê re bibînin. Yan bila şirîkatî bêt bi cih kirin yan jî em bi awayekê aştiyane bibin du bira û du cîran, yan jî li gor nîşanên ko xuya dibin divêt şer di nêvbera me de çêbe." Wê gavê Hadî Amirî got "neuzûbîl-lah, mustehîl e û çênabe ko şer di nêvbera me de çêbe". Paşê jî ayeteka Qurana pîroz di heqê telaqê de xwend û got: "Al-telaqu merretanî, fa imsaku bima'rûfîn ew tesrîhu bi ihsani" "Telaq du caran e, yan bi maqûlî biparêze yan jî bi qencî berde."[33]

Wan hemî binpêkirinên qanûna-esasî ko çêbûn, digel binpêkirina peymanan, têkçûna tifaqê di qanûnnivîsandinê de, nemana balansê di dezgehên dewletê de, qutkirina butçeyê û givaştinên li ser Kurdistanê wisa li me kir ko bigehîn wê baweriyê

33. "Al-telaqu merretanî fa imsaku bima'rûfîn ew tesrîhu bi ihsani" destpêka ayeta 229-ê ya sûreyê Beqere yê Qurana pîroz e ko behsa meseleya telaqê/hevduberdanê dike.

hêdî em ne şirîkên dewleta Iraqê ya piştî 2003-yê ne û di paşerojê de jî ew me wekî şirîk qebûl nakin û lewra divêt em li dûv çareyekê bigerin.

Her di wê çarçeweyê de, sêyê tîrmeha 2014-ê min serdana Parlamentoya Kurdistanê kir. Li Parlamentoya Kurdistanê min axaftinek pêşkêş kir û tê de behsa rewşa siyasî ya Iraqê û krîzên vê dawiyê kir û bal kişand ser wê yekê ko Kurdistanê deh salan hewla wê çendê da ko prosesa siyasî, demokrasî û pêkvejiyanê li Iraqê bi ser keve. Lê belê binpêkirina qanûna-esasî, hizra yekdestiyê, xweferzkirinê û marjînalîzekirinê nehişt ko ev hewl bi ser kevin û Iraq gehişt vê roja ko em niho dibînin. Min got jî Kurdistan bi hîç rengekî ne binaskara vê rewşa niho ya Iraqê ye û ew kesên ko destê wan tê de heye divêt barê berpirsiyariyê hilgirin. Niho wexta wê ye ko Kurdistan bi xwe biryarê li ser çarenivîsa xwe bide û ew maf jî li gor qanûna-esasî ye ji ber qanûna-esasî ya Iraqê rê daye Kurdistanê ko çarenivîsa xwe diyar bike, çimko di qanûna-esasî de hatiye nivîsandin ko "pêbendbûna bi vê qanûna-esasî yekparçetiya axa Iraqê diparêze". Min ji Parlamentoya Kurdistanê jî xwest lezê li erêkirina qanûna Komîsyona Hilbijartinan û Rapirsiyê ya herêma Kurdistanê bike da di dema herî zû de Heyeta Bilind ya Hilbijartinan bêt damezirandin û herwiha xwest Parlamentoya Kurdistanê jî xwe ji bo derxistina wan rêbazên ko ji bo referanduma biryardana çarenivîsa miletê Kurdistanê pêwîst in amade bike.

Piştî wê tarîxê jî binpêkirinên hikûmeta Iraqê berdewam bûn. Herwekî min berê îşaret pê kirî, herêma Kurdistanê baceka mezin ya insanî û aborî di şerê Daişê de da. Mêvandariya sedhezaran mişextiyan kir. Û hikûmeta Iraqê di qutkirina qûtê xelkê de berdewam bû û bi bihaneyên cida-cida milê xwe nedida ber çareserkirina probleman. Cihê daxê bû ko me nebihîst "merce'iyeta şî'iyan" carekê tenê jî îşaretekê bide hikûmeta Iraqê

da butçeya herêma Kurdistanê bide herçed bi rêyeka neqanûnî qut kiribû.

Di operasyona azadkirina Mûsilê de lihevkirin li ser wê yekê hat kirin piştî ko hêzên pêşmergeyan xeta parastinê ya Daişê bi dirêjahiya 107 kêlometreyan bişkênin ew hêz dê vegerin nuqteya berî 17-ê meha dehê ya sala 2016-ê ko roja destpêkê ya operasyona azadkirina Mûsilê bû. Pêşmergeyan şer kir û xeta parastinê ya Daişê şkênand û kilîta Mûsilê da dest hêzên iraqî û bi temamî pêbendên lihevkirinê bûn **(nexşeya jimare 5)**, lê belê Heşdê û hêzên iraqî lihevkirin binpê kir. Di operasyona azadkirina Mûsilê de biryar ew bû ko serokwezîrê Iraqê bi qasî deh milyar dînaran arîkariyê ji hêzên pêşmergeyan re rêke da xeta nû ya pêşmergeyan bêt qayîm kirin lê belê ew soza xwe jî piştguh kir.

Ji bilî wan hemiyan jî agahdarî li cem me hebû hêzên iraqî û Heşda Şe'bî ko lihevkirina operasyona Mûsilê jî binpê kiribûn, plana wan ew e piştî şerê Daişê ji deverê paşve xwe venekişînin û daxwaza wê yekê li pêşmergeyan dikir ko vegerin tixûbên 2003-yê. Tixûbê 2003-yê jî tixûbê di nêvbera pêşmergeyan û rejîma Be'sê de bû û bi hîç rengekî ne tixûbên siyasî û îdarî bûn **(nexşeya jimare 6)**.

Plana wan ew bû Şingalê û deverên dî yên madeya 140-ê ko ew çar sal bûn pêşmergeyan bi xwîna xwe diparast bigirin. Ji bilî wê jî Daişê li Telehferê [34] şer nekir û bêyî şer bajar ji bo Heşdê hişt û çû. Herwiha operasyona azadkirina Hewîceyê bi bihaneyên cida-cida hat paşde dan.

Xetera paşdedana operasyona rizgarkirina Hewîceyê heta piştî rizgarkirina Mûsilê li ber çavan bû. Paşdedana menzilgeha herî dawiyê ya Daişê ko Hewîce bû [35], îşareteka zelal bû ji bo wê

34. Dikeve rojavayê wîlayeta Mûsilê û 70 kîlometreyan ji bajarê Mûsilê dûr e û nêzîkî 60 kîlometreyan ji tixûbê Sûriyeyê jî dûr e. Piraniya niştecihên wî bajarî tirkmen in.
35. Çilûheşt kîlometreyan ji başûrê rojavayê bajarê Kerkûkî dûr e û piraniya niştecihên wê erebên sunî ne.

çendê ko dixwazin piştî azadkirina hemî cihan ji destê Daişê vêca bi navê azadkirina Hewîceyê û bi wê hêcetê hêzeka mezin bînin dorûbera Kerkûkê. Çimko her ji esas ve armanca wan ew bû Kerkûkê ji bin kontrola pêşmergeyan derbêxin. Di binpêkirina peymana operasyona azadkirina Mûsilê de îşaret û mesajên xeter hebûn.

Em yên ko bi niyeteka saf ji bo vegirtina Mûsilê hemahengî û hevkarî kir, me bi hîç rengekî bîra wê yekê nedikir ko ew bi vî awayî xiyanetê bikin û peymanan binpê bikin û bi vî rengî reftarê bikin. Me pêşbînî nedikir birayên me yên şî'î ko li ser pişta me û bi hevkariya me hatin ser desthilatê dê helwêsta wan li hemberî miletê kurd dijminane be. Her bi xêra me piştî roxiyana rejîma berê Emerîka amade bû digel beşeka siyasetmedarên şî'iyan danûstandinê bike. Di ser wê re jî em ji wê yekê piştrast bûn miletê Kurdistanê problemeka mezhebî nîne û nabe beşek ji wê pirsgirêka kûr ya ko di Iraqê de heye.

Kurdistanê esasên welatbûnê hene û mafê wê heye ko viyana xwe derbibire. Ew qanûna-esasî ya ko bû bingeha yekgirtina pêkhatiyên Iraqê hat binpê kirin. Di dîbaceya qanûna-esasî ya Iraqê de bi zelalî derbas dibe ko "pêbendbûn bi vê qanûna-esasî ve garantiya mana yekgirtîbûna Iraqê ye".

Di salên borî de hikûmeta Iraqê 55 madeyên qanûna-esasî binpê kiribûn. Prensîpa şirîkatiyê di hikimdariyê de; balansa di demûdezgehên dewletê, ordiyê û aboriyê de; û lihevkirina di biryardan û qanûnnivîsaninê de bi temamî hatibûn binpê kirin. Mantiqa ferzkirina nrîna "piraniyê" ketibû cihê wan prensîpên ko Iraqa nû li ser hatibû ava kirin. Li gor mantiqa ferzkirina nêrîna "piraniyê" hêdî ti meydan ji kurdan û pêkhatiyên dî re nemabû. Berdewam peyman dihatin binpê kirin. Her sal di qanûna butçeyê de hewl dihat dan pişka malî ya herêma Kurdistanê bêt biçûk û biçûktir kirin û paşê ew jî qut kirin. Hêdî ji me re hîç piştpalek

nemabû em bikarin berdewam bikin û digel eqliyetekê bijîn ko baweriya wê bi qebûlkirina şirîkekê nîne. Pirsyar ev e: Madem rê nayêt dan ko em şirîkên vî welatî bin em dê bi çi hêviyekê endamên vî welatî bin? Di gelek qunaxan de ji bo xatirê Iraqa nû û li ser sozên Emerîkayê me çavên xwe ji gelek mafên xwe û zêdegaviyên hikûmetên iraqî re neqandibû.

Ev hemî sebebên wê çendê bûn ko em digel aliyên kurdistanî bigihîn wê netîceyê yan divêt em di dewleta Iraqê de şirîk bin yan jî wekî sedsala borî her di xelekeka vala de bizivirin. Madem Bexdayê jî nekarî me wekî şirîk qebûl bike divêt em bidin ser rêya xwe.

Krîza siyasî û nêvxweyî jî bedena herêma Kurdistanê girtibû û hinek alî çûn aliyê cepheyê li dijî pêngavavêtina ber bi serxwebûnê ve lê belê dema wê hatibû rê bêt dan bo xelkê da gotina xwe bibêje û hemî alî bizanin ka viyana xelkê Kurdistanê çi ye. Ji bo ew hêcet jî nemîne ko goya serxwebûn mijareka takekesî yan viyana aliyekê ye, diviya em vegeriyana bo serkaniya herî bilind ya meşrû'iyetê ko ew jî viyan û daxwaza miletî ye.

Ji ber hindê roja çarşemê, heftê hezîrana 2017-ê, di civîneka tarîxî de serokatiya herêma Kurdistanê û aliyên siyasî yên herêma Kurdistanê û nûnerên pêkhatiyên Kurdistanê biryareka tarîxî da û 25-ê îlona 2017-ê wekî roja pêkanîna referandumê destnîşan kir. Di rastiyê de berî civînê ti kesê nedizanî ka referandum dê kîjan rojê çêbe. Diyarkirina wê rojê li ser pêşniyara aliyên siyasî û bi şêwirîna digel Komîsyona Bilind ya Hilbijartinan û Rapirsiyê ya herêma Kurdistanê bû. Komîsyonê ji bo raçavkirina rêbazên ji bo pêkanîna proseseka wiha mezin pêwistî bi wextê hebû. Nûnerên komîsyonê ko di civînê de amade bûn got ew dikarin ji bîst heta sihê îlonê vî karî bikin. Civînê jî roja 25-ê îlonê ji bo pêkanîna referandumê li herêma Kurdistanê û li deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya

herêma Kurdistanê destnîşan kir. Hêjayî îşaretpêdanê ye di civînê de aliyên siyasî israreka zêde li ser wê çendê kir ko divêt referandum li Kerkûkê û deverên dî yên madeya 140-ê bêt kirin.

Her di civînê de piştî diyarkirina wê rojê, beşdar li ser wê yekê li hev hatin ji bo garantîkirina yekdengiya niştimanî divêt Parlamentoya Kurdistanê ji nû ve bêt aktîv kirin û hewla nehiştina problemên siyasî yên nêvxweyî bêt dan. Di heman demê de jî kar ji bo baştirkirina şertên jiyana xelkê, yên meaşwergiran û yên çîn û tebeqeyên Kurdistanê bêt kirin. Civînê biryar jî da ko Konseya Bilind ya Referandumê bi serokatiya serokê herêma Kurdistanê bêt ava kirin û hemî partî di mideta pênc rojan de nûnerên xwe ji bo komîteyên taybet yên referandumê diyar bikin.

Ew hizbên ko protokola civînê îmza kirin ev bûn: Partiya Demokrat ya Kurdistanê, Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê, Yekgirtûya Îslamî ya Kurdistanê, Bizûtneweya Îslamî ya Kurdistanê, Hizba Şiyû'î ya Kurdistanê, Hizba Sosyalîst Demokrat ya Kurdistanê, Hizba Zehmetkêşên Kurdistanê, Partiya Kirêkar û Rencderên Kurdistanê, Partiya Çakzaziya Pêşkewtû ya Kurdistanê, Lîsta Hewlêrê ya Turkmenî, Bereya Turkmenî ya Iraqê, Partiya Geşepêdana Turkmenan, Lîsteya Ermeniyan li Parlamentoya Kurdistanê, Bizûtneweya Demokratîk ya Aşûrî û Encumena Gelê Kildan Siryan Aşûr.

Piştî temambûna civînê miletê Kurdistanê bi daxuyaniyekê ji wê biryara tarîxî hat agahdar kirin. Orjînalê daxuyaniyê bi vî rengê li jêrê bû:

"Roja çarşemê, heftê meha şeşê ya sala 2017-ê li Selahedînê nûnerên bilind yên partiyên siyasî yên li parlamentoyê û yên di hikûmeta herêma Kurdistanê de, bi amadebûna cihgirê serokê herêmê, serokwezîrî, serok û cihgirê serokê Komîsyona Bilind ya Hilbijartinên Kurdistanê û amadebûna serokê herêma Kurdistanê civiyan.

Di civînê de mijara referandumê, hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê, problemên siyasî yên nêvxweyî yên herêma Kurdistanê, rewşa deverê û cîhanê têra xwe hatin analîz kirin. Amadebûyiyên civînê hizr û qenaetên xwe li ser pêwistiya referandumê û çareserkirina problemên nêvxweyî yên herêma Kurdistanê û rewşa subjektîv û objektîv ya herêma Kurdistanê danî ber çavan.

**Her di vê civînê de amadebûyiyan bi yekdengiyê li ser van nuqteyan li hev kir:**

**Ya yekê:** Roja bîstûpêncê îlona 2017-ê wekî roja pêkanîna referandumê li herêma Kurdistanê – Iraq û deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêmê hat diyar kirin.

**Ya didoyê:** Ji bo xatirê bidestxistina yekdengiya niştimanî her ji roja dawiyê ya civînê heta dema pêkanîna referandumê hemî alî dê xebatê ji bo aktîvkirina parlamentoyê û çareserkirina problemên siyasî bikin.

**Ya sêyê:** Terkîz li ser başkirina şertên jiyana xelkê û çavlêbûna li problemên aborî yên hemwelatiyên Kurdistanê, meaşwergiran, sinif û tebeqeyan û kesên kêmdahat hat kirin.

**Ya çarê:** Biryar ji bo avakirina Komîsyona Bilind ya Referandumê di bin serokatiya serokê herêma Kurdistanê de hat dan. Herwiha biryar hat dan ko heta 12-ê meha şeşê ya sala 2017-ê partiyên siyasî nûnerên xwe ji bo beşdarbûna di hinek komîteyên taybet yên dema referandumê û piştî referandumê de diyar bikin.

*Partiya Demokrat ya Kurdistanê*

*Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê*

*Yekgirtûya Îslamî ya Kurdistanê*

*Bizûtneweya Îslamî ya Kurdistanê*

*Hizba Şiyû'î ya Kurdistanê*

*Hizba Sosyalîst Demokrat ya Kurdistanê*

*Hizba Zehmetkêşên Kurdistanê*

*Partiya Kirêkar û Rencderên Kurdistanê*

*Partiya Çakzaziya Pêşkewtû ya Kurdistanê*

*Lîsta Hewlêrê ya Turkmenî*

*Bereya Turkmenî ya Iraqê*

*Partiya Geşepêdana Turkmenan*

*Lîsteya Ermeniyan li Parlamentoya Kurdistanê*

*Bizûtneweya Demokratîk ya Aşûrî*

*Encumena Gelê Kildan Siryan Aşûr"*

Roja piştî wê jî di heştê meha şeşê ya sala 2017-ê de min bi "fermana herêmî" ya reqem 106 biryara pêkanîna referandumê derxist ko di 25-ê îlona 2017-ê de çêbe û Komîsyona Bilind ya Hilbijartinan û Rapirsiyê ya herêma Kurdistanê jî raspart ji bo bicihkirina wê fermanê.

Di fermanê de tixûbê wê rapirsiya herêma Kurdistanê û deverên îdarî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê hatibûn diyar kirin û pirsa rapirsiyê jî bi vî rengî bû: "Gelo te divêt ko herêma Kurdistanê û deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêmê bibin dewleteka serbixwe?" Û bila bersiva pirsê jî bi "Belê" yan "Nexêr" ji aliyê hemwelatiyan ve bêt dan. Fermana herêmî komîsyon jî raspartibû da firsetê

ji bo hemwelatiyên Kurdistana Iraqê yên ko li derveyî welatî ne jî çêke da bikarin beşdarî referandumê bibin. Di fermana herêmî de ew jî hatibû diyar kirin ko bi hîç rengekî rê ji bo dezgehên hikûmî û hizbî nîne desttêwerdanê di karûbarên berpirs, serperişt û pêkhînerên prosesa rapirsiyê de bikin. Di fermanê de pêşgotinek û 13 nuqte hebûn. Di pêşgotinê de ew sebebên ko li pişt derxistina fermana herêmî ya ji bo pêkanîna referandumê hebûn jî hatibûn rave kirin.[36]

Piştî wê pêngavê ez di dehê hezîrana 2017-ê de li Selahedînê digel 19 hizb û aliyên siyasî yên li derveyî hikûmetê û Parlamentoya Kurdistanê civiyam û piştî ravekirina sebebên biryara pêkanîna referandumê amadebûyiyên civînê xwest ko rola wan di amadekariyên prosesa referandumê de hebe û terkîz li ser wê yekê kirin ko ew dê hemî şiyanên xwe yên siyasî û cemawerî bêxin bin xizmeta biserxistina referanduma miletê Kurdistanê de. Aliyên siyasî yên ko beşdarî wê civînê bûn ji van pêk dihat: Yekîtiya Neteweyî ya Demokrat ya Kurdistanê, Bizotneweya Demokrat ya Gelê Kurdistanê, Partiya Neteweyî ya Kurdistanê, Bizotneweya Aştîxwazên Kurdistanê, Partiya Pêşketinxwaz ya Demokrat ya Kurdistanê, Bizotneweya Rizgariyê ya Demokrat ya Kurdistanê, Hizba Bêt Nehreynê ya Demokrat, Hizba Îtihadî ya Demokrat ya Kildanî, Encûmena Neteweyî ya Kildan, Partiya Niştimanî ya Aşûrî, Yekîtiya Bêt Nehreyn ya Niştimanî, Mînbera Demokrat ya Kildanî, Bizotneweya Demokrat ya Turkmen, Bizotnewey Turkmen ya Bêlayen, Partiya Demokrat ya Turkmenên Kurdistanê, Komeleya Rewşenbîriyê ya Turkmenên li Kurdistanê, Partiya Gelê Turkmen, Komeleya Lîberalên Turkmen, Partiya Rizgariya Neteweyî ya Turkmenî.

36. Ji bo agahdariyên zêdetir li belgenameya hejmara 1-ê, Fermana Herêmî, hejmara 106-ê, li rûperê 201 binêre.

Herwiha ji bo avêtina pêngavên zêdetir pratîk û organîzekirina daxuyaniyan û karûbarê Konseya Bilind ya Referandumê û bicihkirina dîrektîvên Konseya Bilind ya Referandumê min di yazdehê îlona 2017-ê de fermana herêmî ya reqem çar îmza kir. Nêveroka wê fermanê biryareka şeşnuqte bû.[37] Di biryarê de serkreteriya Konseya Bilind ya Referandumê hat ava kirin. Erka sekreteriyê ji vê yekê pêkdihat: Organîzekirina civînên Konseya Bilind ya Referandumê, dokumantasyona wan civînan û herwiha amadekirina ajandaya civînan û lidûvçûna biryarên konseyê û agahdarkirina endamên konseya bilind ji netîceyên biryaran. Organîzekirina serdana heyetan, hemahengiya digel hikûmeta Iraqê, dewletên cîran û civata nêvdewletî jî erkeka dî ya wê sekreteriyê bû.

Pêkanîna komîteya taybet ya ragihandinê nuqteyeka dî ya wê biryarê bû. Li gor biryarê sê erk li ser milên wê komîteyê bûn. Amadekirina program û çalakiyên medyaya nêvxwe, ya erebî, ya cîhanî û aşînakirina hemwelatiyan di heqê prosesa referandumê de û herwiha teşwîqkirina hemwelatiyên Kurdistanê ji bo beşdarbûna di prosesa referandumê de.

Nuqteya sêyê ya wê biryarê diyarkirina berdevkê Konseya Bilind ya Referandumê bû û doktor Fuad Husên bû berdevkê Konseya Bilind ya Referandumê. Nuqteya çarê ya biryarê amadekirina reşnivîsa belgenameya taybet ya ji bo mafên pêkhatiyan di dewleta paşerojê ya Kurdistanê de bû. Doktor Xelîl Îbrahîm serpereştiya amadekirina reşnivîsa belgenameya taybet ya ji bo mafên pêkhatiyan di dewleta paşerojê ya Kurdistanê de dikir.[38]

---

37. Ji bo agahdariyên zêdetir li belgenameya hejmara 2-yê, Fermana Herêmî, hejmara 4-ê ya sala 2017-ê, li rûperê 214 binêre.

38. Ji bo agahdariyên zêdetir li ”Deklarasyona siyasî ji bo garantîkirina mafên pêkhatiyên etnîkî û dînî li Kurdistanê”, li rûperê 184 binêre.

Nuqteya pêncê ya wê biryarê amadekirina reşnivîsa daxuyaniya prensîpên esasî yên dewleta paşerojê ya Kurdistanê bû ko doktor Kawe Mehmûd ji bo amadekirina wê reşnivîsê hat spartin.[39] Û nuqteya şeşê ya wê biryarê jî pêkanîn û hinartina heyetekê bû da serdana aliyên ereb yên li Kerkûkê bike.

Di bin ronahiya civîna heştê tîrmeha 2017-ê de Konseya Bilind ya Referandumê û partiyên siyasî - ji bo avêtina gavên pratîk yên amadekariyan - heykelê xebata konseyê û komîteyên wê yên jêr diyar kir. Di heykelê Konseya Bilind ya Referandumê de erka min serokatîkirina Konseya Bilind ya Referandumê bû. Endamên wê konseya bilind Mela Bextiyar, doktor Roj Nûrî Şawês, Hişyar Zêbarî, Sedî Ehmed Pîre, doktor Fuad Husên, doktor Xelîl Îbrahîm û nûnerên pêkhatiya tirkmenan û nûnerên pêkhatiya xiristyanan bûn. Di hinek civînan de li gor rewşê û pêwistiyên siyasî, cihgirê serokê herêma Kurdistanê Kosret Resûl, serokwezîrê herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî, şêwirmendê Konseya Ewlekariyê Mesrûr Barzanî, endamên polîtburoya PDK, YNK, Yekgirtûya Îslamî, Hizba Şiyû'î, Hizba Sosyalîst Demokrat ya Kurdistanê, Hizba Zehmetkêşên Kurdistanê û hizbên dî beşdar dibûn.

Wisa jî hat biryar dan ko Konseya Bilind ya Referandumê sekreteriyek hebe ji bo lidûvçûna karûbarên rojane yên konseyê û karên hemahengiyê. Herwiha di civînên dî de biryara diyarkirina berdevkê referandumê jî hat dan. Ofîsa wê sekreteriyê li dîwana serokatiya herêma Kurdistanê li Hewlêrê bû.

Her di civîna heştê tîrmeha 2017-ê ya Konseya Bilind ya Referandumê û partiyên siyasî de me li ser wê yekê li hev kir

39. Ji bo agahdariyên zêdetir li "Deklarasyona prensîpên qanûna-esasî", li rûperê 189 binêre.

ko heft binkomîte bên ava kirin da îş û karan bi rê ve bibin. Ew binkomîte jî ev bûn:

- Komîteya qanûnê û komîsyona hilbijartinan,
- Komîteya diyalogê digel pêkhatiyên Kerkûkê û deşta Mûsilê,
- Komîteya hemahengî û karûbarê medyayê,
- Komîteya siyasî û aborî bo peydakirina piştgiriya nêvxweyî ya herêma Kurdistanê,
- Komîteya dîplomasî û têkiliyên digel Emerîkayê, Yekîtiya Ewropayê, Rûsyayê, Brîtanyayê, Çînê û welatên dî
- Komîteya dîplomasiyê ji bo têkiliyên digel welatên erebî, welatên îslamî, Îranê û Tirkiyeyê,
- Komîteya danûstandinê digel hikûmet û aliyên syasî yên Iraqê.



Photo: Adnan Muhammed



**Selahedîn, 7-ê hezîrana 2017-ê**

Ofîsa Serokatiya Herêma Kurdistanê: Endamên Konseya Bilind ya Referandumê ko biryara diyarkirina roja pêkanîna referandumê da.

# Reaksiyon û givaştinên nêvdewletî

Piştî herêma Kurdistanê bîstûpêncê îlonê wekî roja pêkanîna referandumê diyar kir me hewl da ko mesaja miletê Kurdistanê û hoyên dana wê biryarê ji bo aliyên iraqî û nûnerên welatan, civata nêvdewletî û cîranan rave bikin. Di meha hezîran, tîrmeh û tebaxê ya 2017-ê de digel hejmareka zêde ya ambasador û konsolosên welatan û mêvanên biyanî civînên min çêbûn. Herwiha di nêva meha tebaxê de jî heyeta danûstandinan ya herêma Kurdistanê serdana Bexdayê kir û digel serokwezîrî û aliyên şî'î û suniyan bi hûrahî behsa wan sebebên ko miletê Kurdistanê dehfî gavavêtina ber bi referandumê ve da kir.

Min bi xwe serdana Ewropayê û hinek welatên erebî kir. Li Parlamentoya Ewropayê roja 11-ê tîrmeha 2017-ê min axaftinek pêşkêş kir. Di destpêka axaftina xwe de min endamên wê heyeta ko digel min serdana Parlamentoya Ewropayê kiribûn dan nas kirin. Min îşaret bi wê yekê da ko vê heyetê mesaja xelkê Kurdistanê aniye û heyet ji van kesan pêktêt: Endamê polîtburoya PDK-ê Hişyar Zêbarî, endamê polîtburoya YNK-ê Necmedîn Kerîm, endamê serkirdayetiya Yekgirtûya Îslamî Mihemed Hawdiyanî, nûnerê tirkmenan Mihemed Sededîn, nûnerê xiristiyanan Wehîde Yaqu Hurmiz û nûnerê êzdiyan Şêx Şamo.

Paşê jî min ji nûnerên ewropî re got me divêt hon rê bidin me ko em di heqê du waran de qenaeta xwe bibêjin: Yek di heqê referandumê de ye ko biryar li ser hatiye dan û ya dî jî di heqê terorê de ye. Me wekî xelkê Kurdistanê bi hemî pêkhatiyên wê ve, eve ji sed salan zêdetir e ko me hemî hewlên xwe dan ji bo em bikarin şirîkatiyeka jidil ava bikin û vê dawiyê jî Iraqeka federal û demokratîk ava bikin, lê belê mixabin hîç netîceyek jê çênebû.

Di dirêjahiya axaftina xwe de min behsa tarîxa miletê Kurdistanê ya digel dewleta Iraqê kir û behsa viyana jidil ya kurdistaniyan kir û got:

”Heger em têkiliyên xwe yên digel Bexdayê dabeş bikin dikarin bibêjin ko du qunax in: Qunaxa yekê ji şerê yekê yê cîhanê heta 2003-yê ye. Qunaxa didoyê jî ji 2003-yê heta niho ye. Qunaxa yekê hikimdariya suniyan bû û li qunaxa didoyê de jî şî‘î hikimdariyê dikin. Dibe ko gelek caran wiha hatibe neqişandin heger referandum çêbe dê ewlekariya deverê tikbiçe, lê belê berovajiya wê rast e û xeter ew e heger referandum çênebe hingê dever dê rûbirûya problemên mezin, têkçûna ewlekariyê û bêîstiqrariyê bibe.

Di qanûna-esasî ya Iraqê de jî ko sala 2005-ê deng li ser hat dan û kurdan bi nisbeteka zêde beşdarî tê de kir, hatiye nivîsandin ko ”pêbendbûna bi qanûna-esasî ve yekîtiya axa Iraqê diparêze”. Mixabin min divêt ji we re bibêjim ko hîç pêbendiyek bi wê qanûna-esasî ve nehatiye kirin û qanûna-esasî jî rê dide me da em vê gavê bavêjin. Em şehnaziyê bi kultura miletê xwe dikin ko kultura hevduqebûlkirin û pêkvejiyanê ye. Dîn û pêkhatiyên cida bi hev re dijîn û ev biryara hemî xelkê Kurdistanê û temamê pêkhatiyên wê ye. Û ji bo paşerojê jî em dê pêbendê wê yekê bin ko mafên hemî pêkhatî û dînên li Kurdistanê parastî bin û ew bi beşdariya xwe razî bin. Me nevêt jî em wan derdeserî û zehmetiyên ko nesla me û nesla berî me dîtine ji bo neslên piştî

xwe bihêlin. Em hez dikin ko zarokên me bixwînin û azad bin û me jî wekî hemî miletên cîhanê ew maf heye û nizanin çima ji hemî cîhanê re rewa ye ko azad bin lê belê ji miletê me re rewa neyêt dîtin. Daxwaza me ji dostên me ew e ko piştgiriya me bikin, heger ji ber her sebebekî nekarin piştgiriya me bikin jî ya herî kêm bila li dijî me ranewestin û ji niho ve daxwazê li we dikin bila nûnerên we bên û wekî çavdêr beşdar bibin."

Di du–sê mehên piştî biryara pêkanîna referandumê de, di destpêkê de welatan û civata nêvdewletî û heta Bexdayê jî zêde pûte bi vê babetê neda û li hinek cihan dihat bihîstin ko herêma Kurdistanê di referandumê de ne cidî ye û tenê wekî karteka givaştinê li hemberî Bexdayê bi kar tîne. Helwêsta piraniya welatan wisa xwe diyar dikir problemeka wan digel wê çendê nîne ko xelkê Kurdistanê mafên xwe peyrew bike. Lê belê problema wan digel dema referandumê bû. Piraniya wan behsa hindê dikir ko em bi rêya diyalogê û danûstandinê problemên xwe digel Bexdayê çareser bikin. Di dawiyê de wexta hemî alî di heqê cidîbûna herêma Kurdistanê ya çêkirina referandumê de qane bûn, vêca givaştinên zêde êxistin ser herêma Kurdistanê û got çênabe referandum bêt kirin û dest ji referandumê berdin. Bêyî ko alternatîveka minasib pêşkêş bikin heta ko xelkê Kurdistanê li hemberî wê dest ji wî mafê xwe berde. Ev givaştin di demekê de dihatin kirin ko hêdî referandum ji dozeka siyasî borîbû û bûbû mijareka niştimanî û neteweyî û ketibû destê xelkê Kurdistanê de. Hêdî ev ne doza aliyekê siyasî yan kesekî bû heta bikarin bi hêsanî biryara wê yekê bidin ko referandum neyêt pêkanîn.

# Civîna Sihêlan

Giringtirîn hatinûçûna dîplomatîk ya meha îlona 2017-ê civîna Sihêlan[40] û telefon û nameya wezîrê derve yê Emerîkayê Rex Tillerson, têkiliya bi rêya telefonê ya wezîrê derve yê Brîtanyayê û têkiliya bi rêya telefonê ya serokê Fransayê serok Emmanuel Macron bû.

Ji bo beşdarbûna di kampanya û ahengên giştî yên xelkê yên ji bo piştgiriya referandumê de min serdana wîlayeta Dihokê kir. Li wêderê xeberek ji min re anîn ko heyeteka bilind ya hevpeymanan û Neteweyên Yekbûyî daxwaza hevdîtinê dikin. Ji bo wê ez roja pêncşemê, 13-ê îlona 2017-ê li baregehê qumandariya şerê li dijî Daişê yê li Sihêlan li rojavayê Dicleyê digel wê heyetê civiyam ko ji van kesan pêk dihat: Nûnerê taybet yê serokê Emerîkayê ji bo hevpeymaniya şerê li dijî Daişê Brett McGurk, nûnerê taybet yê sekreterê giştî yê Neteweyên Yekbûyî Yan Kubish, ambasadorê Emerîkayê yê li Iraqê Douglas Silliman û ambasadorê Brîtanyayê yê li Iraqê Frank Baker.

Cihê wê civînê li tenişta robarê Dicleyê û nêzîkî tixûbê Sûriyeyê bû. Di dema xwe de hêzên pêşmergeyên Kurdistanê ji wê nuqteyê qunaxa destpêkirina êrişbirinê bo ser terorîstên Daişê dabû destpê

40. Li ser qeraxê rojavayê Çemê Dicleyê ye û nêzîkî tixûbê Sûriyeyê û Pêşxabûrê ye.

kirin. Heyetê di wê civînê de got fêmkirina wan ji bo daxwaza miletê Kurdistanê heye lê belê ew baş dibînin ko Kurdistan bide ser rêya diyalogê û heger negihîjin netîceyekê ew dê nameyekê ji wezîrê derve yê Emerîkayê bînin ko tê de fêmkirina xwe bo pêwistiya çêkirina referandumê îlan bike. Hedefa esasî ya wê heyetê ji vê pêşniyarê paşdedana referandumê bû. Wekî bersiv bo heyeta nêvdewletî min got: “Biryara referandumê ne biryara şexsekî ye, hemî partiyên Kurdistanê di derxistina wê biryarê de beşdar bûn. Ez bi tenê nikarim biryarê bidim.” Di heman demê de min ji wan re got: “Em ti deman dergehê diyalogê yê digel Bexdayê danaxin lê belê ew in ko me wekî şirîkên jidil nabînin û tenê wekî dûvelang li miletê Kurdistanê temaşa dikin. Em jî piştî van zehmetiyan dûvelangîtiyê qebûl nakin.”Min bi zelalî ji wan re got:

> “*Hedefa me ew e ko bi awayekê aştiyane em bibin du cîranên baş û referandum jî rêyek e ji bo gehiştina wê hedefê. Heger civata nêvdewletî û Emerîkayê rêyeka dî heye ji bo ko em bigehîn wê hedefê hingê pêwistî bi pêkanîna referandumê nake. Lê belê di pêşniyara we de pêbendbûn û garantî nîne. Her dema we alternatîvek hebe ko heman hedefa referandumê pêkbîne hingê pêwistiya me bi referandumê namîne.*”

Mijareka ko rojên berî referandumê û piştî referandumê di medyayê û merkezên siyasî de zêde berbehs bû nameya wezîrê derve yê Emerîkayê Rex Tillerson ya ji bo min bû ko tê de li hemberî pêkneanîna referandumê hinek fikr û pêşniyar danîbûn ber destan. Di rastiyê de name ne nameyeka resmî bû, belko reşnivîsa nameyekê bû ko nûnerê taybet yê serokê Emerîkayê ji bo hevpeymaniya şerê li dijî Daişê Brett McGurk û ambasadorê Emerîkayê yê li Iraqê Douglas Silliman û hinek kesên dî amade

kiribû. Ne diyar bû jî ka gelo name dê ji aliyê wezîrî ve bêt erê kirin û îmza kirin yan ne.

Dîplomatên emerîkî wisa hesibandibûn ko heger biryar li ser paşxistin yan hilweşandina referandumê bêt dan paşê wezîrê derve yê Emerîkayê dê îmza bike. Ji aliyê me ve name di warê dariştin û nêverokê ve baş bû lê belê garantiya pêwist tê de nebû heta ko em bikarin pişta xwe bispêrinê yan baweriyê pêbînin û baweriyê bidin miletê xwe da dest ji mafekê rewa û xwezayî yê xwe berdin. Alternatîva ko di nameya Tillerson de hatibû pêşniyar kirin li ser esasê danûstandina digel Iraqê hatibû ava kirin û helwêsta Emerîkayê jî dê piştgiriya wan danûstandinan bûya. Me tecribeyeka dûrûdirêj ya danûstandinan û lihevkirinan digel iraqiyan hebû ko paşê bi gelek hêsanî dihatin piştguh kirin. Digel wê hemiyê jî biryar ew bû nameya Tillerson û pêşniyar û alternatîvên dî ji aliyê Konseya Bilind ya Referandumê ve bêt kêş-û-vekêşandin. Wan ev givaştin û pêşniyar hemî çendrojekê berî referandumê danîn ber destan û hêdî referandum jî di destê hinek kes û aliyan de nemabû û ketibû destê xelkê Kurdistanê de.

Nameya Tillerson dikarî bibe bingehek ji bo garantiyeka wisa hebe ko xelkê Kurdistanê jê razî bin û dest ji referandumê berdin. Lewra li wî cihê ko behsa wê yekê dikir referandum du salan bêt paşde dan û heger danûstandinên digel Iraqê neçûn serî wê demê bila herêma Kurdistanê referanduma xwe bike û Emerîka jî dê "rêzê" li encamên wê bigire min daxwaz ji hikûmeta Emerîkayê kir ko li şona bêjeya "rêzgirtinê" di nameyê de bêjeya "piştgiriyê" bêt nivîsandin. Emerîkiyan xwe ji wê daxwazê da alî û got ew nikarin bêjeya "piştgiriyê" bi kar bînin. Min jî ji wan re got: "Heger hon nekarin yek bêjeyê biguhorin vêca çawa li wê hêviyê dimînin ko em bikarin xelkê Kurdistanê qane bikin da referandumê nekin?"

Ew hemî givaştin di eynî wextê de bûn ko bêhna şovenîzmê ketibû nêv êriş û çavsoriyên dewletên cîran û aliyên iraqî. Mesele gehişt wê radeyê ko şerê îradeya xelkê Kurdistanê bikin. Hingê pirsiyareka esasî ev bû: "Aya em miletekê xudanê îradeya xwe ne, yan jî divêt kesên dî biryarê li ser çarenivîsa me bidin?" Ev zilmeka gelek mezin bû ko li miletê Kurdistanê dihat kirin. Heger ji aliyê balansa nêvdewletî ve rê neyêt dan miletê Kurdistanê biryarê li ser mafê çarenivîsa xwe bide vêca ma rewa ye ko mafê gotinê jî jê bêt standin û heta rê neyêt dan ko miletê Kurdistanê bibêje ka çi divêt jî? Di rojên dawiyê de kar gehandin wê astê ko şerê îradeya miletê Kurdistanê bikin û guh nedin rewatiya viyana miletê Kurdistanê. Dema wisa lêhat me biryar da referandum di dema xwe ya diyarkirî de bêt kirin û her çi dibe bila bibe lê belê em nahêlin ko îradeya miletê me bişkêt.

Ji aliyekê dî ve girêdana referandumê bi biserketin yan dorandina kesekî ve kêmdîtina îradeya xelkê Kurdistanê bû. Li gor qenaeta emerîkiyan heger referandum bêt kirin dibe sebebê lawazbûna Heyder Ebadî. Heger referandum neyêt kirin Ebadî dê xurt bibe û Îranê ji Iraqê derbêxe. Yek du rojan berî referandumê ji bo hilweşandina pêkanîna referandumê telefon, têkilî û givaştinên ji hemî aliyan ve (emerîkî û aliyên herêmî) yekcar zêde bû. Ya bi me xerîb ew bû ko gotinên hemiyan wekî yek bûn. Di dijayetîkirina mafê rewa yê miletê Kurdistanê de Emerîka, Brîtanya, Îran, Tirkiye û Iraq hemawaz bûn û di givaştina dîplomatîk û siyasî de hemahengiya wan digel hevdu hebû. Gotinên wan gelek dişibihiyan hevdu. Hemiyan daxwaza paşdegavavêtinê dikir lê belê ew paşdegavavêtin diviya tenê li ser hesabê mafên miletê Kurdistanê be. Ji aliyekê dî ve jî heger me ji pêkanîna referandumê paşde gav biavêta hingê neyarên nêvxweyî yên referandumê dê dest bi gotinên dî bikirina û tuhmetên dî banîna ser me û bigotina "firset ji bo [***serxwebûna***]

xelkê Kurdistanê çêbû lê belê wan ew derfet ji destê xwe da û paşde gav avêt”.

Di herdu rojên berî dengdanê de lêxebitîn ko em referandumê li Kerkûkê nekin. Te rastî bivêt berî heftê hezîrana 2017-ê di nêv serkirdayetiya siyasî ya Kurdistanê de fikrek hebû ko referandum li Kerkûkê û deverên dî yên madeya 140-ê neyêt kirin da bi wê rêyê hîç bihaneyek nekeve destê nehezên miletê Kurdistanê û bila Kerkûk û deverên cihê nakokiyê ji bo danûstandinê bên hiştin. Dema ko Kerkûk danîn ser nexşeya referandumê bêguman ew li ser daxwaz û îsrara wî aliyî bû ko paşê bû sebebê bûyera şazdehê oktoberê. Ewên ko Kerkûk radest kirin her ew bûn ko di heftê hezîrana 2017-ê de got pêwist e referandum li Kerkûkê jî bêt kirin.

# Miletî dengê xwe da

Di proseseka dûrûdirêj de ko nêzîkî sed salan dewam kir miletê Kurdistanê di nêv dewleta Iraqê de rûbirûyê zehmetî, mişextbûn û jenosîdê bû. Kurdan bi şertê şirîkbûnê beşdarî di damezirandina dewleta Iraqê de kir lê belê hemî rê û rêbaz û biryarên hikûmeteka Iraqê li dûv yên hikûmeteka dî ji bo binecihkirina hikmê merkezî û marjînalîzekirina kurdan û nedîtîkirina daxwazên rewa yên kurdan bûn. Zêdebarî wê jî desthilatdarên Iraqê rêya asîmîlasyon, jenosîd û paqijkirina etnîkî da ber xwe. Piştî 2003-yê jî herçend kurd bi awayekê aktîv û bi niyeteka pak bûn beşdarên esasî di jinûveavakirina Iraqa federal û demokratîk de û qanûna-esasî bû garantora sîstema nû cardî jî ew hewla ji bo jiyaneka xwezayî, aştiyane û demokratîk digel Iraqê bi ser neket.

Dema wê hatibû ko hemwelatî û niştecihên herêma Kurdistanê bi xwe di atmosfereka azad de û bi proseseka tam aştiyane û demokratîk fikra xwe di heqê man yan nemana digel Iraqê de danin ber çavan. Dema wê hatibû ko em pirsiyarê ji

xelkê Kurdistanê bikin ka aya dewleteka serbixwe divêt yan di wê tecribeya ko bi dirêjahiya sed salan her binketî bû de berdewam bikin. Di heftê hezîrana 2017-ê de ji dema biryara pêkanîna referandumê derket û heta bîstûpêncê îlona 2017-ê herêma Kurdistanê mijûla amadekarî û organîzekirina prosesê bû. Vêca dema wê bû ko di rojeka tarîxî ya biriqdar de edalet bêt peyrew kirin û xelk bi xwe gotina xwe bibêje û dengê xwe bigehîne cîhanê. Meşrûiyeta wî dengî di ser hemî meşrûiyetan, dengê şexsan û aliyên hizbî re ye. Ev ne tawan bû, ne karekê li dijî qanûnan bû, ne şerfirotin, ne dagîrkarî û ne teror bû. Ev - bi awayekê aştiyane - peyrewkirina mafekê rewa û xwezayî yê hemwelatiyên Kurdistanê bû.

Û vêca ew roja mezin hat û li benbanga 25-ê îlona 2017-ê hemwelatiyên herêma Kurdistanê û deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê, cara yekê di tarîxê de bi awayekê azad û aştiyane; û dûr ji şidetê, xweferzkirinê û bêîstiqrariyê çûn ser sindoqên dengdanê û dengê xwe da. Roja referandumê zêdetir wekî cejnekê bû. Cejneka ko hemî hemwelatiyên Kurdistanê cidahî û nakokiyên xwe dan aliyekî û beşdarî di proseseka rewa û tarîxî de kir. Roja referandumê roja miletî, roja hemwelatiyan û roja her ferdekê kurdistanî bû. Di dengdanê de hêdî ti kesê dengê xwe nedida kesekî yan aliyekî. Hemiyan dengê xwe dida xwe û dida welatê xwe. Dengên xwe didan êkdu, didan neslên paşerojê û didan çarenivîsa xwe. Ev bi xwe avabûna ruhekê niştimanî û hevdengiyê bû di nêv hemwelatiyên Kurdistanê de. Ev xwestina mafî û peyrewkirina mafî û îradeyê bû, û li gor qenaeta min di jiyana siyasî ya miletan de hîç tiştek ji wê pîroztir nîne ko mafê dengdanê yê miletî

bêt peyrew kirin û îradeya miletî bi ser keve. Lewra dikarim bibîjim ko roja referandumê rojeka pîroz bû.

Armanca me ji pêkanîna referandumê ew bû ko Iraq û welatên deverê û cîhan viyana jidil ya miletê Kurdistanê bizanin. Ti kesê biryara wê yekê nedabû roja piştî referandumê dewleteka serbixwe îlan bike, belko ji bo wê çendê bû ko di destê serkirdayetiya siyasî ya herêma Kurdistanê de izin û telîmata miletî hebe da ji bo qunaxa paşerojê digel hikûmeta Iraqê diyalogê û danûstandineka vekirî bike. Me bi aşkerayî ji Bexdayê, Emerîkayê û welatên dî re behsa vê meseleyê kiribû ko referandum bo hindê ye da rê bêt dan xelkê Kurdistanê gotina xwe bibêje.

Du rojan piştî pêkanîna referandumê Komîsyona Bilind ya Hilbijartinan û Rapirsiyê ya herêma Kurdistanê netîceyên destpêkê yên referandumê îlan kir û ji % 92.73-yê dengdêran dengê ”Belê” dabû. Di rastiyê de ev biserketina îradeya miletî bû ji bo gehiştina serxwebûnê. Piraniya herî zêde ya xelkê Kurdistanê nedixwest hêdî tecribeyên binketî, zehmetî û zilm berdewam bike û daxwaza dewleteka serbixwe dikir. Ev biserketina prosesa referandumê bû. Referandum dê hingê binketî bûya heger miletê Kurdistanê bi ”Nexêr” bersiva pirsiyarê dabûya.

Referandum ji bo Kerkûkê û deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê jî biserketin û qezenceka giring bû. Qîmetê pêkanîna referandumê û biserketina wê li wan deveran ew bû ko digel xebata dehsalan ya erebkirin, tirsandin, tepeserkirin û binpêkirinên qanûna-esasî ya piştî 2005-ê, îradeya niştecihên wê deverê bi hemî pêkhatiyan ve,

bi dengekê zelal ya ko heq û rast bû gehand cîhanê û got ew dixwazin digel dewleta serbixwe ya Kurdistanê bijîn.

Li wan deveran pêkhatiyên neteweyî û dînî; xuşk û brayên ereb, *tirkmen* û *xiristiyan* dengê xwe da wê yekê ko digel dewleta Kurdistanê bijîn. Îradeya jidil ya pêkhatiyan di roja referandumê de derket meydanê. Ew dixwazin digel wê dewletê bijîn ya ko bawerî bi pêkvejiyana dînî û neteweyî heye û li dûv şovenîzma neteweyî û mezhebî nagere.



Photo: Adnan Muhammed



**Hewlêr: 22-yê îlona 2017-ê**
Stadyuma fotbolê ya şehîd Franso Herîrî: Karnevala cemawerî ya bajarê Hewlêrê ji bo piştgiriya referandumê.

# Reaksiyona hikûmeta Iraqê

Li hemberî mesaja aştîxwaz ya miletê Kurdistanê, mixabin me hinek reaksiyonên gelek nelirêde ji serokwezîr û karbidestên iraqî dîtin ko bêhna şovenîzm û înkarkirineka aşkera jê dihat. Van reaksiyonan heqîqet û naxê hemî wan kesan derxist meydanê ko ji bingeh de li dijî mafên miletê Kurdistanê bûn û tenê ji mantiqa tehdîdê û xweferzkirinê fêm dikir.

Du rojan piştî referandumê Parlamentoya Iraqê bêyî amadebûna nûnerên Kurdistanê di yek civînê de sêzde biryarên neqanûnî û ne li gor qanûna-esasî li dijî herêma Kurdistanê derxist ko armanc jê cezakirina civata xelkê Kurdistanê bû. Van biryaran destê Heyder Ebadî xurt kir da rojane bi zimanê tehdîdê û heqaretê baxive û rê jê re bêt xweş kirin da hêzê û sîlehan li dijî herêma Kurdistanê û deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê bi kar bîne. Di yek ji wan biryaran de qumandarê hêzên çekdar hatibû pêbend kirin da hêzan li deverên minaqeşebar û Kerkûkê belav bike. Ev bi aşkerayî pêxistina lempeya kesk bû ji bo şerî û ji bo bikaranîna hêza çekdar di safîkirina nakokiyên siyasî de. Ev bi xwe jî binpêkirineka aşkera ya qanûna-esasî ya Iraqê bû ko tê de bikaranîna hêza çekdar ji bo tepeserkirina miletî hatiye qedexe kirin. Di biryareka dî ya

Parlamentoya Iraqê ya piştî referandumê de, prensîpa cidakirina desthilatan têt binpê kirin û parlamento cihê ”desthilata dadgêriyê” (sulteya qezayî) digire dema ko daxwaza cezakirina berpirsên herêma Kurdistanê dike û pêkanîna referandumî wekî tawan dihesibîne. Parlamentoya Iraqê her wê rojê biryara girtina tixûban, ablokekirin û birsîkirina xelkê herêma Kurdistanê da.[41]

Ev cara yekê bû ko Parlamentoya Iraqê di yek rûniştinê de hewqes biryaran derxe û ew jî bêyî liberçavgirtina prensîpa lihevkirinê (tewafiqê) û bêyî amadebûna nûnerên Kurdistanê li parlamentoyê. Ji ber ko biryar li dijî herêma Kurdistanê bûn û bêhna şovenîzmê jê difûriya bi lezûbez û bi yekdengiya amadebûyiyan hatin erê kirin. Berê jî, di 12-ê meha nehê ya sala 2017-ê de bêyî liberçavgirtina prensîpa lihevkirinê Parlamentoya Iraqê hinek biryarên dî li dijî referandumê erê kiribûn.

Di rastiyê de piştî gelek dehsalan jî eqliyet û hizra şovenîst ya li Bexdayê nehatibû guhortin. Min baş dizanî ko li Bexdayê tenê serûçav hatine guhortin, yan ne eqliyeta şovenîst li Bexdayê hertim serdest e û baweriya wan bi şirîkatiyê, dengê rewa û dadperweriyê nîne. Ji biryarên Parlamentoya Iraqê û kiryarên dilreq û ne li gor qanûna-esasî yên serokwezîrê wê demê yê Iraqê hat fêm kirin ka pêbawernebûna me bi soz û garantiyên vala yên Emerîkayê û hikûmeta Iraqê yên berî referandumê çiqasê rast bû. Zêdegaviyên Heyder Ebadî gehişte astekê ko biryara daxistina balafirxaneyên herêma Kurdistanê da û di gotinên xwe de wekî serdema Be‘sê li şona bêjeya ”herêma Kurdistanê” bêjeya ”bakurê Iraqê” bi kar dianî. Ebadî xwe radikêşa wê yekê ko goya dê hukmê qanûnê li ser herêma Kurdistanê ferz bike herçend wî nedikarî qanûnê li ser ”devera kesk” ya li Bexdayê jî ferz bike.

---

41- Ji bo agahdariyên zêdetir li ”Bingehên qanûnî û yên qanûna-esasî ji bo referanduma herêma Kurdistanê – Iraq”, li rûperê 114 binêre.

Ew hemî tedbîrên ne li gor qanûna-esasî bi bihaneya ferzkirina serweriyê bûn. Ev jî di rewşeka wisa de hat kirin ko tedbîr bi xwe binpêkirina serweriyê bûn; ji ber di halê de bi hemahengiya digel welatên cîran tehdîda bikaranîna hêzê hebû. Hikûmeta Iraqê bi arîkariya ”biyaniyan” xelkê Kurdistanê xist bin tehdîdê û ablokayê de.

Reaksiyona bi vî rengî cihê şermizariyê bû. Vê jî nîşan da ko karbidestên iraqî ders ji tarîxê wernegirtine û hîç demekî jî niyeta wan ya çareserkirina probleman nebû. Rewşeka wisa afirandibûn ko di dijayetîkirina mafên miletê Kurdistanê de hemî yek û hemfikir bûn û dezgehên qanûndanînê (parlamento), dadgêriyê (mehkeme), emnî û aborî yên dewletê jî ji bo wê dijayetîkirinê dihatin bi kar anîn.

Berê bi qasî sed salan rejîmên Iraqê xwe tecribe kir ko îradeya miletê Kurdistanê bi sîlehan bişkênin lê belê ew bi xwe tûşî şikestinê û roxiyanê bûn. Li hemberî wan reaksiyonên hikûmeta Iraqê helwêsta me redkirina zimanê tehdîdê û sîlehan bû û li cem herêma Kurdistanê ew biryar hemî neqanûnî û li dijî qanûna-esasî, li dijî serweriyê, li dijî pêkvejiyanê û li dijî aştiyê bûn. Belê, bersiva mesaja aştîxwaz ya miletê Kurdistanê şovenîzm û sîleh bû. Ev mijareka wisa ye ko di dirêjahiya hemî temenê dewleta Iraqê de her hebû û di hemî hevdîtinên min yên dîplomatîk de, di hevpeyvînên min û di daxuyaniyên min yên di salên berî referandumê de min îşaret pê kiribû.

Ew tedbîr û şideta ko li hemberî herêma Kurdistanê dihat kirin ji aliyê beşeka zêde ya wan şî‘iyan ve bû ko berê em bi hev re di heman çeperê de bûn û bi arîkariya kurdan çûn Bexdayê û bûn hikimdar. Piştî sala 2003-yê aliyên şî‘î memnûn bûn ko Iraq bibe dewleteka federal û li Iraqê cihê wan hebe. Wê demê sunî li dijî federaliyê bûn û dewleteka merkezî ya wekî serdema berê dixwest. Çi dema ko aliyên şî‘î destê xwe li desthilatê qayîm

kir ketin dûv wê siyaseta şaş ko di serdema berê de li Iraqê dihat tetbîq kirin. Lê belê ferqa wan ew bû vê carê mezhebçîtî jî dikirin û hez dikirin ko piştî Daişê destê xwe danin ser hemî deverê. Di vê meseleyê de bêyî liberçavgirtina serweriya Iraqê, qanûna-esasî û nêveroka nû ya dewleta Iraqê ew bûn beşek ji ajandayeka herêmî ya mezhebî û giştgir li deverê. Qutkirina butçeyê û ablokadanîna li ser Kurdistanê di dema şerê Daişê de û cezakirina xelkê Kurdistanê û tedbîrên ne li gor qanûna-esasî yên piştî referandumê jî her li gor wê ajandayê bi rê ve diçûn. Me ji mêj ve hest bi wê planê kiribû ko piştî şerê Daişê programa wê çendê heye kemberê li dora herêma Kurdistanê bişidînin û êrişî me bikin.

Daxwaza hikûmeta Iraqê hilweşandina (betalkirina) netîceyên referandumê bû. Ev daxwaz zêdetir ji bo tehdîdkirin û aloztirkirina rewşê bû. Yan ne, wan bi xwe jî baş dizanî ko hilweşandina netîceyên referandumê ne di qudreta ti kes, alî yan dezgehekê de ye. Ma dê çawa dengê sê milyon mirovan bêt betal kirin?

Pêkanîna referandumê ne karekê neqanûnî bû herwekî ko neyar û dijminên referandumê pênase dikir. Belko derbirîna viyan û qenaeta xelkê Kurdistanê bû û girêdayî çarenivîsa wan bû. Li hemî cîhanê jî derbirîna hest û qenaeta xelkê rewa ye û rêpêdayî ye. Ji aliyekê dî ve miletê Kurdistanê tenê dengê xwe dabû û ji aliyê herêma Kurdistanê ve serxwebûn nehatibû îlan kirin heta hikûmeta Iraqê û kesên dî bi vî rengî bi hêzên çekdar êrişî Kurdistanê bikin. Hê jî herêma Kurdistanê bi resmî beşek bû ji Iraqê û bikaranîna hêzê kiryareka ne li gor qanûna-esasî û neqanûnî bû. Lê belê ji bêkesiya kurdan û ji ber nedîtîhesibandina mafên rewa yên miletan (ko di carnameya Neteweyên Yekbûyî de jî heye), welatên berjewendîxwaz terefgiriya hikûmeta Iraqê kir û rê dayê ko bi awayekê neqanûnî hêzê li dijî Kurdistanê bêxe hereketê.

# Şazdehê oktoberê

Piştî operasyona azadkirina Mûsilê ji destê Daişê û berî ko miletê Kurdistanê biryara pêkanîna referandumê bide, hinek îşaretên negatîv ji rabûnûrûniştin û amadekariyên hikûmeta Iraqê xuya dibûn ko belgeya wê çendê bûn piştî xelasbûna şerê Daişê niyeteka wan ya xirab li hemberî deverên minaqeşebar û herêma Kurdistanê heye. Binpêkirina peymana operasyona azadkirina bajarê Mûsilê ji aliyê Iraqê ve û paşdedana operasyona azadkirina Hewîceyê û herwiha paşê jî valakirina Hewîceyê ji aliyê Daişê ve bêyî şerî ko merkezeka xurt ya Daişê bû jî, û valakirina Telehferê ji aliyê Daişê ve bêyî şerî cihê pirsiyareka mezin bûn. Vê hemiyê nîşan dida ko rengekê hemahengiyê di nêvbera hêzên herêmî de heye da deverên minaqeşebar vegirin û zextê bînin ser Kurdistanê. Hatina hêzên Heşdê bo Telehferê û deşta Mûsilê ko li dijî peymanan bû û berdewamkirina hikûmeta Iraqê di qutkirina butçeyê de û herwiha daxuyaniyên şovenîst û tehdîdên rêberên eskerî yên Heşdê, hemî îşaretên wê çendê bûn ko li ber destê Iraqê bernameyeka dî heye. Ev di demekê de dihat kirin ko di şerê Daişê de herêma Kurdistanê zêdetirîn hevkarî û hemahengî digel Iraqê hebû. Plana êrişkirina herêma Kurdistanê li halê bû. Ew plan her dê bihata bi cih kirin heger referandum

nehata kirin jî. Referandum tenê bihaneyek bû ji bo hindê da ew plan bi awayekê lezûbez û bi hevkariya hêzeka nêvxweyî ya kurdan û bi desttêwerdana aşkera ya hêzên herêmî û biyanî bêt pêkanîn.

Piştî biserketina referandumê behsa hindê dihat kirin ko beşeka YNK-ê mijûlî rengekê miamele û bazarên nihênî ye digel Heşdê da midaxeleyî Kerkûkê bikin. Di 12-ê oktobera 2017-ê de wî baskê YNK-ê beşek ji hêzên xwe bêyî hemahengiya digel Wezareta pêşmergeyan paşde kişand û hêcet ew bû ko piştî şerê Daişê pêwist nake hêz li wê deverê bimînin. Di heman rojê de jî hêzeka girêdayî Heşda Şe‘bî ji mîhwera başûr û rojavayê Kerkûkê hewla pêşdehatinê kiribû lê belê ji aliyê hêzên pêşmergeyan ve rê li wan hat girtin. Di roja 13-ê meha dehê ya 2017-ê de jî hêzên piştevaniyê–2 bi fermana berpirsekî eskerî yê YNK-ê cihê xwe li gundê stratejîk Ebadat vala kir û rêya serekî ya Xurmato–Kerkûkê ket destê Heşda Şe‘bî de û qutbûn di nêvbera wan pêşmergeyan de çêbû ko ji Xurmato heta Daqûqê ketibûn çeperan de. Ji 12 û 13-ê oktoberê heta 15-ê oktoberê li dirêjahiya cepheyî di wê mîhwerê de devera Seb‘enîsan, *Daqûq*, *Duzxurmato* û *Miryem Beg* hemî bi peymaneka nihênî radestê îraniyan û Heşda Şe‘bî hatibûn kirin.

Di 15-ê oktobera 2017-ê de li mala xwedêjêrazî Mam Celal li havîngeha Dukanê ez beşdarî civîna polîtburoya YNK-ê û PDK-ê bûm. Di civînê de braderên YNK-ê behsa pêşniyarekê kir ko ji bo hemahengiya di nêvbera hersê aliyan de, hêzeka pêşmergeyan û hêzeka emerîkayî û hêzeka iraqî li serbazgeha K1 ya li Kerkûkê bi cih bibin da şer ji Kerkûkê dûr bikeve û lîwaya heresên serokkomarî jî bajarê Kerkûkê biparêzin. Gelek zelal bû ko ev ne rast e çimko meseleya hemahengiyê tişteka normal bû; berê jî li gelek cihan bingehên hemahengiyê di nêvbera hêzên emerîkiyan û hêzên pêşmergeyan û hêzên iraqî de hebûn. Ji bilî

vê jî gelek zehmet bû em rê bidin lîwaya heresên serokkomarî bên nêv Kerkûkê.

Her ji destpêka civîna Dukanê diyar bû ko atmosfereka nexwezayî li cem braderên YNK-ê heye. Dema ko serokwezîrê herêma Kurdistanê yê wê demê Nêçîrvan Barzanî ji wan pirsî gelo lihevkirinek di nêvbera we de heye? Di bersivê de çi ewên ko peyman kiribûn û çi ewên ko haya wan ji peymanê nebû, hemiyan got haya wan ji peymanekê nîne. Herçend paşê derket ko hinek kesên di nêv YNK-ê de bêyî agahdarkirina dezgehan û Konseya Bilind ya Siyasî û serkirdayetiya Kurdistanê peyman çêkirine. Heta beşeka polîtburoya YNK-ê jî hay ji wê peymanê nebû ko bi rêya wê Kerkûk radestî hêzên Heşda Şe'bî, Îranê û Iraqê kirin. Di dawiya civîna Dukanê de biryar hat dan ko serokkomar her di cih de vegere Bexdayê lê belê li Bexdayê kes nebû ko pê re rûne. Di dawiya civîna Dukanê de daxuyaniyeka hevbeş ya herdu hizban derket. Teksta wê bi vî rengî bû:

**"Daxuyaniya civîna Dukanê**

Di 15-ê meha dehê 2017-ê de li Dukanê, li baregehê havîngeha serok Mam Celal civîna hevbeş ya polîtburoya YNK-ê û PDK-ê çêbû. Rewşa Iraqê, deverê û Kurdistanê hat analîz kirin. Netîce:

**Ya yekê:** Giringî bi yekrêziya miletê me û ya hêzên siyasî yên Kurdistanê hat dan, ko di vê qunaxê de mijûlî bicihkirina erkên hevbeş in.

**Ya didoyê:** Civîn israra xwe li ser çareserkirina hemî probleman bi rêya diyalogeka bêşert û berpirsane ya avaker di nêvbera Hewlêrê û Bexdayê de îlan dike.

**Ya sêyê:** Hêzên kurdistanî, niho jî amade ne ko danûstandineka bêşert û vekirî û avaker li ser bingehê berjewendiyên Bexdayê û Hewlêrê û prensîpên qanûna-esasî pêkbînin.

**Ya çarê:** Civîn, di berjewendiya hemî aliyan de dibîne ko aliyên siyasî yên esasî yên Iraqê û Kurdistanê beşdarî danûstandinên di nêvbera herêma Kurdistanê û Bexdayê de bibin. Herwiha aliyên nêvdewletî jî çavdêriya prosesê bikin.

**Ya pêncê:** Di heqê pirsa eskerî û ewlekariyê de, li deverên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê yan her cihekê dî hemî rengên desttêwerdaneka eskerî yan hereketkirina hêzê û êrişkirin û tirsandin ji bilî ko xeterek in li ser têkiliyên di nêvbera herêma Kurdistanê û Bexdayê de, tehdîdek in jî li ser her hewleka jidil bo çareserkirina aştiyane ya probleman. Herwiha yekser binpêkirina qanûn û urfê ye û berê biryar li ser hatiye dan ko hêzên çekdar yên Iraqê ji bo safîkirina problemên siyasî yên nêvxweyî neyên bi kar anîn.

Di dawiyê de jî, em herdu alî silavan bo pêşmergeyên qehreman dinêrin ko di şerê têkbirina Daişê de pênaseya ’parastina azadiya cîhanê’ wergirt û niho jî li çeperên pêşiyê ne ji bo bidestxistina hedefên me.”

Her di heman roja civîna Dukanê de, roja 15-ê oktobera 2017-ê di dema civînê de qralê Urdunê, Qral Ebdullah bi telefonê têkilî bi min re danî û got ”tu û Heyder Ebadî werin bibin mêvanên min da em behsa giriftan bikin û bi hev re bigehîn hevdufêmkirinekê”. Eyad Ellawî jî agahdarê wê daxwaza qralê Urdunê bû. Min ji Qral Ebdullahî re got ”ez amade me bêm lê belê balafirxane girtine”. Qral Ebdullah got “ez bi xwe dê balafirekê bo te rêkim”. Ebadî jî wekî bersiv bo wê înisiyatîva qralê Urdunê gotibû “ez bi şertekî amadeyî wê civînê dibim heger berî hingê Mesûd Barzanî derkeve televizyonê û betalkirina referandumê îlan bike”. Ew şertê Ebadî yê ji bo civînê gelek nelirêde bû û wî bi xwe jî pir baş dizanî ti kesekî ew maf û şiyan nîne ko dengê bi milyonan hemwelatiyan betal bike. Lê belê ew daxwaza wî ya nedicihde

nîşana biserxweveçûnê bû û rengê eqliyeta wî derdixist meydanê.

Hêj gelek berî referandumê min ew heqîqet dizanî ko heger ji hêzên iraqî re firset çêbe dê êrişî deverên minaqeşebar û herêma Kurdistanê bikin. Min ev mesele gelek caran digel emerîkayî, ewropayî û aliyên kurdistanî jî axaftiye. Referandum jî rêyek bû ji bo wê çendê ko çareyek bêt dîtin û rê li ber agirpêxistina şerî bêt girtin. Lê belê herwekî me dît roja piştî civîna Dukanê, di şazdehê oktobera 2017-ê de bi hevkariyeka ”revdeyên herêmî” û bi rêxweşkirina ”nepakên” nêvxweyî û li ber çavên Emerîkayê, bi sîleh û tankên Emerîkayê hêzên Heşda Şe‘bî bi hevkariya hejmareka zêde ya pasdarên Îranê di bin qumandariya pasdarekê bi navê Îqbalpur de, êrişî Kerkûkê û deverên minaqeşebar kirin. Me qet pêşbîniya wê nedikir ko bi çavdêriya Emerîkayê û bi sîlehên Emerîkayê êrişî pêşmergeyan bêt kirin. Me ew jî pêşbînî nekiribû ko hêzeka nêvxweyî tecawiza îrade û dengê miletê xwe û dezgehên herêma Kurdistanê bike û digel serkirdeyên Heşdê tifaqê bike da axa Kurdistanê bêt dagîr kirin **(nexşeyên reqem 7 û 8)**.

Vê ”nepakiyê” ji aliyê psîkolojîk ve gurzeka mezin li pêşmergeyan da. Hemahengî û têkiliyên eskerî yên pêşmergeyan li cepheyên şerî ji hev qut bûn. Li hinek cihan pêşmergeyan bêyî ferman xwe paşde kişandibûn. Em hemî baş dizanin ka ”nepakîkirin” li cepheyên şerî çi ji ruhê şerkirinê yê cengaweran dike. Pêşmergeyên ko efsaneya Daişê şikênandibûn hatin neçar kirin ko rondikên şikestinê û bêhêvîtiyê birijînin. Hemî xebata min ji bo hindê bû ev ”nepakiya” mezin wisa neke ko digel iraqiyan xwîneka zêde bêt rijandin yan jî pêşmerge rûbirûyê şerê nêvxweyî bibin.

Berê li Şingalê ji bo çêkirina pirtûbelaviyê û dubendiyê di nêv êzdiyan de hêza Heşda Êzdî hatibû ava kirin. Di şazdehê oktoberê de devera Şingalê jî ket ber pêla zalimane ya wê plana reş. Di wê hengameyê de şexsiyet û rihspiyên Şingalê daxwaz kir ko

pêşmerge ji Şingalê paşde bikişin da şerê nêvxweyî di nêv êzdiyan de çênebe. Wan got ew tehemila karesateka dî nakin. Her ji ber hindê bi şertê ko Şingalê bidin şingaliyan û êzdî bi xwe îdareya xwe bikin û ji bo şer çênebe û xwîna êzdiyan neyêt rêtin min ji bo paşdevekişiyana pêşmergeyan ji devera Şingalê fermanek derxist. Herçend heta niho jî hêj Şingal nedane destê êzdiyan û "kesên dî" li wêderê hikim dikin û xelkê Şingalê jî venegeriyayîne cihên xwe.

Min divêt li vêderê ji bo tarîxê behsa rola negatîv ya herdu dîplomatên brîtanyayî û emerîkî bikim. Piştî ko di heftê hezîranê de biryara pêkanîna referandumê hat dan, ambasadorê Brîtanyayê yê li Iraqê Frank Baker di heqê vê babetê de vekirî bû û behsa hemahengî û hevkariya welatê xwe û Kurdistanê di qunaxên bên de dikir. Lê belê di dawiyê de roleka gelek xirab li dijî Kurdistanê lehîst û agahdarê gelek fitnegerandin û plangerandinên nihênî yên li dijî Kurdistanê bû û destê wî [bi xwe] jî tê de hebû. Ambasadorê Emerîkayê yê li Iraqê Douglas Silliman jî roleka xirab lehîst: hem di teşwîqkirina neyarên Kurdistanê de û hem jî di rêkirina rapor û zanyariyên şaş di heqê Kurdistanê de bo Washingtonê. General Paul Funk jî ko qumandarê operasyonên eskerî yên Emerîkayê li Iraqê bû û nû dest bi kar kiribû roleka negatîv di dijayetîkirina referanduma gelê Kurdistanê de lehîst.

Di heqê referandumê de rast e emerîkiyan got ne bi dilê wan e û çênabe ko hon referandumê bikin, lê belê ew jî ji me re negot ko dê sîlehan û tankên Abrams bidin Heşdê da pê şerê pêşmergeyan bikin. Herçend ji bingeh ve sîleh û tankên emerîkayî ji bo şerê Daişê dabûn ordiya Iraqê, ne ji bo bidin Heşda Şe'bî. Emerîkiyan dikarî rê li ber wê dijminkariyê bigirin, dikarî ya herî kêm tankên Abrams nedin destê Heşdê li dijî pêşmergeyan, lê belê wan nekir. Helwêsta emerîkiyan, nemaze ya ambasadorê Emerîkayê yê li Bexdayê hêj zêdetir neyarên

Kurdistanê dehf dabû da li dijî herêma Kurdistanê seferberiya giştî bikin.

Roja 17-ê oktoberê ambasadorê Emerîkayê yê li Bexdayê Douglas Silliman mesajek ji bo min rêkiribû ko eynen wiha digot: "Dinya hat guhortin. Îro ne duhî ye, divêt hon pêdeçûnekê li xwe bikin." Piştî dagirkirina Kerkûkê û deverên dî û mişextbûna bi hezaran hemwelatiyan, ji aliyê hêzên Heşdê ve tawan û binpêkirinên berfireh li hemberî xelkê li Kerkûkê û Duzê hatin kirin. Xurureka wisa Ebadî û serkirdeyên Heşdê girtibû ko ji xwe re firset hesibandin da êrişî herêma Kurdistanê bikin û li gor hesabê xwe Hewlêrê û Dihokê jî bigirin û bi gotina wan serkêşên referandumê îdam bikin û kesên "nepak" jî bikin berdevk û nûnerên kurdan. Ez her ji esas ve li dijî şerkirinê bûm, lê belê dema mesele bigehe wê dereceyê ko îradeya xelkê Kurdistanê bişkênin diviya bergirî li îradeya miletê me bêt kirin. Vêca roja bîstê oktobera 2017-ê hêzên Heşdê û Ebadî şansê xwe ceriband û xwest ber bi Hewlêrê ve pêşde bên. Dema me zanî ko plana jihalêrakirin û dagîrkirina herêma Kurdistanê di serê wan de ye hêdî me jî biryara miqawemeya seranserî da û di roja bîstê oktoberê de li Pirdê pêşmergeyan qehremaniyeka mezin kir û êrişa Heşdê û hêzên iraqî têkbir.

Û cara yekê di tarîxê de tankên Abrams yên emerîkayî ko ji aliyê Heşda Şe'bî ve hatin bi kar anîn, bi destê hêzên pêşmergeyên Kurdistanê hatin têkbirin. Piştî wê biserketina mezin min bersiva mesaja ambasadorê Emerîkayê Douglas Silliman rêkir û got ji cenabê ambasador re bibêjin: "Îro ne duhî ye û sibehî jî dê ne wekî îro be." Berxwedana pêşmergeyan li hemî cepheyan berdewam kir heta 26-ê oktoberê li cepheyê Mehmûdiyeyê li Sihêlan hêzên iraqî û Heşdê bi hevkariya hêzên îranî û Hizbullaha Libnanê û bi qumandariya yekser ya efserekê Pasdarên Îranê bi navê Seyîdmuxtar (ko di wî şerî de birîndar jî bû) ji bo girtina Pêşxabûrê

êrişî çeperên pêşmergeyan kir û rûbirûyê şikestineka gelek mezin bûn. Şerê Sihêlan yek ji mezintirîn qehremaniyên tarîxî yên miletê Kurdistanê ye. Wê şikestina [dijminan] balans guhort û danûstandinan destpê kir. Ebadî hêjî her difinqulûz û mexrûr bû û ne amadeyê danûstandinên siyasî bû, dixwest ko tîmên teknîkî yên eskerî danûstandinan bikin.

Di gera yekê ya danûstandinan de nûnerên hêzên iraqî û nûnerê ordiya Pasdaran û *Hizbullaha Libnanê* amade bûbûn. Di danûstandinan de kesên iraqî li gor gotin û fermanên nûnerên Îranê û Hizbullahê hereket dikir. Ev di rastiyê de heqareteka gelek mezin bû ko Ebadî li serweriya Iraqê dikir ji ber kesên biyanî hatibûn û biryar li ser diyarkirina xeta temasê didan. Lewra jî min biryar da ko hêdî tîma me ya danûstandinan digel wan rûnene.

# Gotina dawiyê

Di şazdehê oktoberê de nehezên miletê Kurdistanê niyeta wê hindê hebû heger ji wan bêt tecribeya herêma Kurdistanê ji halê rakin. Xweragiriya xelkê Kurdistanê û pêşmergeyan rê li ber wê çendê girt ko ew plan biçe serî. Lê belê heta cihê piyên eqliyeta înkarkirinê û şovenîzmê li Iraqê hebe tehdîdên li ser maf û daxwazên rewa yên miletê Kurdistanê dê berdewam bikin. Miletê Kurdistanê xudanê dozeka rewa, neteweyî, tarîxî û li gor qanûna-esasî ye û hîç bûyer û astengek nikare ji rewabûna wê dozê kêm bike. Miletê Kurdistanê bi hêvî û hêzê israrê li ser wê dozê dike.

Bi rexmê dirindeyî û tawanên hikûmetên Iraqê yên li dijî kurdan tevgera rizgarîxwaz ya kurdan di dirêjahiya tarîxa xebata xwe de rêneda ko ew nakokiyên siyasî yên digel sîstema siyasî û dewleta Iraqê heyîn bibin nakokiyên neteweyî û mezhebî di nêvbera miletê Kurdistanê û xelkê Iraqê de û nehişt ko nakokî dakevin jêr nêv xelkê. Prensîpa tevgera rizgarîxwaz ya kurdan di hemî qunaxan de, niho jî û

di paşerojê de jî ew e ko di hemî rewşan de çênabe brayetiya kurdan û ereban têkbiçe.

Piştî qunaxa 2003-yê hikimdarên nû yên Iraqê tarîxa têrxwîn û înkardagirtî ya Iraqê ji bîr kir. Ew tarîxa dûrûdirêj ya ko tejî rondik û xwîna miletên Iraqê ye dikarî bibe derseka gelek baş ji bo hindê da desthilatdarên Iraqê piştî 2003-yê ji bo binecihkirina prensîpa şirîkatiyê, pêşketinê û pêkvejiyana di nêvbera pêkhatiyên Iraqê de faydeyê jê wergirin. Lê belê ne tenê ders jê wernegirtin heta xirabtir jî kirin. Mixabin wan, xebat ji bo wê çendê kir ko nakokiyên siyasî dakevin nêv raya giştî û xelkê û rengê nakokiyên neteweyî û mezhebî jî bigirin. Ev xeletiyeka yekcar mezin û xeternak bû û pirtûbelavbûn di nêv pêkhatiyên Iraqê de çêkir. Ev derbeyeka mezin jî bû li pêkvejiyanê û birîneka kûr jî di bedena Iraqê de vekir ko kewandina wê zehmet e û wextekê dirêj jê re lazim e. Rejîmên berê yên Iraqê nekarî nakokiyên siyasî bikin nakokiyên civatî, neteweyî û mezhebî, lê belê piştî 2003-yê hikimdarên nû yên Iraqê ew jî kir.

Niho mixabin şona ko birînên miletê Kurdistanê bikewînin rewşeka wisa xuliqandine her kesê ko zêdetir dijîtiya mafên miletê Kurdistanê bike cihekê bilindtir bi dest dixe. Dijayetîkirina mafên rewa yên miletê Kurdistanê dikin mijara propagandaya siyasî û hilbijartinan. Rojane di meseleya butçeyê de wekî ko minetekê li xelkê Kurdistanê bikin diaxivin û dibêjin herêma Kurdistanê butçeya Iraqê ji xwe re dibe. Halbokî dewleta Iraqê bi petrol û samana Kurdistanê bûye dewlet. Li ser dewleta Iraqê ferz e ko tezmînatê bide xelkê Kurdistanê û butçeyê jî bihinêre. Dewleta

Iraqê mecbûr e wê bike çimko wê miletê Kurdistanê qir kiriye û tawan kiriye. Em gelek baş jî dizanin di nêv siyasetmedarên Iraqê de gelek kes hene ko ne digel wê dijminkarî û zordariyê bûn ko hikûmeta Iraqê li dijî miletê Kurdistanê kiriye û fêmkirina wan ji bo doza rewa ye miletê me heye.

Herêma Kurdistanê digel hebûna kêmûkasiyan di warê îstiqrar, ewlekarî, refah û avakirinê de pêngavên mezin avêtine. Bexdayê nekarî wekî herêma Kurdistanê biserketî be û hikimdarên Bexdayê ko wan bi xwe nekarî pêşketin û refahê ji bo miletê Iraqê pêkbînin hesûdiya xelkê Kurdistanê kir û lêxebitîn ko pêşketin û geşbûna herêma Kurdistanê rawestînin. Para butçeya herêma Kurdistanê ji ya Iraqê ji % 17 bû lê belê ti wextan rênedan ko ew par wekî xwe bêt û tinê ji % 10 heta 12 ji butçeyê bo herêma Kurdistanê rêdikirin heta kar gehişt wê radeyê ko hemî qut kirin. Herêma Kurdistanê ji ber qutkirina butçeyê ji aliyê Bexdayê ve û şerê Daişê û daketina bihayê petrolê rûbirûya problemeka mezin ya aborî bû. Hikûmeta Iraqê di salên borî de 800 milyar dolar hatinî hebû.

Pirsiyar ev e: Ew hemî hatinî bi kû ve çû û li çi hat serf kirin? Şêst milyar dolar ji bo başkirina rewşa elektrîka Iraqê hatiye veder kirin herçend ne diyar e ka ew pere li kû ye û li çi hatiye serf kirin. Ew hemî hatinî şona ko ji bo xizmetê û refahê bêt bi kar anîn bi dizî, gendelî û bêserûberiyê hat heder kirin. Mixabin hinek ji siyasiyên Iraqê dixwazin wê îflaskirina xwe ya di birêvebirina welatî de bi êrişkirin û tawanbarkirina herêma Kurdistanê veşêrin. Sala 2019-ê nûnerên wîlayeta Musennayê û Besrayê serdana min kir.

Wan behsa nebûna xizmetê û heqxwarina xwe û nisbeta bilind ya feqîriya niştecihên wan wîlayetan û wîlayetên başûr kir. Ez gelek xemgîn bûm ji ber ko ew hemî hatinî li ber destê hikûmeta Iraqê bû lê belê xelkê Iraqê di desttengî û bêxizmetiyê de dijiya. Ev yek jî me zêdetir dehf dide da em digel birayên xwe yên li başûr û nêva Iraqê hemderd bin û têkiliyên birayane yên di nêvbera du miletan de berdewam bikin. Bi dilrehetî dibêjim ko nakokiyên siyasî û reftarên xirab yên hikimdarên Iraqê dê hîç tesîrekê li ser birayetî û têkiliyên di nêvbera miletê Kurdistanê û miletên Iraqê de neke.

Rêya tenê ji bo çareserkirina problemên Iraqê û nehiştina giriftên di nêvbera herêma Kurdistanê û Bexdayê de, û rêya tenê ji bo gehiştina pêşketin û aştiyê destjêberdana ji eqliyeta şovenîst û dana-ser-rêya kultura hevduqebûlkirinê ye. Heger wekî qunaxên berê desthilatdarên Iraqê nemana miletê Kurdistanê bivêt hingê bi dilrehetî girift dê hêj kûrtir bibin û ev rewş dê berdewam bike û ev welat hertim dê di krîzê de bimîne. Miletê Kurdistanê wekî hertim bi ruhekê birayane û dostane daxwazkarê çareya aştiyane ye ji bo hemî giriftan.

Referandum ji bo miletê Kurdistanê qezenceka neteweyî û niştimanî ya mezin bû. Referandum bi ser ket. Çimko piraniya xelkê Kurdistanê dengê ”Belê” dayê. Referandum dê hingê binketî bûya heger dengê ”Nexêr” zêdetir bûya û xelkê Kurdistanê daxwaza serxwebûnê nekiribûya. Dengê heq û edaletperwer yê miletê Kurdistanê bi ser ket û niho hemî cîhan dizane ka daxwaza jidil ya miletê Kurdistanê çi ye. Di heman

demê de referandum hilgira dersên pir mezin û pir bihadar e ji bo miletê Kurdistanê û neslên bên. Yek ji wan dersan ew e ko tu bi xwe nebî, û tu bi xwe piştê bi xwe û xelkê xwe û şiyanên xwe girênedî, hingê neheyî têyî hesabandin.

Ji reftar û helwêsta civata nêvdewletî di heqê referanduma Kurdistanê de, bi zelalî aşkera bû ya ko di têkiliyên nêvdewletî de tesîrê li balansê û tiştan dike ne prensîp û binaxeyên mafan û edaletperweriyê ne, belko lojîka hêzê û berjewendîxwestinê ye. Me dît ko hemî li dijî dengê rewa yê xelkê rawestiyayî bûn û ti kesê rê li ber wê çendê negirt dema ko li dijî Kurdistanê sîleh, şidet û dorpêçkirin hat bi kar anîn. Helwêsta gelek ji wan welatên ko wekî ”cîhana azad” û ”*civata demokratîk*” û xudanprensîp navûdeng dabûn, yan helwêsteka lawaz û velerizî bû yan jî bêdeng û bêhelwêst bûn, yan jî helwêsteka şermoke ya bêtesîr bû. Helwêsta kêm ji wan hinekê balanskirî bû.

Ez pêwist dibînim ko spasiyên xwe yên bêpayan pêşkêşî helwêst û germûgurî û piştgiriya miletê kurd yê li parçeyên dî û wan hemî kurdên li derveyî Kurdistanê bikim ko piştgir û hevsozên daxwazên rewa yên xelkê herêma Kurdistanê bûn. Şîreta min bo her ferdekê kurd û hemî siyasiyên kurd – di heqê babeta mafên rewa yên miletê me de – ew e ko hîç wextekî pişta xwe bi aliyekî germ nekin. Cîhan cîhana berjewendiyan e. Heger berjewendiyên wan digel kurdan hevdu bigirin hingê dibin dost û heger berjewendiyên wan û kurdan hevdu negirin dê pişta xwe bidin we û we nas nakin. Lewra pişta xwe tenê bispêrin Xwedê û xwe. Heger pêşmergeyên me bi xwe hebin û hêzên me bi

xwe hebin, Kurdistan dikare xwe biparêze. Heger em bêhêz bibin em nayên parastin û dê me ji halê jî rakin. Di referandumê de asta kîn û buxz û dijminkariya neyarên Kurdistanê û hinav û kûrahiya dilê kesên şovenîst û dilreş zêdetir derket meydanê û zelal jî bû ko wan qet ders ji tarîxê wernegirtine.

Dibe ko hinek alî li derveyî herêma Kurdistanê dilê xwe bi wê xweş bikin û wisa bihesibînin ko bi rêya têkçûyiyan, medyayê, sîlehan û pereyên hinek kesên bêprensîp û xakfiroş yên di nêv kurdan de dikarin wisa li miletê Kurdistanê bikin ko dest ji hêjahî û armancên xwe berdin, ew alî di rêyeka gelek xelet de ne. Li hemberî wan, bi milyonan ciwanên kurd hene ko baweriya wan bi hêjahî û armancên bilind heye û keramet û mezinahiya miletê xwe diparêzin.

Referandum ne tawan bû û miletê Kurdistanê jî dema ko dengê xwe da tawanek nekir. Ya ko miletê Kurdistanê kir ne berovajiyê qanûna-esasî bû. Dîbaceya qanûna-esasî ya Iraqê ew maf daye miletê me. Di dîbaceya qanûn-esasî ya Iraqê de pir bi zelalî hatiye nivîsandin ko ”pêbendbûna bi vê qanûna-esasî ve, yekgirtina dilxwaz ya Iraqê bi gel û erd û serweriya wê ve diparêze”.

Ew kes tawanbar in yên ko qanûna-esasî binpê kirin û bi sîlehan û ”nepakiyê” bersiva dengê heq û aştiyane yê miletekê mezlûm da. Zimanê sîlehan, xweferzkirinê û ”nepakiyê” jî qet serketinê bi dest ve naîne. Wan jî li hemberî dengê aştiyane yê miletê Kurdistanê, wekî di qunaxên berê de, destê xwe dirêjî sîlehan, şerî û şidetê kir û derket ko ders ji tarîxê wernegirtine. Wan berî ko zilmê li miletê Kurdistanê bikin, zilim li xwe û welatê

xwe jî kir. Pirsa miletê Kurdistanê pirseka rewa, siyasî, cografî, neteweyî, tarîxî û qanûnî ye. Eve sed sal in ko hemî rengên sîlehan ji bo jihalêrakirin û şkênandina îradeya miletê Kurdistanê û nehiştina doza rewa ya miletê kurd bi kar tînin û cardî jî miletê Kurdistanê her maye. Ne wan kariye kurdan ji halê rakin û ne jî kurdan kariye wan ji halê rakin.

Me diyalog û çareseriyeka aştiyane û birayetî xwestiye û me divêt ko problem nemînin û miletên deverê di nêv aştiyê de ber bi pêşketin û refahê ve gavan bavêjin. Qenaeta me ew e ko bi înkarkirina mafên miletê Kurdistanê û şerî problem nayên çareser kirin. Çi em bi hev re bin yan ne bi hev re bin divêt rêzgirtin û hevdufêmkirin di nêvbera me de hebe.

Ew neko probleman çareser nakin belko kûrtir jî dikin û bêyî ko giriftan çareser bikin ji neslên nû re dihêlin. Ev, xeletî û neheqiyeka mezin e ko li hemberî aştiyê, pêkvejiyanê û îstiqrarê têt kirin. Digel wê jî herçend di jiyana miletan de binketin û serketin hebin jî, xebat û rawestiyana li dijî neheqiyê, şovenîzmê û nijadperestiyê her berdewam dike çimko ev hemî li dijî xwezaya mirovayetiyê ne. Miletê Kurdistanê dixwaze bibe beşek ji mirovayetiyê, neko bibe beşek ji neheqiyê.

# Servehî


- Bingehên qanûnî û yên qanûna-esasî ji bo referanduma herêma Kurdistanê - Iraq 114
- Teksta beyannameya dawiyê ya konferansa opozîsyona Iraqê li Londonê 168
- Deklarasyona siyasî ya garantîkirina mafên pêkhatiyên neteweyî û dînî yên Kurdistanê 184
- Deklarasyona prensîpên qanûna-esasî 189

# Bingehên qanûnî û yên qanûna-esasî ji bo referanduma herêma Kurdistanê – Iraq

Amadekirin:
**Komîteya şêwirmendan ya merkeza qanûnî ya Partiya Demokrat ya Kurdistanê**

Bextiyar Heyder
Dr. Ebdilfetah Ebdilrezaq
Dr. Ebdilhekîm Xisro
Dr. Kawan Îsmaîl
Dr. Çiwas Hesen

## Pêşgotin

Referanduma ko miletê Kurdistanê-Iraq, 25-ê îlona 2017-ê ji bo mafê biryardana-çarenivîsa xwe kir, ji bo kurdistaniyên li her cihekê cîhanê pêngaveka mezin ya tarîxî bû. Di heman wextê de di asta herî bilind ya siyasî û dîplomatîk de dengvedaneka wê ya mezin li herêmê û cîhanê çêbû. Referandumê, paralel digel helwêstên siyasî yên dewletan, bi rengekî jî minaqeşeyên ilmî û fikrî yên di heqê prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê de ji nû ve vejand: Wekî gelo kê mafê biryardana-çarenivîsa xwe heye? Ma ev prensîp ji bo hemî ”gelan”

e yan tenê ji bo ”gelên” kolonîzekirî ye? Di kîjan demê de ev maf dikare bêt bi kar anîn? Û gelek pirsiyarên dî jî.

Ji aliyekê dî ve li ser asta nêvxweyî ya Iraqê careka dî minaqeşeya ka referandum li gor qanûna-esasî ye yan ne, gur kir. Gelo vê referandumê bingehekê qanûna-esasî hebû? Tetbîqkirin yan tetbîqnekirina qanûna-esasî çi têkilî bi vî mafî ve heye? Reaksiyonên dezgehên dewleta federal di asta ”desthilata qanûnnivîs”, ”desthilata bicihker” û ”desthilata dadgêriyê” de li hemberî referandumê û miletê Kurdistanê gehişt wê radeyê ko di 16-ê oktobera heman salê de êrişeka eskerî bînin ser deverên Kurdistanê yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê. Ev rewş ji me dixwaze ko em analîzeka qanûnî jê re bikin da bêt diyar kirin ka gelo ew reaksiyon di çarçeweyeka qanûnî de hatin kirin yan reaksiyonên jihedder û bêbihane bûn.

Ji ber hindê ev rapor bi rêya van beş û baskên li xwarê lêdixebite ko ronahiyê bêxe ser wan hersê aliyên serekî yên ko me li jor îşaret pê kir:

> [Raveka tercimanî: Di vê rapora hiqûqî de bêjeya ”milet/nation” nehatiye bi kar anîn. Li şona wê bêjeyeka dî ya erebî ”ummet” hatiye bi kar anîn. Di kurmancî de em bêjeya ”milet” bi menaya ”ummet” yanî ”nation” bi kar tînin û ew bêje ji bêjeya ”gel” yanî ”people” berfirehtir e. Li gor vê raporê ”gelan” û heta ”kêmîneyan” jî mafê biryardana-çarenivîsê heye. Ji ber ko kurd ”miletek” in û ji ”gelekî” mezintir in hêj zêdetir mafê wan yê biryardana-çarenivîsê heye. Di soranî de piraniya caran bêjeya ”gel” bi menaya ”milet/nation” jî têt bi kar anîn. Lewra di vê raportê de dema ko bêjeya ”gel” bi menaya ”people” be min wekî ”gel” hişt û dema ko bi menaya ”milet” be min wekî ”milet”. Arif Zêrevan]

# BEŞA YEKÊ

## Mafê miletê kurd yê biryardana-çarenivîsê di çarçeweya qanûnên giştî yên nêvdewletî de

## Baskê yekê:
### *Mefhûm û pêşdeçûna fikra mafê biryardana-çarenivîsê*

Di hemî sedsala hejdehê û nozdehê de, mafê biryardana-çarenivîsê wekî mafekê "gelan" ji bo ko azadane rewşa xwe ya siyasî diyar bikin, roleka liberçav û tesîrbar li ser civata nêvdewletî hebû. Ji bilî wê deklarasyona serxwebûnê ya Emerîkayê jî îşaret bi wê prensîpê kiriye. Herwiha şoreşa Fransayê jî careka dî sala 1789-ê di "deklarasyona mafên mirovî û hemwelatiyan" ya fransayî de bal kişandiye ser mafê "gelan" di biryardana çarenivîsa wan de.[1]

Di destpêka sedsala nozdehê de gelek ji nivîskarên elmanî bal kişandine ser wê yekê ko "ummet/nation" yekîtiyeka xwezayî ye û mafê "ummetê" heye ko sîstem û dazgehên xwe yên taybet yên siyasî pêşde bibe bêyî ko tesîrê yan rêgiriyê li miletên dî bike. Di cîhana siyasî de mafê ummetê heye ko şexsiyeta niştimanî ya xwe ava bike. Ji ber hindê divêt her ummetekê dewleta neteweyî (nation state) ya serbixwe hebe.[2]

---

١- د.مسعد عبدالرحمن زيدان قاسم: تدخل الأمم المتحدة في النزاعات المسلحة غير ذات الطابع الدولي، دار الجامعة الجديدة للنشر: الاسكندرية، ٢٠٠٣، ص٣٠١

2- See: Thomas D. Musgrave. Self Determination and National Minorities. Oxford University Press: New York, First Published 1997, First Issued In Paperback: 2000. p. 5.

Lê belê li ser asta têkiliyên nêvdewletî de, cara yekê prensîpa mafê ”gelan” di biryardana çarenivîsa wan de ji aliyê serokê Emerîkayê Woodrow Wilson ve sala 1918-ê di çarde prensîpên wî de behsa wê hat kirin. Di peymanên piştî şerê yekê yê cîhanê de yekser behsa prensîpa mafê ”gelan” di biryardana çarenivîsa wan de nehatiye kirin. Di dawiya şerê yekê yê cîhanê de, di armancên Neteweyên Yekbûyî de, di paragrafa didoyê ya madeya yekê û madeya 55-ê û madeya 56-ê ya wê belgeyê de cara yekê di belgenameyeka nêvdewletî de ew prensîp hatiye bi cih kirin.

Hêjayî îşaretpêdanê ye ko ev prensîp hêdî hêdî bi rêya gelek biryar û deklarasyonên nêvdewletî zêdetir cihgir bû. Deklarasyona 1514 (XV) ya sala 1960-ê ya meclisa giştî ya Neteweyên Yekbûyî jî ko wekî biryara ”nehiştina kolonîzasyonê” hatiye nas kirin di heqê vê mijarê de bû. Ji bilî wê di madeya yekê ya Peymana Nêvneteweyî ya Mafên Medenî û Siyasî (International Covenant on Civil and Political Rights) û Peymana Mafên Aborî, Civatî û Kulturî (International Covenant on Economic, Social and Cultural Rights) de cih û qîmetekê taybet pê hatiye dan.

Piştî hingê jî prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê ji ”prensîpeka siyasî” tenê hat guhortin û bû ”prensîpeka qanûnî” û herwiha qenaeta xurt ya zanayan jî ew e ko mafê biryardana-çarenivîsê bûye urfek di hikmê qanûnê de (el-qewaîd el-amîre) ko bi rengekî dikare pêbendbûna qanûnî ya nêvxweyî û nêvdewletî çêke. Helbet çênabe ko bi lihevkirinê jî zêdegavî li hemberî wê bêt kirin heger urfeka dî xurt wekî wê nebe.[3] Di heqê nêveroka mafê biryardana-çarenivîsê de jî bi derbasbûna demê re guhortin di nêverok û menaya wê de çêbûye. Divêt em îşaretê bi wê yekê bidin şiyana ”gelekî” yan kêmîneyekê heye ko azadane di heqê têkiliyên nêvdewletî de alternatîva serxwebûnê yan federaliyê digel dewleteka dî bibijêre. Yan jî mafê hemwelatiyên welatekî heye ko beşdariyê di prosesa amadekirina biryarên welatê xwe de bikin.

٣- الدكتور إبراهيم محمد العناني، القانون الدولي العام، ط٥، دار النهضة العربية: القاهرة، ٢٠٠٤-٢٠٠٥، ص٤١٤.

**Gelo mafê biryardana-çarenivîsê tenê yek carê ji aliyê ”gelan” ve têt bi kar anîn?**

Divêt haya me ji wê yekê hebe dema ko ”gelek” mafê biryardana-çarenivîsa xwe bi kar tîne - wekî mana di çarçeweya dewletekê de - ew nayêt wê menayê ko ew ”gel” di paşerojê de ji hilbijartina rengekê dî yê mafê biryardana-çarenivîsa xwe têt bêpar kirin; wekî hilbijartina serxwebûnê di paşerojê de. Mafê biryardana-çarenivîsê mafek e ko bi derbasbûna demê re û bi bikaranîna berê ji kar nakeve.

Bo nimûne, bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê ji aliyê ”gelê”Tîmûra rojhilatê ve di sala 1974-ê de bi rêya referandumekê di bin serpereştiya Neteweyên Yekbûyî de çêbû û ”gelê” Tîmûra rojhilatê çarenivîsa xwe wekî çûna aliyê Endonezyayê hilbijart lê belê ew nebû sebeb ko ew maf bimire. Sala 1999-ê Tîmûra rojhilatê careka dî biryar li ser çarenivîsa xwe da û vê carê ji Endonezyayê cida bû û bû serbixwe.[4] Miletê kurd di destpêka şoreşa îlonê de, sala 1961-ê bijardeya otonomiyê di çarçeweya Iraqeka demokratîk de hilbijart, lê belê piştî pêknehatina maf û armancên kurdan bi wî rengî, kurdan daxwaza xwe guhort û kir federalî ko di Parlamentoya Kurdistanê ya hilbijartî de sala 1992-yê biryar li ser hat dan.

## Baskê didoyê:
## *Yên ko xudanê mafê biryardana-çarenivîsê ne*

Wan belgenameyên ko me berê îşaret pê da, bi hûrî diyar nekirine ka kê (grupek, gelek, miletek) mafê biryardana-çarenivîsa xwe heye. Çimko vê prensîpê îşaret bi mafê ”gelan” kiriye, bi menaya ko tenê ji ”gelan” re rê heye ko mafê çarenivîsa xwe ya siyasî bi

٤- الدكتورة بدرية عبدالله العوضي: موقف القانون من الاحداث المحلية والدولية، جامعة الكويت: الكويت، ١٩٨٠، ص ص١١٨- ١١٩.

kar bînin. Lewra divêt em li vêderê destnîşan bikin ka mebest ji ”gelan” kî ne.

Wisa xuya dike ko qanûnzan û kesên zana li ser destnîşankirina mefhûma ”gelan” ko di vê prensîpê de derbas dibe ne hemfikir in û di heqê wê meseleyê de sê bergeh hene:

**Bergehê yekê:** *Xudanên vê bergehê wisa rave dikin ko mebest ji bêjeya ”gel” (people) ko di deklarasyona Neteweyên Yekbûyî de derbas dibe ”dewlet” e. Lewra bêjeya ”gel” menaya ”dewletê” dide.*[5]

Lê belê ev fikir li dijî nêveroka prensîpa mafê ”gelan” yê biryardana-çarenivîsa wan e. Lewra ji aliyê piraniya qanûnzanan ve rexne lê hatiye girtin û dibêjin dema paragrafa didoyê ya madeya yekê ya deklarasyona Neteweyên Yekbûyî hat nivîsandin nûnerê Belçîkayê pêşniyara wê çendê kir ko bêjeya ”dewlet” li şona bêjeya ”gel” bêt bi kar anîn minasibtir e, lê belê pêşniyara wî ji aliyê komîteya nivîsandinê ve hat red kirin. Herwiha di paragrafa yekê ya biryara meclisa giştî ya Neteweyên Yekbûyî ya hejmara 2625-ê (XXV) de hatiye nivîsandin ko ”hemî gelan” (all peoples) mafê biryardana-çarenivîsa xwe heye û li ser hemî dewletan (Every state) ferz e ko rêzê ji wî mafî re bigirin.[6]

Ji aliyekê dî ve deklarasyona Neteweyên Yekbûyî gelek termên wekî ”gel”, ”dewlet”, ”Endamên Neteweyên Yekbûyî”, ”dewletên ne endam”, ”herêmên neotonom” û termên wekî wan bi menayên ji hevdu cida bi kar tîne.

**Bergehê didoyê:** Xudanên vê bergehê wisa rave dikin ko mefhûma ”gel” ko di prensîpên mafên ”gelan” de derbas dibe, mebest jê herêmên di bin desthilata ”kolonyalîstan” de ne, û ew

5- See: Thomas D. Musgrave. Op. Cit. p. 148.
6- See: Thomas D. Musgrave. Op. Cit. p. 149.

”gelên” ko biryar li ser çarenivîsa wan ya dawiyê hatiye dan nakevin ber vê prensîpê ji ber ew bûne niştecihên yek ji wan dewletên serbixwe yên heyî. [7]Lê belê bi hûrlênêrîna biryarên Neteweyên Yekbûyî, nemaze biryarên piştî dehsalên dawiyê yên sedsala borî, em dibînin ko berovajiyê vê bergehê ne. Herçend biryar di çarçeweya nehiştina kolonyalîzmê de hatibin jî nêveroka wan bi rengekê hatine dariştin ko ”hemî gel” bikevin ber. Herwiha hinek ji biryarên Neteweyên Yekbûyî di heqê mafê biryardana-çarenivîsê de ji bo hinek ”gelan” bûn ko ne di bin destê kolonyalîstan de bûn, wekî biryarên wê yên girêdayî ”gelê” Filistînê, yan wekî nimûneya qebûlkirina serxwebûna Bengladeşê. Yan jî îtirafa bi wan dewletên nû ko di netîceya hilweşiyana Yekîtiya Sovyetan û Yugoslavyayê de, di dawiya sedsala borî de ava bûn.[8]

**Bergehê sêyê:** Qenaeta xudanên vê bergehê ew e ko ”gel” dikevin ber prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê û ne ”dewlet”. Û ji aliyekê dî ve hemî ”gelên” di bin desthilata kolonyalîstan de - û yên ne di bin desthilata kolonyalîstan de jî - mafê qanûnî heye ko azadane biryarê li ser paşeroja xwe ya siyasî bidin û dewleta xwe ya serbixwe ava bikin.[9]

Ev bergeh bergeha rast e, û berovajiyê bergeha yekê û didoyê bi ruhê deklarasyona Neteweyên Yekbûyî û mantiqa mafê biryardana-çarenivîsê û helwêsta Neteweyên Yekbûyî û pêşdeçûnên niho yên têkiliyên nêvdewletî û qanûnên nêvdewletî re li hev dike.

---

٧- أنظر إدمون جوف: علاقات دولية، ترجمة: منصور القاضي، ط١، المؤسسة الجامعية: بيروت، ١٩٩٣، ص٢٥٣-٢٥٤.

8-See: Michael Akehurst. A Modern Introduction to International Law، London: The ACADEMIC Di-vision of Unwin Hyman Ltd, Sixth Edition, Second Impression 1988, p. 300.

٩- د.حكمت شبر: الجوانب القانونية لنضال الشعب العربي من أجل الإستقلال، اصدارات وزارة الاعلام: بغداد،١٩٧٤، ص٣٤-٣٥.

## **Baskê sêyê:**
## *Mafê kêmneteweyan yê cidabûna ji dewleta ko tê de dijîn*

Gelo terma ”gel” kêmneteweyan jî vedihewîne, bi menaya ko mafî bide wan heta ew di çarçeweya prensîpa mafê ”gelan” yê biryardana-çarenivîsa xwe de, ji dewleta dayîk cida bibin û dewleta xwe ava bikin?

Bêjeya ”ummet/nation” ji koma hinek kesan pêk têt ko di hinek xisletên giring de hevbeş in, wekî van xisletan: rayê etnîkî, dîn, baweriya siyasî û tirsa ji eynî dijminî. Lewra qanûnzan hêdî-hêdî gehiştine wê baweriyê ko ferq di nêvbera terma ”ummet” (nation), ”nijad” (nationality), ”gel” (people) û ”gelên xweser” (indigenous people) de nîne, hemî jî cewherê eynî hizrê vedihewînin.[10] Herwiha realîteya nêvdewletî jî balê dikişîne ser wê yekê ko kêmneteweyan wekî ”gel” wesif bike û wî heqî bide wan ko biryarê li ser çarenivîsa xwe bidin û ji dewleta dayîk cida bibin. Lê belê bi van şertên li jêrê:[11]

a) Di wê kêmîneyê de xisletên ”ummetekê/nation” hebin û xwe wekî ”gelekê serbixwe” nîşan bide.

b) Li cem ferdên wê kêmîneyê ji bo pêkanîna qewareyekê siyasî yê serbixwe viyaneka hevbeş hebe.

c) Wê kêmîneyê herêmeka diyarkirî hebe.

d) Wê kêmîneyê yek ji sebebên bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê hebe.

10- Thomas D. Musgrave. Op. Cit P.169

١١- د.عبدالفتاح عبدالرزاق محمود، الإعلان عن الدولة، دار الكتب القانونية ودار شتات للنشر: القاهرة، ٢٠٠٩، ص٤٤٤.

## **Baskê çarê:**
## *Mafê herêmên (wîlayetên) dewleteka federal yê cidabûnê*

Ji aliyê qanûnî ve têt dîtin ko qanûna-esasî ya hinek welatên federal - wekî Yekîtiya Sovyetê ya berê û Yugoslavyaya berê - bi zelalî ew maf dabû herêmên xwe yên federal da biryarê li ser çarenivîsa xwe bidin û cida bibin. Qanûna-esasî ya Etyopiyayê ya sala 1994-ê jî ew maf ne tenê dabû pêkhatiyên herêmên xwe belko ji bo pêkhatiyên xwe yên etnîkî jî garantî kiribû.[12] Li hinek welatên dî yên federal hinek ji grupên etnîkî karî mafê biryardana-çarenivîsê bi kar bînin û cida bibin: Bo nimûne li destpêka salên sihê yên sedsala borî wenezuelayiyan karî ji Kolombiyaya mezin cida bibin, Sîngapor jî sala 1965-ê bi rengekê aştiyane ji Malezyayê cida bû û herçî Bengladeş e ew jî bi hêza çekdarî ji Pakistanê cida bû.

Heger di qanûna-esasî ya dewleteka federal de behsa mafê herêman yê cidabûnê nehatibe kirin jî - digel ko ev yek herêman ji aliyê qanûnî ve di asta nêvxweyî de ”bêxwedî” dihêle - ev nayêt wê menayê ko ew ji bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsa xwe yê cidabûnê bêpar dibin. Dema ji bo bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê ”gelek” hebe û şert û sebebên siyasî tê de hebin ew dikare wî mafî bi kar bîne çimko qanûnên giştî yên nêvdewletî cidabûnê qedexe nakin. Hîç urfeka nêvdewletî nîne ko cidabûna ji dewletekê heram bike. Di qanûnên nêvdewletî de rêgiriyek li hemberî cidabûna herêman ji dewleta federal nîne. Tecribeyên cidabûnê wê yekê piştrast dikin ko meseleya cidabûnê ji dewleta federal meseleyeka nêvxweyî ye û dikare

---

١٢- أنظر الدكتور فلاح إسماعيل حاجم: مبدأ السيادة وحق إنفصال الاقاليم في الدولة الفيدرالية، مقال منشور في:
http://www.iraqcp.org/members4/0061022wwz18.htm

bi rengekê aştiyane biryar li ser wê meseleyê bêt dan: wekî vegeriyana li teksta qanûna-esasî, yan vegeriyana li dadgeha bilind ya dewletê, yan jî vegeriyana li dengê gel bi rêya referandumeka giştî. Yan jî dikare bi rengekê neaştiyan be; wekî bikaranîna hêzê ji aliyê herdu terefan ve û hingê netîce her çi be jî li gor hiqûqa giştî ya nêvdewletî rewatiya wê heye.[13]

Yanî ji aliyê qanûnî ve ew grupa ko herêmeka federal pêktîne, mafê wê yê xwestina bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsa xwe heye, heger sifetên "gelekî" û şertên pêwist yên bikaranîna wî mafî tê de hebin.

## Baskê pêncê:
## *Şert û mekanîzmayên bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê*

Divêt em bibêjin heçî mafê biryardana-çarenivîsê ye ji bo hemî "ummet", "gel" û "kêmîneyên" ko îdiaya "gelbûnê" dikin heqekê qebûlkirî ye, lê belê ji ber ko bicihkirina wê prensîpê bi awayekê mitleq û bêyî şert û mekanîzmayên saxlem yên hiqûqa nêvdewledî dikare bibe sebebê çêkirina kaosê û bêîstiqrariyê di têkiliyên nêvdewletî de, ev bi xwe dibe sebebê nemana mafê biryardana-çarenivîsê.

Lewra li gor qenaeta hinek qanûnzanan divêt di bikaranîna wî mafî de hinek şert di bin çavdêriya Neteweyên Yekbûyî de bên raçav kirin. Di raporta Neteweyên Yekbûyî ya sala 1981-ê de ko wekî "Raporta Critescu" têt nas kirin, hinek şert hatine rêz kirin ko divêt li cem her "gelekî" hebin heta ew bikare daxwaza mafê biryardana-çarenivîsê bike û ew şert jî ev in:[14]

---

13- Michael Akehurst. Op. Cit. Pp. 5354.
14- Critescu Report, UN Doc. E/CN. 4/sub. 2/404/ Rev. 1. 1981.

a) Wê grupê yan ziman, yan kultur yan dînekê guhortî hebe.
b) Li cem endamên wê grupê hesta tarîxeka hevbeş hebe.
c) Di nêvbera endamên wê grupê de sozeka parastina nasnameya xwe hebe.
d) Ew grup bi herêmeka diyarkirî ve girêdayî be.

Peydabûna van şertan li cem ”gelekî” ne zêde zehmet e. Bo nimûne wekî kurdan û tîbetiyan. Pênasekirina ”gelekî” dikare bi rêya hinek belgenameyên giştî be yan teserufên îdarî yên dewletekê be; wekî slovakiyan ko di bin sîwana qanûna-esasî ya Çekoslovakyayê de rewşeka wan ya taybet hebû, yan jî rewşa skotlandiyan ko sîstemeka wan ya dadgêriyê û perwerdeyê ji ya Ingîltereyê cida heye. Û reftarên dewletekê li hemberî grupeka diyarkirî jî dikare arîkariya pênaseya ”gelekî” bikin. [15]

Lê belê dema ko daxwaz ne bi rêyeka aştiyane be yan jî bi rêya xebata çekdarî be, li gor hinek kesan herçend ew şertên li jor li cem grupekê hebin jî divêt hinek şertên dî jî li cem tevgera wan ya rizgarîxwaziyê hebin heta bikarin mafê biryardana-çarenivîsa xwe garantî bikin, ew şert jî ev in:[16]

a) Divêt rikeberî li dijî dagirkeran yan kolonyalîstên biyanî yan jî sîstemeka hikimdariyê ya nijadperest be.
b) Divêt tevgera rizgarîxwaz ya wê grupê hêzeka organîzekirî be û di bin serkirdayetiyeka berpirs de be ko dîsîplîna wê ya nêvxweyî hebe û qanûnên insanî tetbîq bike.
c) Tevgera wê ya rizgarîxwaz kontrola beşek ji axa niştîmana xwe bike.

---

١٥- روبرت ماك كوركوديل: حقوق الانسان وتقرير المصير، بحث منشور في مؤلف: مورتمر سيلرز: النظام العالمي الجديد، حدود السيادة، حقوق الانسان، تقرير مصاير الشعوب، ترجمة: صادق ابراهيم عودة، ط١، دار الفارس للنشر: الاردن، ٢٠٠١، ص٣٤.

١٦- مورتمر سيلرز: المصدر السابق، ص١٨٩.

Li gor hinek qanûnzanan pir pêwist e ko mekaznîzmayên bikaranîn û bidestveanîna mafê biryardana-çarenivîsê bên zelal kirin û di sîstema Neteweyên Yekbûyî de bên sabit kirin û komîsyoneka taybet ji bo biryardana li ser wî mafî bêt pêkanîn.

## Baskê şeşê:
## *Asteng û rêgiriyên li pêşiya bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê*

Herçend mafê biryardana-çarenivîsê bi wan şertên ko me berê îşaret pêdaye ji bo hemî "gelên" cîhahê mafekê giştî û îtirafpêkirî ye jî hinek caran li hemberî bikaranîna wî mafî problem û rêgiriyên qanûnî derdikevin, ji ber di netîceyê de nakokî û dijayetiya wî mafî digel hinek prensîp û urfên qanûnî yên qebûlkirî çêdibe. Zêdebarî wê jî astengên siyasî, tarîxî û cografî jî hene. Siyaseta berfirehkar (ekspansiyonîst) ya hinek dewletan jî dibe asteng: Wekî li Keşmîrê, Kurdistanê, Filistînê, Qibrisê, Quebekê, Vîetnamê, Sehraya Rojavayê û welatên wekî wan.[17]

Mebest ji van rêgirî û astengên qanûnî ko îhtimal heye bikevin ber rêya bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê ew e ko di hinek rewşan de tetbîqkirina wî mafî dikare bibe sebebê binpêkirina prensîpeka esasî ya qanûnên nêvdewletî ko sifetê urfeka wekî qanûnê (el-qewaid al-amire) hebe, û hingê jî divêt hewl bêt dan ko ew digel hevdu bên guncandin, û heger ew jî nebe hingê divêt yek ji wan bêt feda kirin. Vêca kîjan minasibtir e ko bêt feda kirin em dê di van nuqteyên li xwarê de zelal bikin:

---

١٧- زهير شكر، الوسيط في القانون الدستوري، ج١، القانون الدستوري والمؤسسات السياسية، ط٣، المؤسسة الجامعية للدراسات والنشر والتوزيع: بيروت، ١٩٩٤، ص٤٠.

**A) Astenga prensîpa ”yekîtiya axê” li hemberî bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê**

Yek ji wan giriftên ko rûbirûyê grupan dibe ew e dema ko ew dixwazin mafê biryardana-çarenivîsa xwe bi kar bînin, yanî dema ko dixwazin cida bibin û veqetin problem ew e ka dê dewleta xwe li ser kîjan axê ava bikin.[18] Ji ber ji aliyê qanûnî ve ew ax girêdayî dewletekê ye û berê ji aliyê resmî ve wekî axa wê dewletê hatiye qebûl kirin. Madeya dehê ya belgenameya Cemiyeta Miletan û paragfara çarê ya madeya didoyê ya deklarasyona Neteweyên Yekbûyî îtiraf bi prensîpa ”yekîtiya axê” (territorial integrity) û serxwebûna siyasî ya hemî dewletan kiriye, yanî deklarasyona Neteweyên Yekbûyî hemî dewlet bi wê xalê ve pêbend kirine.

Lê belê realîteya rewşa cîhanê ji me re dibêje ko prensîpa ”yekîtiya axê” ya welatan bi awayekê mitleq rêz jê re nehatiye girtin. Çêbûna gelek dewletên nû di netîceya cidabûnê yan hilweşiyana dewletan de - piştî avabûna Neteweyên Yekbûyî û îtirafpêkirina wan dewletan ji aliyê civata nêvdewletî ve û qebûlkirina wan wekî endamên Neteweyên Yekbûyî - aşkera kir ko ew prensîp ne rêgireka jidil e li hemberî prensîpa mafê ”gelan” di diyarkirina çarenivîsa wan de. Bo nimûne hilweşiyana Yekîtiya Sovyetan û Yogoslavyayê; cidabûna Erîtreyê ji Etyopyayê, cidabûna Tîmûra rojhilat ji Endonezyayê û cidabûna başûrê Sûdanê ji Sûdanê.

**B) Astenga prensîpa ”parastina statukoyê” li hemberî bikaranîna prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê**

Ihtimal heye ko bikaranîna prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê yê ji bo rizgarbûna ji kolonyalîstan yan ji bo serxwebûnê, bi hêceta prensîpa ”parastina statukoyê” (Uti possidetis) bêt

---

١٨- أنظر الدكتور مسعد عبدالرحمن زيدان قاسم: مصدر سابق، ص٣٧٣.

asteng kirin da ew tixûbên ko kolonyalîstan kişandine parastî bimînin. Goya bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê di wan haletan de dibe sebebê bêîstiqrariya deverê û dibe tehdîdek li ser aştî û ewlekariya nêvdewletî.[19]

Lê belê divêt em balê bikişînin ser wê yekê ko ew prensîp yek ji paşmayiyên kolonyalîstan e ko ji bo berjewendiyên xwe bêyî liberçavgirtina berjewendiyên ”gelên” niştecihên wan deveran ew tixûb kişandine.[20] Bêbeşkirina ”gelekî” ji mafê biryardana-çarenivîsa wî bi hêceta prensîpa ”parastina statukoyê” ko realîteyê ferz kiriye û bingehê wê jî tenê realîte ye çênabe ko bibe astengeka qanûnî di ser prensîpeka wekî biryardana-çarenivîsê re ji ber ev prensîpeka qanûnî ye û heta yek ji urfên qanûnî yên fermankir e jî. Lewra çênabe tixûbekê ko bi hukmê realîteyê hatî ferz kirin û li dijî prensîpeka qanûnî ya îtirafpêkirî be bêt qebûl kirin, nemaze heger ne li gor viyan û daxwaza ”gelên” niştecihên di nêv wan tixûban de be.[21]

## C) Astenga prensîpa qedexekirina ”bikaranîna hêzê” di têkiliyên nêvdewletî de ji bo bikaranîna prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê

Hinek caran dewlet di netîceya bikaranîna hêzê de, wekî cidabûna herêmekê ji dewleta dayîk, bi rêya bikaranîna şidetê yan piştgiriya eskerî ya derve yan dagirkirina eskerî ava dibin. Yan jî bi rêya hevdugirtina du dewletan di netîceya bikaranîna hêzê de. Yan jî bi rêya peymaneka nêvdewletî ko di bin tehdîda bikaranîna hêzê de pêkve hatibin girêdan. Di van rewşan de emraza ko ji

19- See: Uti possidetis. From Wikipedia, the free encyclopedia. Available at: http://www.Wikipe-dia.org/wiki/Uti - possidetis.

20-See: Raul R. Hensel. Michael E. Allison and Ahmed Khanani: The Colonial Legacy and Border Sta-bility: Uti Possdeties and Territorial Claims in the Americas. p. 7.

٢١- د.عبدالفتاح عبدالرزاق محمود: مصدر سابق، ص ٤٦٤.

bo avakirina dewletê têt bi kar anîn binpêkirina yek ji prensîpên esasî yên qanûna nêvdewletî ye, ew jî prensîpa qedexekirina hêzê ye di têkiliyên nêvdewletî de, herwekî di paragrafa çarê ya madeya didoyê ya deklarasyona Neteweyên Yekbûyî de îşaret pê hatî dan.

Piraniya qanûnzanan li ser neqanûnîbûna avakirina kiyanekê herêmî bi rêya bikaranîna hêzê hemfikir in[22], lê belê digel wê jî çênabe em wisa fêm bikin ko bikaranîna hêzê bi awayekê mitleq astengek e li hemberî prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê. Divêt mirov cidahiyê bêxe nêvbera bikaranîna hêzê di asta nêvxweyî ya dewletê de û bikaranîna hêzê di asta têkiliyên nêvdewletî de.[23]

Di rastiyê de paragrafa çarê ya madeya didoyê ya deklarasyona Neteweyên Yekbûyî ko taybet e ji bo qedexekirina bikaranîna hêzê, ne tenê ji bo têkiliyên nêvdewletî û haletên bikaranîna hêzê di nêvbera dewleta dayîk û herêma ko cida dibe de ye,[24] ji ber ya dawiyê dikeve çarçeweya mefhûma ”şerê nêvxweyî” û wekî meseleyeka nêvxweyî têt hesibandin û urfeka nêvdewletî jî nîne ko qedexe bike. Gelek biryarên nêvdewletî û biryarên meclisa giştî ya Neteweyên Yekbûyî rewatî dane xebata çekdarî ya ”gelên” di bin destê kolonyalîstan de. Nimûneya vê jî paragrafa dehê ya biryara meclisa giştî ya hejmara 2105-ê (XX) di sala 1965-ê de û madeya heftê ya pênaseya ”dijminahiyê” ya Neteweyên Yekbûyî ye.[25]

### D) Astenga ”mafên insanî” (ferdî yan giştî) li hemberî bikaranîna prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê

Çênabe ko mirov pişta xwe bi mafê biryardana-çarenivîsê girêbide û ji xwe re bike bingehekê cidabûnê û bike deklarasyona

٢٢- د.محمد عزيز شكري: المدخل الى القانون الدولي العام وقت السلم، ط٢، دار الفكر: دمشق، ١٩٧٣، ص١٣٢.

٢٣- د.عبدالفتاح عبدالرزاق محمود: مصدر سابق، ص ٤٧٠.

24-See: Thomas D. Musgrave. Op. Cit. P. 282.

٢٥- د.عبدالفتاح عبدالرزاق محمود: مصدر سابق، ص ٤٧٠.-

dewletê heger avakirina dewleta nû binpêkirineka xeternak ya mafên insanî yên ferdî û giştî bi xwe re bîne,[26] ji ber avakirina dewletê bi binpêkirina prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê di qanûna nêvdewletî de wekî karekê nerewa têt hesibandin. Her di vê çarçeweyê de jî di dema xwe de Cemiyeta Miletan hinek şert di heqê parastina mafên kêmneteweyan yên di dema bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê yê welatên ko multîetnîk û multîmezhebî ne danîn. Wekî qebûlkirina endametiya Iraqê di Cemiyeta Miletan de bi şertê ko Iraq sozê bide dê rêza mafên kurdan û qewmên dî bigire ko Iraq jê pêktêt.[27]

## **Baskê heftê:**
## *Spartek û hêcetên-heq ji bo bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê*

Ev haletên li jêrê dibin spartek û hêcetên-heq bo wê yekê ko ”gelek” mafê biryardana-çarenivîsa xwe bi kar bîne.

### A) Parastina aştî û emniyeta nêvdewletî

Parastina aştî û emniyeta nêvdewletî wekî yek ji armancên giring yên rêxistina Neteweyên Yekbûyî têt hesibandin. Lewra heger girêdaneka nakokiyê bi mafê biryardana-çarenivîsê ve hebe û îhtimala wê yekê jî hebe ko aştî û emniyeta nêvdewletî bêxe xeterê, hingê divêt Neteweyên Yekbûyî ji bo çareserkirina nakokiyê midaxeleyê bike. Ji bo wê mebestê jî dikare hemî metodan bi kar bîne û biryara pêwist bide ji bo hêsanîkirina bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê.[28]

---

26- Michael Akehurst. Op. Cit. p. 298.

٢٧- د.عبدالفتاح عبدالرزاق محمود: مصدر سابق، ص ٤٧٣.

٢٨- د.عبدالفتاح عبدالرزاق محمود: مصدر سابق، ص ٤٧٧.

**B) Hesasiyeta li hemberî tepeserkirinê**

Teoriya ”tepeserkirinê” (The oppression theory) yek ji teoriyên herî binavûdeng yên hêceta-heq ya cidabûnê ye da ”gelek” bikare bi rêya bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê qedera xwe diyar bike. Li gor vê teoriyê hêceta-heq ji cidabûna beşek ji niştecihên dewletekê yan kîmîneyekê re û serxwebûna wan ji dewleta dayîk heye ji ber ew bi destê piraniyê tên tepeser kirin.[29]

Ev teorî (remedial theory of secession), yek ji teoriyên çareserkirina cidabûnê ye ko li gor mantiqeka wiha hereket dike:

Erka hikûmetê ye ko mafên bingehî yên hemwelatiyan biparêze heta ko hemwelatî hest bikin ko hêjaye ew îtaeta biryarên hikûmetê bikin. Lê belê heger hikûmet bi rengekê organîzekirî û berdewam mafên wan binpê bike û dema hîç çareyeka dî jî nebe ji bo dawîlêanîna wê rewşa nenormal, hingê sebeb ji wan re heye jê xelas bibin û ji dewletê cida bibin. Lewra hingê dewlet nikare xwe bispêre prensîpa ”yekîtiya axê” û serxwebûna siyasî li dijî daxwaza cidabûnê wekî mafê biryardana-çarenivîsê[30], ji ber di wê rewşê de cidaxwaz pişta xwe bi wê îhtimalê girêdidin ko dibêje: ”Herçend dewletekê di bin sîwana qanûna nêvdewletî de rewayiya xwe wergirtibe û îsrara wê li ser xaka wê hebe jî, ew israra wê dewletê dikare bêt piştguh kirin û bêt pûç kirin li hemberî wê tepeserkirina berdewam ya ko ew li ser grupeka di nêv xwe de dike.”[31]

---

29- See: Y. N. Kly and D. Kly: In Pursuit of The Right to Self-Determination, Collected Papers & Pro-ceedings of the FIRST International Conference on the Right to Self-Determination & the United Nation, Geneva 2000. P. 1.

٣٠- الحاكم عبدالرحمن سليمان الزيباري: الوضع القانوني لإقليم كردستان العراق في ظل قواعد القانون الدولي العام، ط١، مؤسسة موكرياني للطباعة: اربيل، ٢٠٠٢، ص٣٥٥.

31- See: Brilmayer, L. 1991, "Secession And Self-Determination. A Territorial Interpretation, Yale Jour-nal of International Law 16. 177-202. And Moore، m. 1998, Introduction in Secession and National Self-Determination. M. Moore (ed) oxford: oxford university press. Quoted from: Stanford Encyclopedia of Philosophy. http://plato.stanford.edu/ entries/secession/

Tepeserkirin wekî hêceteka-heq ji bo mafê biryardana-çarenivîsê menayeka fireh heye: wekî sertewandin (subjugation), serdestî (domination) û jêxwarina-neheq (exploation). Li gor hinek zanayan bêbeşkirina grupekê yan kêmîneyekê ji şirîkatiya hikûmetê jî hêceteka-heq e ji bo bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê.[32]

Herwekî dadgeha bilind ya Kanadayê îtiraf pê kirî, dema herêma Quebekê daxwaza serxwebûnê li ser esasê mafê biryardana-çarenivîsê kir, dadgehê bal kişand ser du rewşan nenormal ko dikarin di çarçeweya mafê biryardana-çarenivîsê de bibin bingeh ji bo mafê cidabûnê: Rewşek ew e dema ko beşek ji niştecihên dewletê rûbirûyê tepeserkirinê bibin û rewşa dî jî ew e ko grupek nekare bibe şirîka desthilatê ji bo berdewamkirina pêşdeçûna xwe ya siyasî, aborî, civatî û kulturî. Di rewşeka dî de bin-komîteyeka Neteweyên Yekbûyî ya ji bo parastina li hemberî dîskrîmînasyona nijadî û pasatina kêmîneyan (United Nations Sub-Committee on the Prevention of Racial Discrimination and the Protection of Minorities) sala 1981-ê qenaeteka wisa diyar kir ko serxwebûn û serweriya dewletekê nabin rêgir li hemberî ciddabûna herêmekê yan beşekê ji dewletê heger bi wê cidabûnê dawî li binpêkirinên mafên insanî bêt anîn.

Lewra ji bo ko teoriya tepeserkirinê bibe hêceta-heq ji bo bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê divêt ew grupa daxwaza cidabûnê dike piştrast bike ko hêdî nikare di nêv emniyetê û aştiyê de bijît, yan jî nikare daxwazên xwe yên rewa di çarçeweya civata siyasî ya mezin de bi dest ve bîne. Û piştrast bike ko hemî rêûrêbazên siyasî yên dî ko dikarin mafên wan garantî bikin, ji aliyê piraniya serdest ve hatine red kirin. Wê grupê divêt ev şertên li xwarê hebin:[33]

32- Thomas D. Musgrave. Op. Cit. P. 182.

٣٣- د.عبدالفتاح عبدالرزاق محمود: مصدر سابق، ص ٤٨٤.

1. Ew grup îzbat bike ko ”gelek” e, ji ber tenê ”gel” dikarin prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê bi kar bînin.
2. Divêt ew grup ji aliyê piraniya serdest ve hatibe tepeser kirin ko hêdî bi rêya nûnerên xwe nekare bibe şirîka hikûmetê: sertewandin (subjugation), serdestî (domination) û jêxwarina-neheq (exploation)
3. Divêt ew grup îzbat bike ko hêdî nikare bi aştî û aramî di çarçeweya wê dewletê de bijît.
4. Heger dewlet bi xwe nekare rêûrêbazên ko dikarin mafên wê grupê garantî bikin bibîne, û hertim mafên wê grupê red bike.

Di rastiyê de rewşa gelê kurd ya piştî mişextîbûna giştî ya sala 1991-ê ko li dûv zêdetirî heftî salên êşê, tepeserkirinê, danserpiştê û derbederkirinê; û înkara hemî hikûmetên Iraqê ya li hemberî gelê kurd çêbû, dikarî bibe sebeba garantîkirina mafên gelê kurd wekî gelekê azad û cida, da hingê dewleta kurdî bihata îlan kirin ji ber ew rewşeka nimûneyî ya bêemsal bû û Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî jî bi biryara hejmara 688-ê ya pêncê nîsana 1991-ê îtiraf bi wê rewşê kir.

Ew tawanên ko hikûmetên Iraqê – wekî ko di deklarasyona federalîzmê ya Parlamentoya Kurdistanê ya çarê oktobera 1992-ê de biryar li ser hat dan – li hemberî gelê kurd kirine ev in:

• Windakirin û bêserûşonkirina zêdetirî 8 000 barzaniyên bêtawan di sala 1983-yê de ko heta niho jî piraniya wan serwindayî ne.

• Jenosîdkirina zêdetirî 5 000 jin, zarok û pîrên bêtawan bi sîlehên kimyayî û gaza jehrî li bajarê Helebceyê di roja 16-ê adara 1988-ê de, û hejmareka dî li Behdînan, Germiyan, Balîsan û deverên dî yên Kurdistanê.

• Kampanyayeka dî ya wekî wê ko bi hemî pîvanan tejî wêderê zilm, zordarî û dirindeyî tê de hat bi kar anîn bi navê ”Enfalê” hat kirin û zêdetirî 182 hezar hemwelatiyên kurd yên bêtawan tê de hatin kuştin yan jî bi zindî hatin binax kirin.

• Têkdan û jihalêrakirina zêdetirî 4 500 gundan ko dike ji % 90 gundên Kurdistanê.

• Kuştin, derbiderkirin û dûrxistina hezaran kurdên feylî, destbiserdegirtina mal û milkê wan ji ber sebebên siyasî û nijadperestiyê û standina hemwelatîbûna Iraqê ji wan.

### C) Nemimkinbûna pêkvejiyana aştiyane di çarçeweya dewletekê de

Di hinek rewşan de ew rûdanên xwînî ko di dirêjahiya tarîxa siyasî ya dewleteka belî de çêbûne, dibin sebebê êş û birîneka kûr li cem grupên cida û hesta dijminahiyê û rik û kînê li cem wan çêdikin heta digehî asteka wisa ko hêdî kes ji wan naxwaze û nemimkin e ko yê dî qebûl bike yan jî bi awayekê aştiyane pê re bijît. Di wan rewşan de pîvanên nêvdewletî yên taybet bi mafên insanî yên ferdî û kêmîneyî ko di peymannameyên nêvdewletî de derbas dibin; û çareseriyên li gor qanûna-esasî yên wekî otonomî û federaliyê jî têra çareserkirinê nakin û heta dibin asteng jî, hingê bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê dibe rêya tenê ji bo garantîkirina mafên grupên cida.[34]

### D) Mafên tarîxî

Mebest ji ”mafên tarîxî” wekî hêceteka-heq ji bo bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê ew maf in ko di realîteya tarîxî de

34. See: David A. Lake And Donald Rothchild. The International Spread of Ethnic Conflict, Fear, Dif-fusion, And Escalation. Princeton University Press: Princeton, Newjersey, 1998, P. 315.

îzbat kirine ko grupekê di tarîxa xwe ya borî de hikimdariya xwe kiriye lê belê ji ber hinek sebeban îro di çarçeweya tixûbên cografîk yên dewleteka dî de ye. Hinek lêkolîn nîşan didin ko zêdetirî nîvê grupên mezhebî ko di salên heştiyê yên sedsala borî de daxwaza wan ya serxwebûnê hebû ew grup bûn ko digotin wan di serdemeka tarîxê de hikimdarî li xwe kirine. [35]

Cihê îşaretpêdanê ye ko miletê kurd di tarîxa xwe ya berê de rengekê serxwebûnê hebû û di dema bapîrkalikên xwe de serbixwe bû. Lewra kurd gelek caran di projeyên avakirina dewleteka serbixwe de wekî hêceteka-heq ji bo daxwaza xwe ya bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê pişta xwe dispêrin mafên xwe yên tarîxî: [Wekî nimûne dewleta eyûbiyan, dewleta merwaniyan, dewleta şedadiyan û hemî mîrekiyên kurdan, Arif Zêrevan]. Di serdema nû de jî wekî nimûne dema ko Şerîf Paşa sala 1919-ê bi minasebeta Peymana Sevresê ji hevpeymanan re behsa daxwazên taybet yên Kurdistanê kir, bal kişand ser wê yekê ko wîlayeta Mûsilê ji Iraqê cida ye, niştecihên wê rojekê ji rojan xwe wekî beşek ji Iraqê nehesibandine û neketine bin rikêba serweriya Iraqê de.[36]

Mirov dibîne komîteya nêvdewletî ya taybet ji bo çareserkirina problema wîlayeta Mûsilê ko ji aliyê Cemiyeta Miletan ve hatibû ava kirin - piştî lêkolîna gelek kitêbên tarîxnivîsan, cografyazanan û erebên kevin û hejmareka zêde ya nexşeyên erebî û bi sedan nexşeyên ewropî ko di nêvbera sedsala şazdehê û sedsala bîstê de hatine çêkirin, û hemî kitêbên seyahên hemî serdeman û serkaniyên cografî û kitêbên cografî yên dibistanên nêvê li Misrê - ew rastî qebûl kir ko sê dever hebûn: Iraqa erebî, Cezîre û Kurdistan. Iraq li aliyê bakur ji Tikrîtê yan Çiyayê

٣٥- تيد روبرت جار: أقليات في خطر- ٢٣٠ أقلية في دراسة إحصائية وسياسية وإجتماعية، مراجعة وتقديم: د. رفعت سيد أحمد، تعريب: مجدي عبدالحكيم وسامية الشامي، ط١، مكتبة مدبولي: القاهرة، ١٩٩٥، ص١١٩.

٣٦- أنظر حول هذه المطاليب: الدكتور فاضل حسين: مشكلة الموصل، دراسة في الدبلوماسية العراقية - الانكليزية - التركية وفي الرأي العام، ط٣، مطبعة أشبيلية: بغداد، ١٩٧٧، ص ص٧٦-٧٧.

Hemrînê zêdetir neboriye. Herwiha komîteyê bal kişand ser wê yekê ko di hemî edebiyata cografî ya di serdema ”futuhatên îslamî yên erebî” de heta sala 1925-ê qet nehatiye nivîsandin û nehatiye wesif kirin ko devera wîlayeta Mûsilê rojekê ji rojan bûbe beşek ji Iraqê. Di dema berê de jî niştecihên wîlayeta Mûsilê bi wê nehesiyane ko Iraq navê welatê wan e.[37]

Lewra aşkera ye ko biryara komîteya nêvdewletî ya taybet ji bo lêkolîna problema wîlayeta Mûsilê û leziqandina Mûsilê bi Iraqê ve biryarek bû ko tenê bi çavê bergeha aborî li meseleyê tamaşa dikir. Çimko komîteyê bi aşkerayî got li gor bergeha aborî baştirîn çareserî ew e ko Mûsil bi Iraqê ve bêt leziqandin. Komîteyê got heger mirov li gor bergeha nijadî li meseleyê temaşa bike hingê divêt dewleteka kurdî ya serbixwe bêt ava kirin, ji ber ko kurd ji heştan pêncê nifûsa niştecihên wê wîlayetê pêktînin. Lewra em digehîn wê netîceyê ko komîteyê piştî pêşniyarkirina leziqandina wîlayeta Mûsilê bi Iraqê ve jî nekariye înkara wê rastiyê bike ko ew dever ji aliyê cografî û nijadî ve ji Iraqê cida ye. Di pêşniyarê bi xwe de jî ko Cemiyeta Miletan qebûl kiriye bal têt kişandin ser wê yekê ko divêt hikûmeta Brîtanyayê sozê bide dê piştî ko wîlayeta Mûsilê bi Iraqê ve bêt leziqandin jî garantiya parastina mafên kurdan di Iraqa nû de bide.[38]

## E) Jênepirsîna miletê herêmekê di heqê leziqandina herêma wî bi dewleteka dî ve

Prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê dibêje ko leziqandin yan biservekirina herêma miletekî bi herêma dewleteka dî ve çênabe bêt kirin heger bi rêya rapirsiyekê fikra niştecihên wê herêmê nehatibe girtin[39], ji ber hingê ew proses bi awayekê mitleq pûç

---

٣٧- الدكتور فاضل حسين ، المصدر السابق، ص٧٨.

٣٨- أنظر المصدر السابق، ص ص ١٧٣-١٧٤.

٣٩- د.عصام العطية: القانون الدولي العام، ط٦، وزارة التعليم العالي والبحث العلمي: بغداد، ٢٠٠١، ص٣٠٣.

dibe çimko ew wekî binpêkirinekê li hemberî prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê têt hesibandin. Lewra jênepirsîna miletekî di dema leziqandina wî bi dewleteka dî ve dibe hêceteka-heq ya qanûnî ji bo daxwaza mafê biryardana-çarenivîsê.[40]

Li vêderê divêt em bibêjin ko başûrê Kurdistanê (wîlayeta Mûsilê), li gor biryara komîteyeka nêvdewletî ko Cemiyeta Miletan sala 1926-ê pêkanîbû, bêyî çêkirina rapirsiyeka resmî di nêv niştecihên wîlayeta Mûsilê de ko piraniya wan kurd bûn bi Iraqê ve hat leziqandin. Ev jî dibe hêceteka-heq ya qanûnî ko mirov dikare li ser hêcetên-heq yên dî zêde bike dema ko kurd daxwaza bikaranîna mafê biryardana-çarenivîsê dikin.

## F) Binpêkirina deklarasyon yan qanûna-esasî ya avakirina yekîtiyeka federal

Federalî bi yekgirtineka dilxwaz ya dewletan yan herêman li ser wan esas û şertên ko hemî aliyan berê li ser li hev kirine pêktêt, ew jî di deklarasyon yan qanûna-esasî ya nû de têt nivîsandin. Vêca heger binpêkirineka beloq û xeternak li hemberî wan bingeh û şertan çêbe, ew dibe hêceteka-heq û xurt ji herêmên federal re da xwe ji yekgirtinê vekişînin û jê cida bibin.

Divêt em li vêderê îşaretê bi wê yekê bidin ko di dîbaceya qanûna-esasî ya Iraqa federal de ko sala 2005-ê bi rapirsiyekê hat qebûl kirin, hukmek heye bi awayekê zimnî (implicit) behsa wê yekê dike ko yekîtiya "gel" û serweriya Iraqê girêdayî rêzgirtina qanûna-esasî û pêbendbûna bi hukmên wê ve ye, û wiha dibêje: "Pêbendbûna bi vê qanûna-esasî ve yekgirtina dilxwaz ya gel, ax û serweriya Iraqê diparêze." Yanî pêbendnebûna bi vê qanûna-esasî ve yan binpêkirineka xeternak li ser qanûna-esasî, dibe hêceteka-heq li gor qanûna-esasî ji bo wan kesên ko zerermend

٤٠- د.عبدالفتاح عبدالرزاق محمود: مصدر سابق، ص ٤٩٢.

bûne û ew dikarin daxwaza hilweşandina yekgirtina heyî bikin.

Ji bilî wê binpêkirinê, di raporeka taybet de ko hinek şarezayên qanûna-esasî di sala 2017-ê de amade kiribû, hat piştrast kirin ko hikûmet û desthilata federal ya Iraqê heta hingê zêdetirî 60 caran madeyên qanûna-esasî yên ko têkiliya wan bi mafên miletê kurd yê li Iraqê ve hene, bi rengekê yekser yan neyekser binpê kirine yan jî piştguh kirine û tetbîq nekirine. Her di wê çarçeweyê de jî serkirdayetiya siyasî ya herêma Kurdistanê di gelek minasebetan de bal kişandiye ser vê realîteyê.

Di dawiyê de em pêwist dibînin ko behsa qenaeta îctîhadî ya Dadgeha Edaletê ya Nêvneteweyî (The International Court of Justice) ya di 22-yê tîrmeha 2010-ê de bikin ko bi minasebeta îlankirina serxwebûna Kosovayê ya ji aliyekî tenê ve (unilateral) dike ko bêyî rizamendiya Sirbistanê bû. Ev emsaleka giring ya nêvdewletî ye û wekî biserketineka mezin ji bo mafê biryardana-çarenivîsê têt hesibandin. Vê nimûneyê gelek nuqteyên minaqeşebar û cihê qenaetên guhortî di heqê mafê biryardana-çarenivîsê de dan aliyekî û ew berteref kirin. Dadgeha Edaletê ya Nêvneteweyî (The International Court of Justice) di wê biryara îctîhadî ya di heqê îlankirina serxwebûna yekalî ya Kosovayê de îtiraf bi van rastiyan kir:

1. Îlankirina serxwebûna Kosovayê ya yekalî li hemberî Sirbistanê, ne binpêkirineka hukmên qanûnên nêvdewletî ye.
2. Biryardana li ser mafê çarenivîsê wekî prensîp mafê hemî ”gelan” e û ne tenê ji bo ”gelekê” di bin destê kolonyalîstan de ye.
3. Biryardana li ser mafê çarenivîsê di ser prensîpa ”yekîtiya axê” (territorial integrity) re ye.

4. Prensîpa ”yekîtiya axê” wekî hêcetekê ji bo rêlibergirtina li cidabûnê têt bi kar anîn. Li gor qenaeta dadgehê ev prensîp tenê ji bo têkiliyên di nêvbera dewletan de ye û ne ji bo têkiliyên di nêvbera dewletekê û beşek ji ”gelê” wê de ye.
5. Îlankirina serxwebûnê di dewleteka federal de dikare ji-yekalî-ve be û pêwistî bi rizamendiya hikûmeta federal ya merkezî nîne.
6. Dadgehê îtiraf bi prensîpa cidabûnê (remedial secession) ya di dema nemimkinbûna pêkvejiyanê di nêv tixûbên yek dewletê de kir.

## BEŞA DIDOYÊ

### Binpêkirinên qanûna-esasî ya Iraqê: madeya 140-ê, qutkirina butçeya herêma Kurdistanê, meseleya petrol û gazê

### Baskê yekê:
*Madeya 140-ê*

Li vêderê em ronahiyê dixin ser rewşa deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê û madeya 140-ê ya qanûna-esasî û kar û pêngavên Komîteya binecihkirina madeya 140-ê ji dema avabûna wê ve heta dawiya sala 2012-ê. Û dê behsa wan faktoran bikin ko bûn sebebê jihevxistina karên komîteya madeya 140-ê. Ev bi xwe yek ji giringtirîn binpêkirinên heta niho yên qanûna-esasî ya Iraqê ne û hîç menayek ji bo şirîkatiya jidil di Iraqa nû de nehiştiye.

**Ya yekê: Avakirina Komîteya binecihkirina madeya 140-ê ya qanûna-esasî**

Di nehê tebaxa 2006-ê de bi biryara hejmara 46-ê komîteyek bi serokatiya rêzdar Haşim Şiblî hat ava kirin û paşê serokê wê hat guhortin û bû rêzdar Raid Fehmî. Di wê komîteyê de nûnerê hikûmeta herêma Kurdistanê, wezîrê Wezareta karûbarên deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê rêzdar doktor Mihemed Îhsan bû ko serokatiya desteyekê bi heman navî dikir. Wezîra jîngehê ya Iraqê ya wê demê banû Nermîn Osman jî cihgira serokê Komîteya binecihkirina madeya 140-ê ya qanûna-esasî bû û di heman demê de seroka komîteya malî ya komîteya madeya 140-ê jî bû.

Komîteya binecihkirina madeya 140-ê ya qanûna-esasî di dema xebata xwe de heft biryar derxistin ko çar ji wan ji bo çareserkirina problema deverên minaqeşebar biryarên gelek giring bûn. Giringtirîn biryarên ko ji bo normalîzekirina rewşa deverên kurdistanî derketin biryarên komîteya bilind ya madeya 140-ê bûn ko ji aliyê serokwezîriya Iraqê ve di 19/4 2007-ê de bi biryara hejmara Q2/1/27/6756 hat qebûl kirin:

1. Hemî ew karmendên ko ji tarîxa 17-ê tîrmeha 1968-ê heta 9/4 2003-yê ji kar hatine derxistin (fesil) yan hatine dûr xistin yan cihê karê wan hatine guhortin dê li cihên xwe yên eslî vegerin ser karên xwe, yan jî li cihekê nêzîkî deverên wan.
2. Ew familyeyên ko ji tarîxa 17-ê tîrmeha 1968-ê heta 9/4 2003-yê dest ji deverên xwe berdane yan ji ber siyaseta rejîma berê mişextî bûne, dê vegerin deverên xwe yên eslî û dê bên qerebû/tezmîn kirin.
3. Ew familyeyên ko ji tarîxa 17-ê tîrmeha 1968-ê heta 9/4 2003-yê hatine împort kirin bo cihekî dê bên vegerandin bo deverên xwe yên berê û bên qerebû/tezmîn kirin.

4. Hemî ew kontraktên ziraî/kiştûkal ko ji bo guhortina demografiyê li deverên minaqeşebar hatine îmza kirin, dê bên betal kirin ji bo vegerandina rewşê bo dema berî îmzakirina wan kontraktan.

Piştî temambûna mideta binecihkirina madeya 140-ê ya qanûna-esasî ko 31/12 2007 bû vêca UNAMI bi biryara hejmara 1770-yê ya Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî di sala 2007-ê de bû beşek yan terefa sêyê ya çareserkirina wan deverên minaqeşebar di nêvbera Bexdayê û Hewlêrê de û Staffan de Mistura serokatiya komîteya wê dosyayê dikir. UNAMI-yê ji aliyê xwe ve pişta xwe bi sê bingehan girêdida: 1) Qeydên nifûsê yên sala 1957-ê, 2) Biryarên Konseya serkirdayetiya şoreşa jihalêrabûyî [yên dema Sedam Hisênî] û karên ofîsa komîteya karûbarên bakaur ya hilweşiyayî û 3) Netîceyên hilbijartinên sala 2005-ê. Encama karê komîteya UNAMI-yê sê rapor bûn ko herdu alî jî (Bexda û Hewlêr) jê nerazî bûn.

Di sala 2011-ê de ew komîteya madeya 140-ê hat guhortin û vê carê wezîrê transportê yê Iraqê Hadî Amirî bi biryara dîwana serokwezîriyê ya hejmara 78-ê bû serokê komîteyê. Piştî wê guhortinê hemî karên ko berê hatibûn kirin rêya wan hat guhortin û berê meseleyê dan aliyekê dî.

# Erkên Komîteya binecihkirina madeya 140-ê

## QUNAXA YEKÊ:
## Normalîzekirina (el-tetbî‘) rewşa kesên jicihderxistî, sergumkirî, mişextî, penaber û erebên împortkirî

**1. Vegerandina jicihderxistiyan û hinartina erebên împortkirî bo cihên wan yên berê û qerebûkirina wan bi wî pereyê ko ji bo madeya 140-ê hatiye veqetandin. Diviya 2 milyar û 400 milyon dolar bihata veqetandin.**

Ji sala 2006-ê heta sala 2012-ê ew butçeya ko hatibû veqetandin bi vî rengê li xwarê hat dabeş kirin û ji bo qunaxa normalîzekirinê ew ji wê butçeya pêwist kêmtir bû û bû sebeba temamnekirina wê qunaxê:

**Kerkûk:**

a) Koma giştî ya wan kesên jicihderxistî ko nifûs û pusolaya wan ya xwarinê hatiye vegerandin bo Kerkûkê 89 634 kes in.

b) Koma giştî ya wan erebên împortkirî ko nifûs û pusolaya wan ya xwarinê ji Kerkûkê hat veguhostin bo cihên wan yên eslî yên berê 25 634 kes in.

**Xaneqîn:**

a) Koma giştî ya wan kesên jicihderxistî ko nifûs û pusolaya wan ya xwarinê hatiye vegerandin bo Xaneqînê 15 792 kes in.

b) Koma giştî ya wan erebên împortkirî ko nifûs û pusolaya wan ya xwarinê ji Xaneqînê hat veguhostin bo cihên wan yên eslî yên berê 1 547 kes in.

**Şingal**

**a**) Koma giştî ya wan kesên ko di nêv tixûbên ofîsa Şingalê de jicihderxistî ne (ofîsa Şingalê û deverên kurdistanî yên di nêv tixûbên wîlayeta Mûsilê de) ko wekî jicihderxistiyên nêvxweyî yên di nêv heman tixûban de tên hesibandin 91 977 kes in.

**b**) Koma giştî ya wan erebên împortkirî di nêv tixûbên ofîsa Şingalê de1 386 kes in.

**2. Kontraktên ziraî û hilweşandina biryarên "Konseya serkirdayetiya şoreşê ya nemayî" û koma wan biryarên ko "Komîteya karûbarên bakur ya nemayî" derxistî:**

Bi minasebeta biryara hejmara 358-ê ya sala 2011-ê serokwezîriya Iraqê di civîna xwe ya normal de 27-ê îlona 2011-ê bi biryara hejmara 47-ê ji Komîteya binecihkirina madeya 140-ê xwest ko bi hevkariya sekreteriya giştî ya serokwezîriyê raporekê ji bo serokwezîriyê amade bike û bila nûnerên van dezgehan tê de hebin: nûnerê wezareta bergiriyê, wezareta petrolê, wezareta daxilî, wezareta maliyê, wezareta ziraetê û heyeta daxwazkarên milkan. Mebest ji amadekirina vê raporê ew bû ko problemên dikevin nêv çarçeweya madeya 140-ê ya qanûna-esasî ya Iraqa federal de çareser bike. Piştî derketina wê biryarê gelek civîn hatin kirin û raporeka taybet ji bo çareserkirina van problemên li xwarê hat pêşkêş kirin bo serokwezîriyê.

**Netîceyên raporê bi vî rengî bûn:**

Biryara hejmara 29-ê ya sala 2012-ê hemî ew biryar û kontraktên ko Komîteya karûbarên bakur derxistibû û têkiliya wan bi problema erdên ziraî yên kesên neereb re hebû û mafê wan kesan yê ajotina wan erdan hebû hilweşand.

Biryara hejmara 30-ê ya sala 2012-ê ko hat pêşkêş kirin bo serokwezîriyê, xwest ko biryarên Konseya serkirdayetiya şoreşê ya nemayî bên hilweşandin û mesele dewrî Konseya Şûraya Dewletê bêt kirin û qanûn jê re bêt derxistin.

**A) Biryarên Komîteya karûbarên bakur ya nemayî:**

Di civîna normal ya serokwezîriya Iraqê ya 24-ê meha yekê sala 2012-ê de biryara hejmara 29-ê hat derxistin ko taybet ji bo hilweşandina (betalkirina) hemî biryarên Komîteya karûbarên bakur ya nemayî bû. Sekreteriya serokwezîriya Iraqa federal bi nivîsnameya hejmara 3129-ê ya 25-ê meha yekê ya sala 2012-ê ji hemî aliyên peywendîdar xwest ko nêveroka wê biryarê binecih bikin.

**B) Biryarên Konseya serkirdayetiya şoreşê ya nemayî:**

Di civîna normal ya çarê ya serokwezîriya Iraqê ya 24-ê meha yekê sala 2012-ê de biryara hejmara 30-ê ya sala 2012-ê hat derxistin ko bi raspartina Paralamentoya Iraqê bû. Bi wê biryarê hemî biryarên Konseya serkirdayetiya şoreşê ya nemayî hatin hilweşandin  Konseya Şûraya Dewletê hat raspartin da projeqanûnekê amade bike û ev biryar jî bi nivîsnameyeka sekreteriya serokwezîriya Iraqa federal ya hejmara 3101-ê di 25-ê meha yekê ya sala 2012-ê de hat rêkirin bo aliyên peywendîdar da bêt binecih kirin.

Bi qasî 1 miyon û 250 hezar donim [donimek = 2 500 metreçarçik] erdê ziraî yê wan deveran li xudanên wan yên eslî hat vegerandin ko di xişteya hejmara 2-yê û xişteya hejmara 3-yê de hatine nîşan dan. Lê belê ji ber temamnebûna hûrahiyên qanûnî li cem hikûmeta Iraqê ji bo pêkanîna vegerandina wan erdan, ew proses hat paşde dan û bi temamî nehat pêkanîn. Heta niho jî xudanên wan erdan li dûv çareserkirina vê meseleyê digerin û ji wan re nehatiye çareser kirin.

**C) Vegerandina hemî karmendên derxistî, dûrxistî yan veguhostî bo karên wan yên berê û deverên wan:**

- Wekî qunaxa yekê ji bo zêdetirî 1 626 karmendên jicihderxistî yên wan deveran biryara vegerandinê hat dan.
- Koma giştî ya wan karmendên ko pêwist e bên vegerandin bo deverên kurdistanî 2 262 kes in.
- Ew kesên ko ji bo vegerandina wan nivîsname ji serokwezîriya Iraqê re hatine rêkirin 1 626 kes in.
- Ew karmendên ko biryara vegerandinê ji bo wan derketiye 518 kes in.
- Ew karmendên ko dosyaya wan ya vegerandinê amade ne 634 kes in.

Ev proses bi temamî nehat binecih kirin ji ber hikûmeta merkezî razî nebû meaşê wan bide da li deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê biçin ser karê xwe. Hikûmeta merkezî xwest ko hikûmeta herêma Kurdistanê mesaşê wan ji butçeya xwe bide. Komîteya bilind ya binecihkirina madeya 140-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê sala 2011-ê ji serokwezîriya Iraqê xwest ko vê meseleyê safî bike.

**D) Pêşniyara guhortina tixûbên îdarî yên deverên minaqeşebar ji ber sebebên siyasî:**

Sala 2007-ê ji aliyê Komîteya binecihkirina madeya 140-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê ve reşnivîsa qanûnekê bi du nivîsnameyên nihênî yên hejmara 362-yê di 31-ê meha 12-ê ya sala 2007-ê de û ya hejmara 312-ê ya di 16-ê meha şeşê ya 2011-ê de hat amade

kirin. Ew herdu reşnivîs hatin rêkirin bo serokkomarê Iraqê û paşê serokkomarî bi nivîsnameya hejmara 2379-ê di sêyê meha yazdehê ya sala 2011-ê de ew wekî projeqanûn rêkir Parlamentoya Iraqê da qebûl bike.

Komîteya bilind ya binecihkirina madeya 140-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê di sala 2011-ê de daxwaz ji Parlamentoya Iraqê kir da minaqeşeyê li ser guhortina tixûbên îdarî yên deverên minaqeşebar yên ji ber sebebên siyasî bike û biryarê li ser wê projeqanûna ko serokkomarî rêkiribû parlamentoyê bide, lê belê heta niho pêngaveka pratîk ji bo wê projeqanûnê nehatiye avêtin.

## QUNAXA DIDOYÊ:
## Serjimêrî li deverên minaqeşebar (el-îhsa')

Pêwist bû piştî temamkirina qunaxa normalîzekirinê, serjimêriya giştî li wan deveran bêt kirin, amadekarî ji bo qunaxa sêyê bêt kirin ko rapirsî/referandum e. Divêt em bibêjin ko têkiliya vê serjimêriyê bi serjimêriya giştî ya Iraqê ve nîne. Hikûmeta Iraqê ji bo serjimêriya li van deveran hîç pêngavek neavêt û hêceta wê ew bû ko qunaxa normalîzekirinê temam nebûye, herçend heta sala 2012-ê ji bo normalîzekirinê pêngavên baş hatibûn avêtin jî. Di rapora dawiyê ya Komîteya binecihkirina madeya 140-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê de ko sala 2011-ê amade kiribû ev daxwaz ji serokwezîriya Iraqê û Parlamentoya Iraqê hatin kirin:

**a)** Derxistina qanûnekê û wergirtina tedbîrên pêwist ji aliyê serokwezîriya Iraqê û Parlamentoya Iraqê ve ji bo vê mebestê, û veqetandina butçeya pêwist ji bo pêkanîna serjimêriyê li Kerkûkê û wan deverên ko minaqeşe li ser heye.

**b)** Ji bo binecihkirina madeya 140-ê ya qanûna-esasî pêkanîna serjimêriyê li Kerkûkê û li wan deverên ko minaqeşe li ser heye, û herwiha amadekarî ji bo pêkanîna referandumê li wan deveran.

## QUNAXA SÊYÊ:
## Rapirsî/referandum (el-îstifta')

Di taliya sala 2007-ê de ji aliyê Komîteya binecihkirina madeya 140-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê ve û bi teşwîq û lidûvçûna nûnerên kurd yên di komîteyê de xebata pêwist digel komîsyona hilbijartinan hat kirin û bi awayekê nivîskî daxwaza xweamadekirinê ji bo pêkanîna referandumê li deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê kir. Lê belê ji ber sebebên siyasî ew proses hat rawestandin.

Komîteya binecihkirina madeya 140-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê sala 2011-ê daxwaz ji serokwezîriya Iraqê û Parlamentoya Iraqê kir ko projeqanûnekê amade bikin û tedbîrên pêwist wergirin ji bo pêkanîna referandumê li Kerkûkê û deverên minaqeşebar da xelkê wan deveran biryarê li ser viyana xwe bidin, lê belê heta niho hîç tiştek nehatiye kirin.

### **Ya didoyê:** Asta pêbendbûna hikûmetên Iraqê yên piştî sala 2003-yê bi pirsa çareserkirina deverên kurdistanî ve

#### Ya yekê: **Hikûmeta Eyad Ellawî**

Fermana dîwana serokwezîriyê ya hejmara 15-ê ko sala 2005-ê derket, mebest jê ew bû ko komîteyeka bilind bêt pêkanîn ji bo normalîzekirina reşa Kerkûkê û deverên dî yên kurdistanî. Lê belê ji ber ko temenê hikûmeta Eyad Ellawî zêde kurt bû tenê komîteyek bêyî nûnerê Kurdistanê hat ava kirin û hîç karek jî nekir.

**Ya didoyê: Hikûmeta Îbrahîm Ceferî**

Hikûmeta Îbrahîm Ceferî li hemberî binecihkirina madeya 140-ê tenê asteng çêkirin. Desttêwerdana dewletên herêmî jî beşek ji sebebên wê yekê bû ko nehişt hîç pêngavek bêt avêtin. Lê belê madeya 58-ê ya qanûna miweqet ya dema birêvebirina dewletê ya qunaxa veguhostinê, di madeya 140-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê ya 2005-ê de hat bi cih kirin.

**Ya sêyê: Siyaseta hikûmeta yekê ya Nûrî Malikî di salên 2006-2010-ê de**

Paragrafa 22-yê di programa hikûmeta Nûrî Malikî ya sala 2006-ê de:

”Hikûmet dê pêbenda binecihkirina madeya 140-ê ya qanûna-esasî be ko ew jî pişta xwe bi madeya 58-ê ya îdareya dewletê girêdide û ew jî ji sê qunaxan pêktêt: Normalîzekirin, serjimêrî û rapirsî/referandum li Kerkûkê û deverên dî yên minaqeşe li ser heyî. Herwiha çi dema ko hikûmet ava bibe dê pêngavên pêwist bavêje ji bo normalîzekirinê û vegerandina qeza û nehiyeyên ko berê di eslê xwe de li ser Kerkûkê bûn. Ev qunax dê heta 29-ê adara 2007-ê temam bibe û qunaxa serjimêriyê jî dê 31-ê tîrmeha 2007-ê destpê bike û qunaxa dawiyê ko referandum e ew jî dê 15-ê meha 11-ê sala 2007-ê bêt pêkanîn.”

**Yşa çarê: Siyaseta himûmeta didoyê ya Nûrî Malikî di salên 2010-2014-ê de**

Paragrafa yekê di programa hikûmeta koalîsyona niştimanî ya bi serokatiya Nûrî Malikî de (22/12 2010):

“Prastina qanûna-esasî ya Iraqê û pêbendbûna pê ve û xebitîn ji bo wan mijarên ko biryar li ser hatine dan. Her serastkirineka

di paşerojê de heger ne li gor madeya 142-yê ya qanûna-esasî be çênabe ko bêt kirin. Hemî made û paragrafên wan jî bêyî kêmî-û-zêdehî divêt bên aktîf kirin û çavdêrîkirina karê komîteyên pêkhatî jî dê li gor qanûna-esasî be û nemaze li gor madeya 140-ê be. Piştbestina bi sîxeyê qanûnî dê bingehê serekî yê karê hikûmetê be û çareserkirina nakokiyan û problemên hilawistîmayî jî dê her ser wî bingehî be. Hêzên siyasî û wezîrên hikûmetê jî dê pêbendê qanûna-esasî û programa hikûmetê bin ji ber nuqteya hevbeş û komker ya hêz û partiyên siyasî yên şirîkên hikûmetê ev e."

**Rola Hadî Amirî wekî serokê Komîteya madeya 140-ê di kabîneya didoyê ya Nûrî Malikî de:**

Guhortina hemî wan rêbazên ko diketin ber ehkamên madeya 140-ê û têkiliya wan bi qerebûkirina zerermendên li merkez û başûrê Iraqê ve hebû. Lewra di taliya sala 2011-ê de rêbazên nû hatin derxistin. Li gor wan rêbazan zerermendên ji tawanên bi destê rejîma berê ya Iraqê yên ji sala 1968-ê heta 2003-yê, (derxistî, jicihderkirî, mişextîkirî, mişextîbûyî û sergumkirî) ji kesên li herêma Kurdistanê jî digirt. Di destpêka sala 2012-ê de û li gor wan rêbazên nû li hersê wîlayetên herêma Kurdistanê miameleyên hemwelatiyên zerermend ji aliyê Komîteya binecihkirina madeya 140-ê ve hatin qebûl kirin. Li Hewlêrê 130 000 dosya, li Silêmaniyê 250 000 dosya û li Dihokê 139 000 dosya ko koma giştî dike 519 000 dosya hatin wergirtin. Lê belê ji ber ko serokwezîrê berê yê Iraqê Nûrî Malikî ji bo qerebûkirina xelkê herêma Kurdistanê rizamendiya xwe neda û bi nivîsnameyeka resmî îlan kir ko li Dihokê, Hewlêrê û Silêmaniyê ev tawan çênebûne û serokê Komîteya binecihkirina madeya 140-ê jî bi heman rengî qenaeta xwe diyar kir, rêgirî li pêkanîna vê qerebûkirinê hat kirin.

Hadî Amirî bi biryareka yekalî ofîsên peywendîdar yên Komîteya binecihkirina madeya 140-ê ko li Hewlêrê hebûn (wekî komîteya mihasiban û ya lêhûrbûna data û zanyariyan) daxistin û hemî karmendên ko li ofîsên li Hewlêrê kar dikirin jî derxistin. Hemî data û înformasyon û dosya jî neqlî Bexdayê kirin.

Hadî Amirî hîç desthilatek ji bo nûnerên kurd yên di Komîteya binecihkirina madeya 140-ê de nehişt û ew karên ko berê di komîteyê de bi lihevkirinê dihatin kirin nehişt û ew tenê bû biryarderê esasî yê komîteyê.

## Ya pêncê: Siyaseta hikûmeta Heyder Ebadî di salên 2014-2018-ê de:

Di programa hikûmeta Heyder Ebadî de lihevkirinek bi navê ”Deklarasyona lihevkirina siyasî ya di nêvbera grupên siyasî de” heye. Di paragrafa 18-ê ya wê lihevkirinê de wiha hatiye nivîsandin: ”Peydakirina çareseriyeka minasib ji bo problema Kerkûkê û hemî deverên ko minaqeşe li ser hene di çarçeweya madeya 140-ê ya qanûna-esasî de, ko bi rengekî aştbûna civakî û lihevkirina di nêvbera pêkhatiyan û niştecihan de biparêze.” Mideta diyarkirî jî salek e.

Li gor wê paragrafa programa hikûmeta Heyder Ebadî diviya di midetê salekê de karên madeya 140-ê bihatina temam kirin lê belê hîç pêngavek nehat avêtin.

Êrişên Daişê yên li ser deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê di sala 2014-ê de bû sebebê ko careka dî xelkê wan deveran mişextî bibin. Tawana jenosîdê û tawanên li dijî mirovayetiyê û tawanên şerî hatin kirin û mal û milkê xelkê eslî yê wan deveran hat şewitandin, hilweşandin û hat dagîr kirin. Nemaze jî li Şingalê û li deşta Mûsilê.

Ji nû ve careka dî rewşa wan deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê hat guhortin. Nemaze êrişên Heşda Şebî

û ordiya Iraqê di dema xiyaneta 16-ê oktobera 2017-ê de careka dî bûn sebebê mişextîbûna xelkê. Tawanên li dijî mirovayetiyê û tawanên şerî hatin kirin û mal û milkê xelkê eslî yê wan deveran hat şewitandin, hilweşandin û hat dagîr kirin. Nemaze li deverên kurdistanî yên wekî Dûzxurmato û Kerkûkê careka dî hewla erebkirinê hat dan.

## Baskê didoyê:
## *Qutkirina para herêma Kurdistanê ji butçeyê*

Li gor qanûna-esasî yek ji giringtirîn pêbendiyên dewletekê ew e ko bêyî ferqûcidahî jiyaneka qedirbilind ji hemî hemwelatiyên xwe re berdest bike. Ew jî bi rêya berdestkirina hatiniyeka pêwist ji bo dabînkirina xerciyên lazim di çarçeweya butçeya giştî ya dewletê de çêdibe. Hikûmet butçeyê berî serê sala malî amade dike û dide parlamentoyê- ko serkaniya desthilata xwe ya qanûnnivîsandinê ji miletî standiye-da wê butçeyê qebûl bike.

Ji ber yekîneyên ko dewletê pêktînin, wekî herêm û wîlayetan di warê malî de serbixwe ne, beşek ji hatiniya giştî ya federal ji bo herêman têt veqetandin. Ji wê dema ko qanûna-esasî ya Iraqê di sala 2005-ê de qebûl bû û pê ve, lihevkirin li ser wê çendê çêbû ko nisbeta para herêma Kurdistanê ji % 17-ê hemî ”xerciyên fê'lî yên hikûmî” û ji % 17-ê hemî ”xerciyên karê rojane” û ”xerciyên projeyên învestmentê” yên butçeya giştî ya Iraqê be, ko piştî qutkirina xerciyên serweriya dewletê bawerî pê têt dan.

Hemî qanûnên butçeya giştî ya federal salane îşaretê bi wê nisbeta para herêma Kurdistanê didin û hikûmeta Iraqê û Wezareta maliyeyê pêbend dikin ko wê butçeyê bidin. Lê belê kabîneyên hikûmeta Iraqê ji sala 2005-ê ve wê pêbendiya

qanûna-esasî binpê dikin û bi vî rengê li jêrê siyaseteka aborî ya kîndar û plankirî li dijî herêma Kurdistanê dimeşînin:

1. Daxistina nisbeta taybet ya herêma Kurdistanê. Di rewşa herî baş de jî para herêma Kurdistanê ti salan ji % 11-12-ê neboriye.

2. Cidakirina xerciyên serweriya dewletê ji xerciyên giştî û pişka herêma Kurdistanê. Zêdegavî di van xerciyên serweriya dewletê de. Lêzêdekirina beşên nû di xerciyên serweriya dewletê de. Di sala 2006-ê de hejmara warên xerciyên serweriya dewletê 16 bûn. Li gor paragrafa b-yê di madeya 13-ê ya qanûna butçeya giştî ya federal ya hejmara yekê ya sala 2006-ê de, warên xerciyên serweriya dewletê hatin zêde kirin û bûn 33. Bi zêdekirina qezenca deynan, hewaleyan û teqsîdên deynan hejmara wan waran bû 34. Li gor paragrafa didoyê ya madeya 18-ê ya qanûna butçeya giştî ya federal ya Komara Iraqê ya sala 2017-ê hejmara wan waran kirin 44.

3. Bêbeşkirina miletê Kurdistanê ji hêza aborî. Ji sibata 2014-ê ve qutkirina pişka herêma Kurdistanê ji butçeya giştî.

4. Kêmkirina pişka herêma Kurdistanê ji dermanan. Ji sala 2005-ê ve di rewşa herî baş de jî herêma Kurdistanê ji % 60-65-ê para xwe wergirtiye. Ji destpêka tişrînayekê ya sala 2016-ê ve jî herî pir ji % 25-30-ê para xwe wergirtiye.

5. Nedana pişka heq ya herêma Kurdistanê ji xerciyên eskerî yên serweriya dewletê ko heqê pêşmergeyên herêma Kurdistanê ye. Wezareta bergiriyê ya Iraqê para hêzên pêşmergeyên Kurdistanê, meaşên wan û mesrefên projeyên eskerî yên pêşmergeyan nade.

Qutkirina pişka herêma Kurdistanê ji butçeya giştî wekî binpêkirineka beloq ya teksta qanûna-esasî ya Iraqê têt hesibandin û bû sebebê hederkirineka zêde ya mafên aborî

û civatî yên hemwelatiyên herêma Kurdistanê ko qanûna-esasî heq dabûyê. Ev siyaset heta niho jî sebebekê esasî yê wê çendê ye ko hemwelatiyên herêma Kurdistanê ji qezenca mana digel çarçeweya dewleta Iraqê bêhêvî bibin. Nemaze piştî ko hikûmeta Iraqê nekarî wekî emrazeka parastina yekîtiya niştimanî ya Iraqê îstifadeyê ji qanûna-esasî wergire û mafên hemwelatiyên heqîqî yên Iraqê pê garantî bike.

**Mirov dikare giringtirîn nuqteyên qanûna-esasî ko bi siyaseta hikûmeta Iraqê hatin binpê kirin wiha rêz bike:**

1. Madeya pêncê ya qanûna-esasî: Ev made balê dikişîne ser serweriya qanûnê ko hikûmeta Iraqê ji sibata 2014-ê ve bi pêbendnebûna bi bendên wê yên verêkirina pişka herêma Kurdistanê ji butçeya giştî, binpê kirine. Û qutkirina butçeyê bi biryarên şexsî yên serokwezîrên Iraqê têt kirin.

2. Madeya 14-ê ya qanûna-esasî: Li gor vê madeyê hikûmeta Iraqê ferqûcidahî xistiye nêvbera hemwelatiyên herêma Kurdistanê û yên hemî beşên dî yên Iraqê de û serkaniya jiyana wan qut kiriye. Ev made dibêje hemwelatiyên iraqî wekhev in û çênabe ko ji ber sebebên nijadî û neteweyî ferqûcidahî di nêvbera wan de bêt kirin.

3. Madeya 25-ê û 26-ê yên qanûna-esasî: Hikûmetên Iraqê berovajiyê van herdu madeyan kiriye. Li gor bingehên aborî yên nû divêt hikûmeta Iraqê reforman di aboriya welatî de bike da învestmenta di hemî serkaniyên dahatê de teşwîq bike û hemahengiyê digel sektora prîvat bike û nemaze qîmetê bide pêşketina sermayegeriyê.

Hikûmeta Iraqê bileksê vê, bi qutkirina pişka herêma Kurdistanê ziyaneka mezin da aboriya herêma Kurdistanê û ticareta wê felişand ji ber piraniya karên ticarî yên li herêma Kurdistanê pişta xwe bi teqsîdên mehane girêdidin. Nemaze projeyên avakirinê, karê bankan û karên ticareta sûkê pişta xwe bi teqsîdên mehane girêdidin; vêca çi hikûmî bin yan ticarî bin yan karên şexsî bin.

Nedana teqsîdan û direnghiştina wan bûye sebebê felişandina ticaretê û di netîceyê de projeyên avakirinê îflas kirine û bazara kar jî tazî bûye çimko piraniya hemwelatiyên herêma Kurdistanê ji bo jiyana xwe ya rojane pişta xwe bi hikûmetê girêdidin. Ev jî bûye sebebê dûrketina sermayeyî û nemana învestmenta daxilî û ya xaricî.

4. Paragrafa yekê ya madeya 29-ê û paragrafa yekê û didoyê yên madeya 30-ê ya qanûna-esasî: Van paragrafan û madeyan hikûmet ji bo pêkanîna erkên wê yên li hemberî familyeyê pêbend kiriye. Familye bi rêya parastina hêjahiyên dînî, exlaqî û niştimanî bingeha civatê ye. Hikûmet pêbenda parastina rola dayîkbûnê, zarokbûnê, pîrbûnê, çavdêriya zarokên nûgihayî û ciwanan e û divêt rewşeka wisa ji wan re berdest bike heta ko ew bikarin şiyanên xwe û dahênana xwe pêşde bibin. Herwiha hikûmet pêbenda wê yekê ye ko hatiniyeka minasib ji bo her ferd û familyeyeka iraqî berdest bike, cihê niştecihbûnê ji wan re peyda bike û sîgortaya wan ya saxlemiyê çêke. Helbet ev pêbendî, wekî mafên civatî û aborî yên hemî ferd û familyeyan tên hesibandin. Hikûmeta Iraqê bi qutkirina pişka butçeya herêma Kurdistanê ev maf jî binpê kirin û netîceyên li xwarê jê derketin:

**a)** Piraniya familyeyan rûbirûyê nanqutkirinê bûn ji ber piraniya familyeyan ji bo debara xwe pişta xwe bi xizmeta giştî girêdidin. Ev jî bi aşkerayî binpêkirina paragrafa yekê ya madeya 30-ê ya qanûna-esasî ye ko hikûmetê bi dabînkirina hatineyeka minasib ji bo her ferd û familyeyekê pêbend dike.

**b)** Ev bûye sebebê gelek giriftên civatî; wekî pirtûbelavbûnê, hevduberdanê, barkirina serokê familyeyan û di hinek rewşan de bûye sebebê xwekuştinê û destdirêjkirina bo karên neqanûnî ji bo peydakirina qûtê xwe yê rojane.

**c)** Bilindbûna nisbeta bêkariyê di nêv ferdên civatê de li cem serokê familyeyan ji ber îflaskirina projeyên wan yên ticarî û îflaskirina şirketên wan û lawazbûna bazara rojane ya girêdayî aboriya wan ya lawaz; nemaze zêdebûna bêkariyê li cem mezûnên enstîtu û unîversîteyan. Li gor statîstîkên hikûmeta herêma Kurdistanê nisbeta bêkariyê di sala 2014-ê de ji % 7-ê neborî bû lê belê di sala 2017-ê de bûye ji % 15.

**d)** Dûrketina ciwanan ji zewacê û avakirina familyeyeka nû ji ber rewşa jiyan û aboriya wan ya xirab. Ji ber ko butçeya herêma Kurdistanê hat qut kirin hêdî hikûmeta herêma Kurdistanê jî pêşîneyên ji bo zewacê nade.

**h)** Bêbeşbûna kesên xudanên pêwistiyên taybet û kesên betal ji sîgortaya civatî û saxlemiyê ko ev jî li dijî paragrafa didoyê ya madeya 30-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê ye.

5. Paragrafa yekê ya madeya 31-ê ya qanûna-esasî: Vê madeyê, hikûmeta Iraqê bi wê yekê ve pêbend kiriye ko mafê hemwelatiyan yê kontrola saxlemiyê û saxlemiya giştî biparêze. Wezareta saxlemiyê ya herêma Kurdisatnê ji ber qutbûna pişka herêma Kurdistanê ji butçeya Iraqê û kêmbûna para dermanan nekarî pêwistiyên tibî yên nexweşxaneyan û dermanên pêwist peyda bike. Ew dermanên ko gehiştin herêma Kurdistanê jî di rewşa herî zêde de jî têra ji % 65-ê pêwistiyan nedikir. Digel ko wê demê herêma Kurdistanê himbêza xwe ji 1.8 milyon mişextî û penaberan re vekiribû. Herêma Kurdistanê hêvî dikir ko para wê bêt zêde kirin lê belê barê wê hêj pirtir hat giran kirin.

Li gor statîstîkên Wezareta saxlemiyê ya hikûmeta herêma Kurdistanê, hikûmeta herêmê ji tişrîna yekê ya sala 2016-ê heta hezîrana 2017-ê mesrefa çareserkirin û operasyonan ji bo 35 hezar mişextî, penaber û eskerên ordiya Iraqê temîn kir. Her di wê demê de, ji tişrîna yekê ya sala 2016-ê ve hikûmeta federal ya Iraqê para herêma Kurdistanê ya dermanan daxist heta ji % 25–30-ê. Divêt em balê bikişînin ser wê yekê ko paşê karesateka insanî û karesateka saxlemiyê çêbû ji ber wezîrê saxlemiyê yê Iraqê bi nivîsnameyekê daxwaz ji serokwezîriya Iraqê kir ko para herêma Kurdistanê ya dermanan qut bike, herçend xerciyên dermanan dikevin çarçeweya ”xerciyên fê‘lî yên hikûmî” yên dewletê de û divêt dewleta Iraqê li xwe bigire.

6. Madeya 32-yê ya qanûna-esasî: Hikûmeta Iraqê pêbendiyên xwe yên li gor qanûna-esasî pêkneanî û mafên kêmendaman (handîkap) û yên kesên xudanê pêwistiyên taybet û kesên pêwîstî bi rehabîlîtasyonê heyî da vegerin nêv civatê, binpê

kir. Ji ber qutkirina para herêma Kurdistanê ji butçeya Iraqê, hikûmeta herêmê mecbûr bû ko meaşê wan kesan kêm bike û nekarî pêwistiyên wan yên ji bo saxbûnê berdest bike.

**7.** Madeya 106-ê ya qanûna-esasî: Vê madeyê bi sê paragrafên xwe pêwîst dîtiye ko desteyeka giştî bêt ava kirin ji bo çavdêrîkirina hatiniyên hikûmeta federal da kontrola adilbûnê di dabeşkirina hîbeyên ji derve tên, arîkariya ji derve têt û deynên nêvdewletî yên ko ji Iraqê re tên de bike. Herwiha da ew deste kontrola pişka heq ya herêma Kurdistanê û wîlayetên Iraqê yên ko ne herêm in bike, û lêkolînê li ser bikaranîna serkaniyên malî û dabeşkirina wan bi rengê herî baş bike, da şefafbûn û edalet ji bo para herêman û wîlayetan bêt garantî kirin. Hikûmeta Iraqê ev made hemî felişandin û hîç qanûnek ji bo avakirina wê desteya kontrolê jî nehat derxistin.

**8.** Ji ber qutkirina para herêma Kurdistanê ji butçeya Iraqê, hemwelatiyên herêma Kurdistanê ji gelek mafên xwe yên li gor qanûna-esasî hatin bêpar kirin ko hinek ji wan mafan ev in:

a) **Madeya 33-yê:** Mafê her ferdekî yê jiyaneka saxlem (paragrafa yekê) heye. Parastina jîngehê, faunayê û pirrengiya zindiyên li ser erdê erkeka li ser milên dewletê (paragrafa didoyê) ye.

b) **Madeya 34-ê:** Ev made taybet e ji bo jihalêrakirina nexwendinê, teşwîqkirina lêkolînên zanistî, çavdêrîkirina biserketinên mirovan, îcadên nû, afirandinê û hemî rengên jêhatîbûna fikrî ya mirovan.

c) **Madeya 36-ê:** Ev made taybet e ji bo mafên ferdan yê sporkirinê û dewletê pêbend dike ko piştgiriya aktîvîteyên sporê bike û pêwistiyên lazim berdest bike.

d) **Madeya 132-yê:** Ev made behsa mafê çavdêriya familyeyên şehîdan, girtiyên siyasî û hemî wan kesên ko ji kiryarên rejîma Be'sê ya dîktator zerermend bûne dike. Li gor paragrafa yekê ya madeya 132-yê mafê şehîdan û zererdîtiyên ji kiryarên terorîst heye ko bên qerebû kirin.

## Baskê sêyê:
## *Têkçûna hikûmeta merkezî di birêvebirina pirsa petrol û gazê de*

Petrolê û gaza xwezayî di aboriya Iraqê de cihekê giring heye. Di qanûna-esasî ya sala 2005-ê de hinek madeyên taybet ji bo vê hene: wekî madeya 111-ê û ya 112-ê.

Madeya 111-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê balê dikişîne ser wê yekê ko petrol û gaz milkê "hemî iraqiyên" li hemî herêman û wîlayetan e.

Madeya 112-ê ya qanûna-esasî jî behsa produksiyon û birêvebirina dosyaya petrol û gazê dike ko divêt hikûmeta federal bi şirîkatiya digel hikûmetên herêman û wîlayetan bi rengekê adilane li ser bingehê nisbeta nifûsa wan dabeş bike. Yanî wîlayet û herêm divêt şirîkên desthilatdariya vê sektorê bin ji ber ev pişkeka giring ya hebûna dewleta federal ya Iraqê ye.

Lê belê ev made, nemaze paragrafa yekê ko tekîdê li ser şirîkatiya desthilatê di nêvbera hikûmeta merkezî, hikûmetên herêman û wîlayetan de dike baş nehatiye bi cih kirin. Sê sebebên vê hene:

**Sebebê yekê:** Di qunaxa berî roxiyana rejîma Be'sê de, yanî berî 2003-yê Iraqê di heqê petrolê û gazê de qanûneka yekgirtî nebû. Piştî jinûveavakirina dewleta Iraqê di 2003-yê de jî hikûmeta federal rê li ber derxistina qanûneka nû li ser esasê şirîkatiya niştimanî di nêvbera desthilata merkezî û desthilata herêmî de girt.

**Sebebê didoyê**: Sîstema berê ya aborî ya Iraqê li ser bingehê aboriyeka dîrîjekirî ya dewletê bû, yanî di bin desthilat û kontrola sîstemeka totalîter de bû. Qanûnên di heqê petrolê û gazê de jî dema hatine tetbîq kirin li gor wê sîstema totalîter hatine bi cih kirin. Lê belê sîstema aborî ya piştî sala 2003-yê li ser bingehê aboriya azad û vekirî ko berê xwe bide învestmenta biyanî hat ava kirin. Ev jî bû sebebê nelihevkirina qanûnên petrol û gazê yên berî sala 2003-yê û qanûnên piştî sala 2003-yê.

**Sebebê sêyê:** Li gor teksta qanûna esasî ya nû divêt "pirsa petrol û gazê bi şirîkatiya di nêvbera hikûmeta federal û hikûmetên herêman û wîlayetan de bêt meşandin, û hatiniya wê jî divêt bi rengekê adilane bêt dabeş kirin û pişka taybet ya herêman bêt temîn kirin". Ev mesele di qanûnên berê de nebû, lewra pêwist bû ko di qanûneka nû de bêt nivîsandin. Lê belê hemî hikûmetên Iraqê rêgirî li derxistina qanûneka nû ya petrolê û gazê kir û çarê tîrmeha sala 2007-ê wan nehişt ko rojeqanûna nû – ko behsa vê paragrafa qanûna-esasî dike – bêt pêşkêş kirin bo Parlamentoya Iraqê. Berê di 26-ê sibata 2007-ê de

jî ev projeqanûn hatibû pêşkêş kirin bo Parlamentoya Iraqê. Hikûmeta Iraqê hingê rê da Konseya Şûraya Dewletê – ko tenê wê desthilata serastkirin û nivîsandina qanûnan heye – da paragrafa yekê ya madeya 112-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê serast bike, herçend qanûna-esasî di meseleya petrolê û gazê de behsa şirîkatiyeka temam di nêvbera hikûmeta merkezî û hikûmeta herêmê de dike.

Niho, piştî derbasbûna 15 salan di ser qanûna-esasî ya Iraqê re, giringtirîn sektora aboriya niştimanî ya Iraqê ji ber kêmxemiya hikûmetên Iraqê û ji ber qebûlnekirina wan ya hikûmeta herêma Kurdistanê wekî şirîkeka xwe ya jidil, ew qanûn hêjî bi awayekê hiqûqî nehatiye derxistin û hêjî valahiyeka hiqûqî di vî warî de heye. Menaya vê jî ew e ko hikûmetên Iraqê ji hemî problemên qanûnî ko di warê kontraktên petrolê û gazê yên digel aliyên biyanî de derdikevin berpirs in. Bêguman hikûmeta federal ya Iraqê vê yekê bi zanîn dike da îtirafê bi mafê herêma Kurdistanê yê şirîkbûna di samanên niştimanî de neke. Herçend ev mafekê hemî hemwelatiyên herêma Kurdistanê ye û li gor madeya 111-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê jî herêma Kurdistanê yek ji xudanên petrol û gaza hemî Iraqê ye.

## BEŞA SÊYÊ

## Ravekirina biryarên Parlamentoya Iraqê û yên dadgeha bilind ya federal di heqê referanduma serxwebûna miletê Kurdistanê de

### Baskê yekê:

### *Ravekirina biryarên Parlamentoya Iraqê*

Miletê Kurdistanê di 25-ê îlona 2017-ê de, bi piraniya xwe bi nisbeta ji % 92-yê dengê ”Erê” ji bo serxwebûna Kurdistanê

da. Wekî netîceyeka vê referandumê Parlamentoya Iraqê roja çarşemê, 27-ê îlona 2017-ê di civîneka xwe ya normal de biryarek bi hejmara 23-yê derxist. Di vê biryarê de gelek dîrektîv hebûn û referanduma Kurdistanê jî wekî ”neqanûnî” bi nav kir û bal kişand ser madeya yekê ya qanûna-esasî.

Vêca heger em bi hûrî analîza vê biryarê û dîrektîvên Parlamentoya Iraqê bikin em dê bibînin ko ev biryar ji aliyê nêverokê û dirûvê xwe ve ji terefgiriyê ne dûr e û naşibihe biryara parlamentoyekê ko temsîla miletên welatekî bike ko sîstema desthilatê tê de sîstemeka federal be. Ji bilî vê jî, biryar bi xwe bi eqliyeteka ”terefgir” û ”fanatîk” hatiye nivîsandin.

Heger em hemî aliyên biryara 27-ê îlonê bi rengekê qanûnî rave bikin em dê bibînin ko di vê biryarê de bi ti rengî behsa her neh paragrafên madeya 61-ê ya qanûna-esasî nehatiye kirin ka aya desthilata Parlamentoya Iraqê heye dîrekt yan endîrekt ”biryaran” derxe. Parlamentoya Iraqê nikare ”xwezayeka qanûnî” yan ”guhortineka qanûnî” ji bo rewşekê yan realîteyekê çêke ko berê bûye û çûye.

Ev têbîniyeka giştî bû li ser biryara Parlamentoya Iraqê. Lê belê heger em bi van nimûneyên li xwarê hinek dîrektîvên ko di biryarê de hene rave bikin, em dê bibînin ko ew dîrektîv ne li gor qanûna-esasî ya Iraqê ne:

**Ya yekê:** Di nuqteya yekê ya biryarê de têt gotin ko bila ”qumandarê giştî yê hêzên çekdar bêt mecbûr kirin ko hemî tedbîrên pêwist bistîne da yekparçetiya axa Iraqê biparêze”. Bi awayekê pir aşkera ev pêxistina lempeya kesk bû da ew hêza eskerî li hemberî Kurdistanê bi kar bîne. Belgeya vê jî rûdanên 16-ê oktoberê bûn, dema ko yekîneyên eskerî yên ordiya Iraqê digel mîlîsên Heşda Şe‘bî êrişî Kerkûkê û deverên dî kirin. Her

bi wan êrişan jî ranewestiyan û êrişî wan deverên kurdistanî yên ko li gor qanûna-esasî ya Iraqê ”deverên minaqeşebar” in jî kirin û heta berê êrişên xwe dan Hewlêra paytexta herêma Kurdistanê û deverên li dorûbera Dihokê jî. Pêşmergeyên Kurdistanê li bajarokê Altunkopru û li Sihêlan bi qehremanî bedena wan êişan girt. Ev kiryarên ordiya Iraqê li dijî paragrafa yekê ya madeya nehê ya qanûna-esasî ya Iraqê bûn ji ber ew bikaranîna hêzên çekdar di tepeserkirina miletî de qedexe dike.

**Ya didoyê:** Di nuqteya didoyê ya vê biryara Parlamentoya Iraqê de hîç hesabek ji bo prensîpa cidakirina desthilatan ko prensîpeka qanûna-esasî û cîhanî ye nehatiye kirin. Û ”desthilata qanûnnivîs” ko parlamento ye xwe xist cihê ”desthilata dadgêriyê” ko dadgeh in û xwest ko berpirsên herêma Kurdistanê bên ceza kirin. Ev dûrî prensîpa qanûnî ya ko dibêje ”ti cirm nînin heger qanûnek jê re nebe”. Parlamentoya Iraqê xwe xist şona dadgehê û got referandum ”tawanek” bû.

**Ya sêyê:** Di nuqteya çarê ya vê biryara Parlamentoya Iraqê de têt xwestin ko tixûb li ser herêma Kurdistanê bên girtin û rê li ber împortkirina xwarinê, dermanan, pêwistiyên jinan û zarokan û hemî xelkê vê herêmê bêt girtin û heger malek bêt împort kirin jî wekî ”qaçax” bêt hesibandin. Di heqîqetê de ev paragraf ji hemî prensîpên mirovayetiyê û hemî prensîpên dînî û exlaqî jî dûr e, ji ber parlamentoyek biryarê dide ko miletê welatekî bêt birsî kirin.

**Ya çarê:** Parlamentoya Iraqê di nuqteya heftê ya vê biryarê de daxwazê ji hikûmeta federal dike ko hişdariyê bide konsolosxane û nûnerayetiyên wan welatên ko ofîsên wan li herêma Kurdistanê

hene da konsolosxane û nûnerayetiyên xwe bigirin û veguhozin bo cihekê li derveyî herêma Kurdistanê. Parlamentoya Iraqê bi vê biryarê di warê dîplomasiyê de jî tarîxeka xirab ji xwe re çêkir ji ber ev reftar ji hemî prensîpan û etîka dîplomasiyê dûr e. Herêma Kurdistanê aramtirîn devera li Iraqê ye û dema ko ew konsolosxane ofîsên xwe neqlî derveyî herêma Kurdistanê bikin ew dê bikevin bin xetera ewlekariyê de.

**Ya pêncê:** Parlamentoya Iraqê di nuqteya dehê ya vê biryarê de daxwazê dike ko kesên jicihderxistî bên vegerandin ser cihên xwe. Ev jî îşareteka endîrekt e ji bo ko ew kar bi zorê bêt kirin, herçend herêma Kurdistanê bi şahidiya hemî organîzasyonên nêvdewletî, ambasadoran û konsolosan aramtirîn devera dewleta Iraqê ye û hertim cihê pêkvejiyanê bûye û ferqûcidahiya nijadî, mezhebî, û dînî nekiriye. Piştî têkçûna rewşa Iraqê û derketina şerê mezhebî û peydabûna rêxistinên terorîst yên wekî El-Qaideyê û Daişê bi sedan hezaran mişextî û jicihderxistiyan ji nêva Iraqê berê xwe dan herêma Kurdistanê da starekê ji xwe re bibînin. Sebebê vê jî ew e ko hikûmeta federal ya Iraqê nekarî jiyaneka aram di vê mideta dûrûdirêj de ji bo hemwelatiyên xwe temîn bike.

**Ya şeşê:** Di nuqteya 13-ê ya biryara Parlamentoya Iraqê de mefên herî kêm yên hemwelatiyan tên binpê kirin. Ev nuqte bi zelalî li dijî hemî mafên sivîl û siyasî yên ko madeya 14-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê îşaret pêdayî ne. Ev nuqte hemî rengên diyalogê digel aliyên herêma Kurdistanê red dike û dibêje ”aliyên kurdî” û nabêje ”aliyên herêma Kurdistanê” herçend herêma Kurdistanê li gor madeya 117-ê ya qanûna-esasî herêmeka meşrû ye.

Parlamentoya Iraqê desthilatek daye xwe ko eslen heqê wê yê wê dethilatê nîne heta ew rabe û li ser bingehekê qanûnî dîrektîvekê bide hikûmetê da van tedbîran wekî biryarekê li hemberî herêma Kurdistanê bi cih bike. Çimko li gor biryareka dadgeha federal ya Iraqê ya hejmara 140/141 ya sala 2018-ê pir bi zelalî îşaret bi wê yekê têt dan ko Parlamentoya Iraqê desthilata ”derxistina biryaran” nîne.

## Baskê didoyê:

### *Analîzkirina biryara dadgeha bilind ya federal*

Piştî ko referanduma serxwebûna Kurdistanê di 25-ê îlona 2017-ê de çêbû û vê referandumê meşrûiyeta ji xelkê bi dest xist – meşrûiyeteka ko pişta xwe dispêre îradeya miletekî û tenê daxwaza biryardana-çarenivîsa xwe dike û hemî peymanname û deklarasyonên cîhanî jî tekîdê li ser wî mafî dikin – cardî jî bi eqlieyetka şovenîst çar doznameyên edlî li hemberî referanduma serxwebûna herêma Kurdistanê hatin pêşkêşkirin bo dadgeha bilind ya federal û wê dadgehê 20-ê meha 11-ê ya 2017-ê bi hukmên hejmara 89-ê, 91-ê, 92-yê û 93-yê hinek biryar dan ko tê de wiha dibêje:

> ”Fermana herêmî ya hejmara 106-ê ya nehê hezîrana 2017-ê ko taybet e ji bo diyarkirina tarîxa pêkanîna referandumê di 25-ê îlona 2017-ê de li herêma Kurdistanê û deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê, ji bo cidabûna ji Iraqê û avakirina dewleteka serbixwe li herêma Kurdistanê û deverên dî yên ko referandum lê hatiye kirin,

hîç bingehekê xwesipartinê di qanûna-esasî de nîne û li dijî madeya yekê ya qanûna-esasî ya Iraqê ye."

Herwiha di dawiya hukmê biryara dadageha bilind ya federal de îşaret bi vê yekê têt kirin:

> "Ew referanduma ko li herêma Kurdistanê û deverên dî ko ketine ber referandumê di 25-ê îlona 2017-ê de hat kirin, biryar li ser hat dan ko ne li gor qanûna-esasî bû û biryar hat dan ko hemî netîceyên wê referandumê bên hilweşandin û betal kirin."

Heger em li hikmê vê biryara dadgeha bilind ya federal temaşa bikin û bi rengekê qanûnî û li gor hîmên ko di teksta qanûnê de hene rave bikin, em dê bibînin ko hikmê vê biryarê pişta xwe spartiye madeya yekê û madeya 109-ê yên qanûna-esasî ya Iraqê û ew herdu made ji xwe re kirine senedên qanûnî. Lê belê dema ko em temaşeyî nêveroka van herdu madeyên qanûna-esasî bikin em dê bibînin ko ev herdu made behsa serweriya Iraqê û yekparçetiya axa Iraqê dikin. Ew made bi aşkerayî nabêje ko cidabûna ji Iraqê yan parçekirina axa Iraqê yan jî referandum karekê qedexekirî ye. Yanî dadageha federal bi wan herdu madeyan pişta xwe bi menayeka "teng ya çêkirî" girêdaye.

Vêca heger biryara dadgeha bilind ya federal ne "biryareka vebir" bûya mirov dikarî îtirazê lêbike û bibêje ew herdu madeyên qanûna-esasî ko dadgehê pişta xwe spartiyê bi awayekê zelal referandumê qedexe nakin. Ew menaya ko dadgehê jê derxistiye tenê ravekeka wan herdu madeyan û hinek madeyên dî ye û mirov dikare ravekên dî jî li wan madeyan bike.

Dîbaceya qanûna-esasî ya Iraqê jî hat piştguh kirin ji ber ew îşaretê bi wê çendê dide ko yekparçetiya axa Iraqê girêdayî tetbîqkirina qanûna-esasî ya Iraqê ye. Pir zelal û aşkera ye ko dezgehên desthilata federal hertim xwe ji tetbîqkirina madeyên

qanûna-esasî dane aliyekî. Herêma Kurdistanê berî referandumê daxuyaniyeka qanûnî da hikûmeta federal û hemî ambasad û konsolosxaneyên li Iraqê û li herêma Kurdistanê û got ko dezgehên desthilata federal 63 madeyên qanûna-esasî ya Iraqê binpê kirine û li gor wan madeyan hereket nekirine.

Çênabe em wê yekê ji bîr bikin ko ev biryara dadgeha bilind ya federal di bin zorlêkirina hikûmeta federal ya wê demê de derket û ji nivîsandina biryarê bi xwe diyar dibe ko lezûbez lê hatiye kirin. Diviya dadgeha federal ji bo parastina hebûna xwe wekî desthilateka bêteref û edaletperwer ji bo hemî kesan û hemî aliyan, xwe ji derxistina biryareka bi vî rengî dûr bigirta.

**Wekî netîce:**

Di lêkolîna me ya berê de ji bo me aşkera bû ko mafê biryardana-çarenivîsê mafek e ko ji bo hemî ”gelan” hatiye qebûl kirin heger şertên ”gelbûnê” tê de hebin, vêca çi ew ”gel” gehiştibe serxwebûnê û bûbe dewlet yan ne. Bi heman awayî herêmên dewletên federal jî mafê biryardana-çarenivîsê ji bo cidabûna ji dewleta dayîk heye heger şertên ”gelbûnê” di xelkê wê de hebin. Dibe ko ”gel” bi rengekê aştiyane ko referandum rêya herî bikarhatî ya wê ye biryarê li ser çarenivîsa xwe bide. Û heger metoda aştiyane jê re nehat qebûl kirin dibe ko bi bikaranîna hêzê û xebata çekdarî wî mafî bi kar bîne.

Herwiha ji me re aşkera bû ko mafê biryardana-çarenivîsê ji niho ve bûye urfeka nêvdewletî ya di hukmê qanûnê de û qenaeta îctihada Dadgeha Edaletê ya Nêvneteweyî ya 22-yê tîrmeha 2010-ê di heqê îlankirina serxwebûna yekterefî ya Kosovayê li hemberî Sirbistanê di 17-ê sibata 2008-ê de yek ji nimûneyên naskirî ye ko wekî biserketineka mezin ji bo mafê biryardana-çarenivîsê têt hesibandin. Wê biryarê îtiraf bi wê rastiyê kir ko

îlankirina serxwebûnê ya yekterefî ya ”gelan” ne binpêkirina ehkamên hiqûqa nêvdewletî ye û biryardan li ser mafê çarenivîsê wekî prensîp mafê hemî ”gelekî” ye û ne tenê ji bo ”gelên” di bin serdestiya kolonyalîstan de ye, û biryardana li ser mafê çarenivîsê di ser prensîpa parastina ”yekîtiya axê” ya dewletan re ye. Prensîpa ”yekîtiya axê” tenê wekî hêceteka neheq ji bo rêlibergirtina cidabûnê têt bi kar anîn. Li gor qeaneta dadgehê ev prensîp ji bo têkiliyên di nêvbera dewletan de ye û ne ji bo têiliyên di nêvbera dewletekî û beşek ji ”gelê” wê de ye. Îlankirina serxwebûnê di dewleteka federal de dikare yekterefî be û pêwistî bi rizamendiya dewleta federal ya merkezî nîne. Dadgehê îtiraf bi wê yekê kir ko prensîpa cidabûna îlacî (remedial secession) dikare bêt bi kar anîn dema ko bihevrejiyan hêdî ne mimkin be.

Di warê qanûna-esasî de jî me dît ko madeya 140-ê ya qanûna-esasî ya Iraqê bûye yek ji wan madeyên çareserkirina problema deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê û berpirsiyariya qunaxên çareserkirina van deveran  ji normalîzekirin, serjimêrî û rapirsî/referandumê pêk tên û erka li ser milên hikûmeta federal e. Bi rexmê destpêkirina qunaxa normalîzekirinê û hewldana ji bo çareserkirina problema erebkirinê û hewldana ji bo çareserkirina guhortina demografiyê û hewldana ji bo çareserkirina guhortina tixûbên îdarî yên deverên kurdistanî û vegerandina mişextiyan; sala 2012-ê bi biryareka siyasî karên Komîteya binecihkirina madeya 140-ê hatin felişandin û piştî 16-ê oktobera 2017-ê careka dî prosesa erebkirinê û mişextîkirina hemwelatiyên kurd li deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê destpê kir û dest bi ser erdên ziraî yên xelkê de hat girtin û ew dever ji aliyê ordiya Iraqê û Heşda Şebî ve hatin dagîr kirin.

Ji sala 2014-ê ve para butçeyê ya herêma Kurdistanê bi biryareka siyasî hat ragirtin û prosesa ablokekirinê û givaştinên siyasî li hemberî herêma Kurdistanê hat meşandin. Di heman

demê de problemeka dî ya ko tesîrê li ser îstiqrar, pêkvejiyan û jinûveavakirina welatî dike dabeşnekirina adilane ya hatinî û serwet û samanên welatî ye ko heta niho hikûmeta Iraqê hewl nedaye bingehekê qanûnî di çarçeweya sîstema federal de jê re dane, da problema petrolê û gazê û şirîkatiya herêman û wîlayetan digel hikûmeta federal çareser bike.

Ji biryara Paralamentoya Iraqê û biryara dadgeha bilind ya federal ya Iraqê di heqê referanduma herêma Kurdistanê de, ji me re ew yek aşkera bû ko herdu biryar ji seqetî û valahiyên qanûnî ne berî ne û heger dezgehek hebe ko îtirazê li van herdu biryaran bike dikare ew herdu biryar ji ber wan seqetî û valahiyên qanûnî bên hilweşandin. Ji bilî aliyê seqet yê qanûnî yê herdu biryaran, terefgirî jî di wan de heye. Yanî Parlamentoya Iraqê û dadgeha bilind ya federal bi reftarên xwe yên li hemberî referanduma serxwebûna Kurdistanê bêterefbûna xwe neparastin.

# Teksta deklarasyona dawiyê ya konferansa opozîsyona Iraqê li Londonê

17-12-2002

Konferansa opozîsyona Iraqê ko roja sêşemê, 15-ê kanûna-yekê ya sala 2002-yê li Londonê dawî li karê xwe anî biryar li ser belgenameyeka (deklarasyoneka) dehrûperî ya bi navê ”Deklarasyona siyasî ya konferansa opozîsyona Iraqê” da û ev jî teksta wê beyannameyê ye:

”Bi navê Xwedê yê mezin û mihreban!

**Deklarasyona siyasî ya konferansa opozîsyona Iraqê**

14–15-ê kanûna-yekê ya sala 2002-yê

Ji ber zilma xweferzkirî ya rejîma dîktator ya nijadperest û mezhebî, ji ber tepeserkirin û terorîzma wê, ji ber serkêşiya wê ya şerên di nêv welatî û li derveyî welatî de, eve zêdetirî sê dehsalan e Iraq di tarîxa xwe ya siyasî ya modern de di xirabtirîn qunaxên xwe de dibore.

Di dirêjiya vê midetê de gelê Iraqê bi xebat, têkoşîn û zincîreyeka hewlên mêrxasane lêxebitî ko dawiyê bi vê rewşa bêemsal bîne ko rejîma zilimkar li ser miletên me ferz kiribû. Di vê lêxebitînê de gelek qehremanên şerefmend yên hêzên çekdar, hêzên siyasî û millî ji hemî çîn û tebeqeyên civata neteweyî, bi dîn û mezhebên xwe ve; û bi baskên cida yên opozîsyona çekdarî ve ko hewla serhildana mezin ya adara 1991-ê dabûn, beşdarî xebata liberxwedana meşrû bûn. Di wê serhildana 1991-ê de bi milyonan iraqiyên ji kesên sivîl û esker; ji ereb, kurd, tirkmen, aşûrî, şîî û sunî beşdarî kir û mijûlê wê yekê bûn ko rejîmê bêxin zibilxaneya tarîxê de ji ber rejîm tenê layiqa wêderê bû. Lê belê bi rexmê hecma zêde ya wan qurbanên ko hatin dan û xwîna ko hat rijandin, rewşeka li derveyî viyan û îradeya miletê me, rê li ber bidestxistina viyana iraqiyan û jinûveavakirina welatê wan li ser bingehê demokrasî, edalet û aştiyê girt.

Îro jî careka dî bi piştgiriya hinek faktorên nêvdewletî, ji bo roxandina rejîma faşîst û pêkanîna operasyoneka guhortinê firset ji gelê me yê Iraqê re çêbûye û mecrayên nû û hevbeş berdest dibin. Roxandina rejîmê qezenceka niştimanî ye û di berjewendiya miletê me, welatên cîran, welatên erebî û îslamî û civata nêvdewletî de ye.

Ji bo vê armancê konferansa opozîsyona Iraqê ko piraniya hêz, bask û şexsiyetên opozîsyona niştimanî tê de beşdar in, di bin slogana ”Ji bo rizgarkirina Iraqê û pêkanîna demokrasiyê!” di 14–15-ê kanûna-yekê ya sala 2002-yê de li Londonê çêbû û israrê li ser prensîp û biryarên esasî yên konferans û civînên berê yên opozîsyonê dike, nemaze biryarên konferansa 1992-yê ya li Selahedînê [li herêma Kurdistanê] û dîskursa siyasî ya serdana heyeta opozîsyonê li Washingtonê di tebaxa 2002-yê de.

## Li ser wî bingehî konferans van biryar û dîrektîvên li xwarê îlan dike:

**1. Rola opozîsyona Iraqê di operasyona guhortinê de**

Amadebûyiyên konferansê îtirafê bi rola sereke ya opozîsyona niştimanî – bi hemî bask, organîzasyon, pêkhatiyên cida û xelkê miletê me ve – di guhortinên li seranserê saheya cografî ya Iraqê û hemî qunaxên operasyona guhortina çaverêkirî dikin û divêt ew guhortin digel xwezaya rewşa meydanî û şiyanên heyî bigunce.

**2. Paşeroja Iraqê û demokrasî**

Iraq (ji bo hemî iraqiyan) dewleteka demokratîk, parlamenterî, pluralîst û federal e û pişta xwe bi mefhûma mirovatiyê, medeniyetê û hemwelatîbûna di Iraqeka nûavakirî de girêdide ko dê li ser bingehê ferqûcidanekirina ji ber esil yan dîn, yan nijad, yan mezhebî ava bibe. Konferans israrê li ser nivîsandina qanûnake-esasî ya nû ji bo welatî dike ko tê de rewşa pêkhatiyên gelên Iraqê hatibe raçav kirin û "desthilata qanûnnivîs", "desthilata bicihker" û "desthilata dadgêriyê" ji hev hatibin cida kirin, û pêbendî bi serweriya qanûnê û parastina mafên mirovî û azadiyên giştî û ferdî hebe û rêz ji dezgehên civata sivîl re bêt girtin.

**3. Îslam dînê dewletê ye**

Dînê îslamê yek ji bingehên saxlem yên dewleta Iraqê ye û şerîeta îslamê jî yek ji serkaniyên esasî yên qanûnnivîsandinê

ye. Herwiha konferans tekîdê li ser pêwistiya pêbendbûna bi hêjahî û prensîpên pîroz yên dînê îslamê dike. Û konferans di heman demê de tekîdê li ser giringiya program û dersên kultur, enformasyon û programên perwerdeyê û rêzgirtina li hemî dînên asîmanî û bîrûbaweriyên dî dike.

### 4. Dewleta qanûnê

Amadebûyiyên konferansê li ser wê yekê hemfikir in ko cihê kaosê, tolstandinê û hemî rengên dî yên binpêkirinên neqanûnî ko xwe li ser Iraqa paşerojê ferz bikin nîne, vêca bi çi hêcetê û çi sebebî jî be heger tişteka wisa qewimî divêt ”desthilata dadgêriyê” û qanûn tedbîrên lazim ji bo çareserkirina wan hemî rewşan wergirin; wekî çawa ”desthilata dadgêriyê” û qanûnên nêvxweyî û yên nêvdewletî yên taybet lê temaşa dikin. Û divêt lêkolîn di heqê hemî binpêkirinên li hemberî sivîlan çêdibin bên kirin: wekî destdanîna li ser maf û milkê xelkê û tawanên normal û tawanên siyasî û ew tawanên ko delîlên saxlem û piştraskirî di heqê wan de hene; û tawanên nijadî, jenosîd û tawanên şerî.

### 5. Biryara siyasî

Konferans hemfikir bû ko divêt hemî pêkhatiyên ”gelên” Iraqê bi ereb, kurd, tirkmen, aşûrî, kildanî, û yên dî ve; û bi misilman, şîî, sunî, xiristiyan, êzdî û bawermendên dînên asîmanî ve, di nivîsadina biryarên siyasî de beşdar bin.

### 6. Redkirina hemî midaxeleyên ko di operasyona guhortinê de bibin sebebê tecawizê li hemberî îradeya gelên Iraqê

Ji bo rizgarbûna ji rejîma dîktatorî, konferans daxwazê ji civata nêvdewletî dike ko piştgiriyê li ”gelên” Iraqê bike û di heman demê de konferans hemî rengên kolonyalîzmê, yan hikmê eskerî yê xwemalî û biyanî, yan wesayeta derve yan desttêwerdanên herêmî

red dike. Konferans tekîdê li serweriya Iraqê û serxwebûna welatên cîran û prensîpên cîrantiyê û hevkariya herêmî û desttêwernedana li karûbarên nêvxweyî û deklarasyonên ko ji aliyê civata nêvdewletî ve îtiraf pê hatine kirin dike; û berî hemiyan jî tekîdê li ser mîsaqa Neteweyên Yekbûyî û deklarasyona gerdunî ya mafên mirovî û hemî wan deklarasyonên ko têkilî bi wan mafan ve hene dike. Konferans pêbendbûna xwe bi mîsaqa Komkara Welatên Erebî û Teşkîlata Konferansa Îslamî ve diyar dike.

**7. Problemên mezhebî û safikirina şonwarên wê**

Di hemî qunaxên borî de şîiyên Iraqê wekî kesên ji mezhebên dî, nemaze di bin sîwana rejîma niho de rûbirûyê zilm, zordarî û vederkirinê bûne û hemî mafên wan yên medenî, siyasî, aborî, kulturî, civatî û mezhebî hatine xwarin. Ev jî bû sebebê têkdana balansa civatî û wê siyasetê yekîtiya niştimanî û ruhê brayetiyê û lêborînê bi aliyekê xeternak de bir. Siyaseta tepeserker ya ji aliyê dezgehên taybet ve û metodên hîleûpîleyan û direwkirinê û manewrayên ji bo bindestkirina civata Iraqê bi hemî çîn û neteweyên wê ve ko piraniya wê civatê şîî bûn, bû sebebê wê çendê ko gelên Iraqê yek ji giringtirîn faktorên xweparastinê û liberxwedanê ji dest bide û firset ji bo wê yekê çêbû ko siyaseta dîktaror, nijadperest û mezhebgir hemî iraqiyan bindest bike.

Lewra konferans wisa hizir dike ko divêt lez li nehiştina hemî siyaseta mezhebgir bêt girtin û ew bêt qedexe kirin, û divêt çavdêrî li hemî mafên meşrû yên şîiyan ko hatine binpê kirin bêt kirin. Konferans hemî rengên vê siyaseta qirêj protesto dike ji ber wê siyasetê rêza merceiyet û hewzeyên ilmî yên şîiyan negirt û destkarî di karûbarên wan de kir û ew dorpêç kirin û ew wekî ”pêgirtiyên” xwe hesibandin. Konferans kuştina merceên dînî û xizmên wan û zanayên

dînî, û zîndankirin û şkencekirina bi hezaran kesên dî ko li vêderê mecal nîne em navên wan bibêjin, protesto dike.

Di heman demê de konferans siyaseta destdirêjiyê li mafên dezgeh û hewzeya dînî yên li Necefê û bajarên pîroz yên dî û wêrankirina mizgeftan û Huseyniye û merkezên wan yên îslamî û kitêbxaneyan, û herwiha qedexekirina kitêban û ferzkirina sansorê li ser wan kitêban û rênedana pîrozkirina minasebet û merasimên mezhebî û wêrankirina gund, bajarok û malên şîiyan; û bêavhiştina deverên wan, jicihderxistina wan û anîna kesên biyanî ji welatên dî û niştecihkirina wan li ser axa şîiyan; û afirandina gumanê li ser pêgiriya şîiyên Iraqê bi koka wan ya erebî û iraqî ve û afirandina gumanê li ser niştimanîbûna wan, red dike. Zêdebarî vê jî konferans siyaseta berê ya jicihderxistina şîiyên neereb yên Iraqê [wekî kurdên feylî] û înkarkirina iraqîbûna wan û bêparhiştina wan ji hemwelatîbûna Iraqê û destgirêdana xortên wan û zeftkirina mal û milkên wan, protesto dike. Qenaeta konferansê ew e ko divêt qanûna-esasî ya nû ya Iraqê bibe garantora dubarenebûna kiryarên bi vî rengî û bêyî ferqûcidahî hemî pêkhatiyên Iraqê biparêze.

### 8. Kampanyayên komkujiyê, Helebce û Enfal

Konferans wê sitem, zilm, vederkirin û tepeserkirina ko bi awayekê plankirî ji aliyê rejîma nijadperest ya Sedam ve di heqê gelê Kurdistana Iraqê de hat kirin protesto dike: nemaze kampanyaya jenosîdê û operasyona Enfalê ya navxirab ko tê de 180 hezar hemwelatî hatin bêserûşon kirin û heşt hezar barzanî, pênc hezar feylî û pênc hezar kesên niştecihên Helebceyê hatin qetil kirin. Konferans herwiha wêrankirina bi hezaran gundan û bajarokan û hemî wan karên ko wijdana cîhanê hejand protesto dike.

Konferans daxwaza nehiştina vê siyaseta şidetê ya li hemberî gelê kurd dike û di heman demê de tekîdê li ser aşkerakirina qedera wan kesên ko bûne qurban û rêzgirtinê li ruhê wan û qerebûkirina zerer û ziyanên mezin yên kesûkarên wan dike. Herwiha konferans daxwaza jinûveavakirina wan hemî avahiyên ko ji aliyê rejîmê ve hatin wêran kirin dike û divêt xebat li ser wê yekê bêt kirin ko failên wan kiryaran bên teslîm kirin bo dadgehên nêvdewletî.

**9. Mişextîkirin, paqijiya etnîkî û guhortina heqîqeta neteweyî**

Konferans mişextîkirina bi darê zorê, paqijiya etnîkî, bikaranîna çekên kimyayî û guhortina nasnameya heqîqeta neteweyî ya devera Kerkûkê, Mexmûrê, Xaneqînê, Şingalê, Şêxanê, Zumarê, Mendeliyê û deverên dî yên wekî wan protesto dike û herwiha konferans bi pêkanîna van tedbîrên li jêrê daxwaza nehiştina şonwarên wê siyasetê dike:

a) Vegerandina mişextîkiriyan li warên wan û lêvegerandina milk û malê wan û qerebûkirina wê zerer û ziyana ko gehiştiye wan.
b) Paşdevegerandina wan mihacirên ko hikûmetê ji cihên dî anîne û li van deverên ko li jorê behsê hat kirin bi cih kirine.
c) Vegerandina kurdên feylî û wan hemî iraqiyên ko bi hêceta ko goya bi eslê xwe îranî ne û hatine derxistin. Divêt careka dî mafê hemwelatîbûnê li wan kesên ko bi neheqî ji aliyê hikûmetê ve hemwelatîbûna wan jê hatiye standin bêt vegerandin û herwiha divêt mal û milkê wan jî lê bêt vegerandin û ew ziyana ko li wan bûye jî bêt qerebû kirin. Herwiha divêt qedera wan feyliyên ko di meha nîsana 1980-yê de hatin desteser kirin bêt aşkera kirin.

d) Divêt ew hemî tedbîrên îdarî yên ko rejîmê sala 1968-ê wergirtin bên betal kirin ji ber armanca wan tedbîran guhortina demografiya heqîqî ya Kurdistana Iraqê bû.

**10. Federalîzm û çareserkirina doza kurdan**

Dema ko konferans lêkolînê li ser doza kurdan û formên daxwaza wan ya çareserkirineka ko ew dibijêrin dike divêt em piştrast bikin ko civata Iraqê ji aliyê neteweyî, mezhebî û siyasî ve pirreng û pluralîst e. Konferans di heqê giringiya qayîmkirin û xurtkirina yekîtiya niştimanî bi rêya pêkanîna wekheviyeka temam di nêvbera hemî hemwelatiyan de hemfikir e. Divêt îtibar bi hemî paragraf û biryarên konferansa Selahedînê/Pîrmamê û yên hemî konferansên dî yên opozîsyona Iraqê û axaftinên siyasî yên civînên serkirdayetiya opozîsyonê li Washingtonê di meha tebaxa 2002-yê de û îtibar bi wê projeya Parlamentoya Niştimanî ya Kurdistanê di civîna heftê novembera 2002-yê de biryar li ser dayî, bêt kirin.

Konferansê rêz ji bo gelê Kurdistanê û îradeya wî ya azad di bijartina formê minasib de ji bo şirîkatiya digel zarokên welatekê yekgirtî heye. Konferans li ser tecribeya sîstema federal rawestiya û qenaeta konferansê ew e ko alternatîva minasib ji bo hikimdariya li Iraqê divêt piştî roxandina rejîma dîkatorî ya Sedam û pêkanîna guhortinên çaverêkirî çêbe û divêt federalîzm wekî bingehekê ji bo çareserkirina doza kurdan di çarçeweya dezgeh û qanûna-esasî ya Iraqê de bêt tesbît kirin.

Konferans israrê li ser yekîtiya Iraqê û pêkvejiyana neteweyên wê li ser esasê yekîtiyeka dilxwaz dike. Civînê viyana xwe ji bo pêkanîna daxwazên meşrû û heq yên gelê Kurdistanê û nehiştina hemî dirûvên zordestiyê û zilmê nîşan da, û îtirafê bi mafê biryardana-çarenivîsê yê li gor qanûnên nêvdewletî û piştgiriya ruhê brayetiyê, yekîtiyê û şirîkatiya niştimanî dike.

**11. Mafên tirkmenan**

Konferansê minaqeşeya wê vederkirin û zilma neteweyî û mezhebî ko li hemberî tirkmenan çêbûye kir û israr li ser garantîkirina nehiştina vederkirinê û qebûlkirina mafên wan yên neteweyî, kulturî û îdarî yên meşrû kir û divêt ew di çarçeweya formekê qanûnî yê diyarkirî de be û di qanûna-esasî de parastî be.

**12. Mafên aşûriyan**

Konferansê lêkolîn li ser wê zilm û zordariyê kir ko li aşûriyan hatiye kirin û biryara garantîkirina wekheviyê û mafên neteweyî, kulturî û îdarî yên meşrû yên wan da ko divêt bi awayekê qanûnî û diyarkirî di qanûna-esasî de parastî be.

**13. Felaketa deverên avzêm yên Iraqê**

Deverên avzêm rûbirûyê felaketeka insanî û jîngehî bûn û rûberekê berfireh yê wan deveran hişkûziwa bûn û bi temamî hatin wêran kirin û serkaniya wan ya jiyanê hat qut kirin. Ji ber wê hişkûziwabûnê bi hezaran hemawelatî ji cihên xwe hatin derxistin. Divêt deshilata nû çavdêrike baş li rewşa wan deveran bike û niştecihên ji wan deverena vegerîne û qerebû bike. Divêt arîkariya pêwist ji bo wan bêt kirin da ew dever ji nû ve vejîn û bingehê jiyanê ji bo xelkê wan deveran bêt ava kirin.

**14. Qanûn û biryarên neqanûnî**

Konferans daxwaza tevizandin û paşê jî nehiştina wan hemî qanûn û biryarên nijadperest û mezhebperest yên nelirê dike ko rejîmê li dijî kurd, tirkmen, aşûrî, û şîiyan derxistibûn.

**15. Tecribeya herêma Kurdistanê**

Konferans tecribeya herêma Kurdistana Iraqê di warê azadî, demokrasî û jinûveavakirinê de bilind dinirxîne û qenaeta

konferansê ew e ko ev tecribe belgeya wê çendê ye heger iraqî ji dîktatoriyê rizgar bibin dikarin pêngavên gelek mezin bavêjin. Qenaeta konferansê ew e ko divêt îstifade ji wê tecribeya biserketî bêt wergirtin û wekî pêngaveka pêşketî ya li ser rêya guhortinê û demokrasiyê ji bo Iraqa çaverêkirî bêt nîşan dan; û hemî nakokiyên siyasî bi rêya diyaloga brayane û dûrketina ji şidetê bên çareser kirin.

Konferans daxwaza baştirkirina vê tecribeyê, piştgirîkirina wê û danûstandinê digel dezgehên wê yên qanûnî û hilbijartî dike heta ko qanûna-esasî ya nû ya demokratîk û federal ji bo hemî welatî – herêma Kurdistanê jî daxil – têt amade kirin. Konferans herwiha daxwaza tevlîkirina yekîneyên pêşmergeyan digel hêzên çekdar yên Iraqê dike.

### 16. Dezgehên emnî

Konferans siyaseta rejîmê ya komkuştina bi hezaran kesên iraqî û jihalêrakirina bi hezaran hemwelatiyan û kadroyên siyasî û kesên zana û efserên ordiyê protesto dike. Konferans israrê li ser giringiya aşkerakirina rastiya wan qetlîaman û peydakirina tawankar û berpirsên wan kiryaran û mehkemekirina wan dike.

Konferans wisa hizir dike û pêwîst jî dibîne ew hemî dezgehên tepeserkirinê ko rejîmê ji bo zilm û zordariya li hemwelatiyan ava kiribûn ji halê bên rakirin. Divêt careka dî ji nû ve ew dezgehên emnî bên ava kirin û ew dezgeh rêzê ji qanûnan, mafên hemwelatiyan û mafên insanan re bigirin û ewlekariya welatî jî li gor qanûnan biparêzin.

### 17. Ordî û hêzên çekdar

Amadebûyiyên konferansê israr li ser giringiya jinûveavakirina dezgeh û rêxistinên eskerî û hêzên çekdar yên Iraqê kir ko bi rengekê meslekî, niştimanî û saxlem bin; û

civatê mîlîtarîze nekin û xwe tevlî rikeberiyên siyasî yên daxilî nekin û ferqûcidahiyê nexin nêvbera netewe û mezhebên cida de. Konferans hemî projeyên çêkirina sîlehên komkuj û bikaranîna hemî sîlehên ko ji aliyê civata nêvdewletî ve hatine qedexe kirin red dike. Divêt ordî ji bikaranîna şidetê di meseleyên daxilî de dûr be û dijminên xaricî ji xwe re çêneke. Erka ordiyê parastin û jinûveavakirina niştimanê ye.

**18. Rewşa aborî û nehiştina şonwarên du şerên wêranker**

Konferans berpirsiyariya bêistiqrarî û têkçûna rewşa aborî û ewlekariya civatê dixe stoyê rejîma niho de ji ber wê rejîmê bi rêya wêrankirin û mişextîkirinê gelek milyon kesên weledên vî welatî ji cihên wan derxistin û berê wan da welatên derve. Konferans spasiya welatên dost û ezîz dike ji ber wan welatan ew mişextî vehewandin û cihekê jiyanê bo wan peyda kir û arîkariya wan kir.

Herwiha konferansberpirsiyariya exlaqî û qanûnî û tarîxî ya afirandina şerî li dijî dewletên cîran yên wekî Îranê û Kuwêtê dixe stoyê rejîma Sedam de û daxwaza arîkariyê ji van herdu welatên cîran dike ko êxsîr û girtiyên di destê wan de berdin û dawiyê li şonwarên wê qunaxa nexweş bînin. Konferans garantiya wê çendê dide ko axa Iraqê ji bo destdirêjiya li hemberî welatên dî neyêt bi kar anîn.

Di heman demê de konferans berpirsiyariya danîna ablokayê û cezayên aborî li ser Iarqê dixe stoyê rejîma niho û daxwazê ji civata nêvdewletî û welatên cîran dike ko bi rengekê berpirsiyarane danûstandinê digel desthilata nû bikin û arîkariya wê bikin da dawiyê li vê rewşa nenormal bîne û hemî şondewsên kirinên wê li gor biryarên Neteweyên Yekbûyî ji halê rake; da Iraq careka dî bikare vegere nêv himbêza civata nêvdewletî û herêmî û bikare bi aştî û aramiyê bijît.

Konferans daxwazê ji civata nêvdewletî, welatên dost û dezgeh û rêxistinên nêvdewletî dike bi rêya projeyeka saxlem ya piralî ko gelek alî dê tê de beşdar bibin, di qunaxa veguhostina desthilatê de arîkariya Iraqê bikin da ew bikare ji vê rewşa nenormal ya ko gelên Iraqê tê de dijîn derbas bibe.

**Di vî warî de konferans tekîdê li ser wergirtina van tedbîran dike:**

a)Komkirina meblexeka zêde ya hatiniyê ji Iraqê û ji aliyên nêvdewletî û herêmî.

b)Rê bidin Iraqê ko bikare bi kapasîteya xwe ya herî mezin petrolê îxrac bike.

c)Danûstandin digel wan aliyên ko deyn dane Iraqê bên kirin da çareyekê ji problema deynan û wan tezmînatên ko ketine ser milên Iraqê re bibînin.

d) Daxwaz ji civata nêvdewletî bêt kirin, nemaze ji welatên dost, da xebatê ji bo serbestberdana pereyên Iraqê yên blokekirî bikin û arîkariya wê çendê bikin ko serwet û samana Sedam û kesên dorûbera wî û şirketên wan yên xeyalî û hesabên wan yên bankeyan li hemî welatan bên aşkera kirin û dest bêt danîn ser wan hesab û serwetan ji ber ew beşek ji serwet û samanê miletê Iraqê ne.

e) Konferans daxwazê ji desthilata nû dike ko careka dî pêdeçûnekê li ser wan hemî kontraktên ticarî û aborî yên petrolê bike ko Iraqê ji tebaxa 1990-ê ve bi welatan û şirketan re îmza kirine. Divêt bêt kontrol kirin ka ew çiqasê qanûnî ne û ka çiqasê li gor berjewendiyên Iraqê hatine îmza kirin.

f) Konferans nemaze daxwazê ji desthilata nû dike ko ji bo azadkirina êxsîr û girtiyên herdu aliyan û nehiştina şondewsên negatîv yên digel Îranê û Kuwêtê arîkar be.

**19. Programa petrol li hemberî xwarinê**

Konferans pêwist dibîne ko programa petrol li hemberî xwarinê bêt parastin ji ber bi rêya wê programê xwarin û derman tên peyda kirin û bingehê jiyanê ji bo xelkê Iraqê têt temîn kirin. Divêt xebat li ser çareserkirina aliyên negatîv yên wê programê bêt kirin heta ko careka dî lêkolîn di heqê biryarên Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî yên di vî warî de têt kirin û heta desthilata nû programeka minasib ji bo miletî û nemaze ji bo kesên ji tebeqeya feqîr û kêmîmkan re amade dike da bibe sebebê jiyaneka xweştir. Û divêt berhemên vê programê bi awayekê adilane li ser hemî deverên welatî û herêman bên dabeş kirin.

**20. Qanûneka nû ji bo hemwelatîbûnê**

Amadebûyiyên konferansê biryar da ko pêwistî bi nivîsandina qanûneka insanî ya modern di heqê hemwelatîbûnê de heye û divêt hemî rengên senifandina hemwelatîbûnê û astengên li ber hemwelatîbûnê bên rakirin ji ber bi hezaran kesên xelkê Iraqê ji nasnameya xwe ya niştimanî hatine bêbeş kirin. Û piştî roxandina rejîma niho divêt xebat ji bo vegerandina wan kesan bo Iraqê bêt kirin û hemî şondewsên negatîv yên wan tedbîrên bi darê zorê û neinsanî ji halê bên rakirin.

**21. Rêxweşkirin ji bo vegeriyana mişextîkiriyan, mişextîbûyiyan û penaberên iraqî**

Amadebûyiyên konferansê biryar da ko pêwist e her di cih de ji aliyê desthilata miweqet ve rêxweşkirin ji bo vegerandina bi

milyonan kesên mişextîkirî, mişextîbûyî û penaberên iraqî yên li sergumê bêt çêkirin û pêwistiyên wan yên esasî bên temîn kirin da ew û familyeyên xwe bikarin bi hêsanî vegerin û beşdariyê di prosesa jinûveavakirina niştimana xwe de bikin; û divêt mal û milkê wan li wan bêt vegerandin û ziyanên wan bên qerebû kirin.

**22. Rola şiyanên akademîk û ilmî**

Konferans baş dibîne ko piştî roxiyana rejîma niho hemî akademîsyen û kesên taybetmend û ew hemî alimên iraqî ko xudanê şiyan û dîplomayên bilind yên ilmî bin şarezahî û şiyanên xwe yên di warên cida de bêxin xizmeta amadekirina planeka pêşketinê bo niho û paşerojê.

Konferans rêzê ji şehîdên azadiyê yên li Iraqê re digire û piştgiriya xwe ji bo bi dehan hezar girtiyên siyasî ko eve gelek sal in digel familyeyên xwe di zîndanan de ne, îlan dike

Herwiha konferans rêzê ji bo xelkê me yê li Iraqê û yên li ser her bosteka axa welatî digire û şehnaziyê bi ruhê liberxwedanê yê miletê me dike ko li hemberî siyaseta rejîmê ya henekpêkirinê û sozên wê yên sexte ji bo azadkirina girtiyan radiwestin. Em ji miletê xwe re dibêjin dema azadbûna wan nêzîk e.

Li xwarê em lîsteya endamên ”Komîteya çavdêriyê û hemahengiyê” belav dikin ko ji aliyê konferansa opozîsyona Iraqê ve di taliya roja sêyê ya karên konferansê de li Londonê biryar li ser hat dan. Ew 65 kes in û paşê navên dî jî lê hatin zêde kirin:

1. Îbrahîm Hemûdî
2. Ehmed Çelebî
3. Eqîd Ehmed Elî Muhsîn
4. Ekrem Hekîm

5. Elbêrt Yelda
6. Eyad Samerayî
7. Eyad Ellawî
8. Eyhem Samerayî
9. Xatû Beyan Erecî
10. Beyan Cebir
11. Tofîq Yasirî
12. Celal Talebanî
13. Cuneyd Menko
14. Cewad Etar
15. Cewher Namiq
16. Hatem Muxlîs
17. Hatem Şelan Ebulcûn
18. Hacim Huseynî
19. Hamîd Beyatî
20. Husên Cibûrî
21. Husên Şelan
22. Husên Şamî
23. Reza Cewad Teqî
24. Xatû Siwad Kerîmawî
25. Se'd Bezaz
26. Se'd Cewad
27. Se'd Salih Cebir
28. Sedûn Dilêmî
29. Sînan Şibîbî
30. Sadiq Mûsewî
31. Xatû Sefiye Suhêl
32. Selaheddîn Behaeddîn
33. Selah Şêxlî
34. Senan Ehmed Axa
35. Tarîq Ezemî

36. Adil Ebdulmehdî
37. Ebas Beyatî
38. Ebdulezîz Hekîm
39. Ebdulsetar Cumeylî
40. Ebdulmecîd Xwî
41. Ezzeddîn Selîm
42. Elî Bin-Huseyn
43. Xesan Etiye
44. Farûq Rezae
45. Fuad Mesûm
46. Qadir Ezîz
47. Kerîm Ehmed
48. Kenan Mekîye
49. Kosret Resûl Elî
50. Goran Talebanî
51. Mihemmed Behir Ulum
52. Mihemmed Teqî Mewla
53. Mihemmed Heyderî
54. Mihemmed Ebdulcebar
55. Mihemedê Hacî Mehmûd
56. Mesûd Barzanî
57. Meşan Cibûrî
58. Muzir Şewket
59. Miwefeq Rûbeî
60. Nacî Hilmî
61. Necmedîn Kerîm
62. Hişyar Zêbarî
63. Lîwa Rukin Wefîq Samerayî
64. Welîd Mihemmed Salih
65. Yunadim Yûsif Kenna

# Deklarasyona siyasî ya garantîkirina mafên pêkhatiyên neteweyî û dînî yên Kurdistanê

Ev deklarasyona ko ji aliyê komîteyeka taybet ve bi serpereştiya doktor Xelîl Îbrahîm û endamên komîteyê Romyo Hekarî, Şêx Şamo, Muna Qehwecî, Viyan Dexîl, doktor Talib Kakeyî, Kerîm Suleyman, Halan Hurmuz û Mihemed Sededîn ve hatibû amade kirin, roja 24-ê îlona 2017-ê di civîna dawiyê ya Konseya Bilind ya Referandumê de bi timamiya dengan hat qebûl kirin.

**Deklarasyona siyasî ya garantîkirina mafên pêkhatiyên neteweyî û dînî yên Kurdistanê**

In Em, endamên Konseya Bilind ya Referandumê li Kurdistanê û bi hikmê ko nûnerên piraniya partiyên siyasî yên Kurdistanê ne, baweriya me bi wê çendê heye ko Kurdistan welatê hemî kurd, tirkmen, kildan-siryan-aşûrî, ereb û ermeniyan; bi misilman, êzdî, xiristiyan, kakeyî, cihû, zerdeştî, sabiyeyî, mendayî û şebekan wê ve ye. Em wê hemî zilm û karesatên ko di dehsalên borî de hatine serê hemî gelên Kurdistanê tînin bîra xwe.

Baweriya me ew e ko biserketina li hemberî wan karesatan dê bi rêya serdestbûna li hemberî vederkirinê, zilma neteweyî, dînî û mezhebî be, û herwiha dê bi rêya bicihkirina mafên mirovî û rêzgirtina li azadiyên bingehî be bêyî ferqûcidahiya bi sebebê etnîkî, zimanî, dînî û bîrûbaweriyê. Divêt em rêza şehîdên xwe yên ji bo azadiyê bigirin û îlhamê ji ruhê lêborînê û brayetiyê û qebûlkirina yê li hember wergirin ji ber ew xisletên gelê Kurdistanê ne.

Baweriya me bi mafên bingehî yên mirovî û rêzgirtina şeref û hêjahiyan û wekheviya gelên biçûk û mezin heye. Di bin ronahiya wan prensîpên ko di peymanên nêvdewletî de ji bo parastin û xurtkirina mafên kêmîneyên neteweyî û dînî hatine behs kirin; û ji bo ko pêkhatiyên li Kurdistanê mafên xwe li gor prensîpên demokrasiyê û serdestiya qanûnê û edaletperweriyê bi dest bixin ko ew jî dibin sebebê îstiqrara ewlekariyê û aştiyê li Kurdistanê û li deverê û li hemî cîhanê; me biryar da ko van prensîpên li xwarê pêkbînin:

### Madeya 1-ê:

Îtirafkirin bi pluralîzma neteweyî, dînî, mezhebî û kulturî ya civata Kurdistanê û parastina mafên hemî pêkhatiyan li ser bingehê hemwelatîbûnê û wekheviyê; û liberçavgirtina taybetmendiyên wan yên dînî û miqatebûna li urf û adetên wan û parastina cihên wan yên îbadetê.

### Madeya 2-yê:

a) Garantîkirina mafên neteweyî, kulturî û îdarî yên tirkmen, kildan, siryan, aşûr, ereb û ermeniyan; di destpêkê de bi formê îdareya xweser û hikmê zatî yê nemerkezî heta ko bigehî federaliyê ji bo deverên wan pêkhatiyan yên tarîxî li gor serjimêriya 1957-ê.

b) Garantîkirina mafên êzdiyan ji bo îdareyeka xweser û hikmê zatî û nemerkezî heta ko bigehî federaliyê li wan deverên ko piraniya niştecihên wê ew in. Organîzekirina wê jî dê li gor qanûnan be.

**Madeya 3-yê:**

Garantîkirina hebûna nûnerên pêkhatiyan li konseyên hilbijartî yên qanûnî û dezgehên îdarî de; û hebûna nûnerên wan yên dîplomatîk di heyetên serbixwe de. Organîzekirina wê jî dê li gor qanûnan be.

**Madeya 4-ê:**

Garantîkirina hebûna nûnerên pêkhatiyên neteweyî û dînî di Dadgeha Bilind ya Qanûna-esasî de; li gor wan şertên ko urfên giştî dixwazin.

**Madeya 5-ê:**

Li gor qanûnên heyî, garantîkirina bicihkirina pêkhatiyên neteweyî û dînî di dezgehên bicihker û meqamên serweriyê û sîstema bergiriyê û hêzên emniyeta nêvxweyî û pêşmergeyan de.

**Madeya 6-ê:**

Qebûlkirina zimanê kurdî, tirkmenî, siryanî, erebî û ermenî wekî zimanên resmî. Organîzekirina wê jî dê li gor qanûnan be.

**Madeya 7-ê:**

Divêt ala û logoya Kurdistanê û sirûda niştimanî îşaretê behsa pêkhatiyan jî bike. Organîzekirina wê jî dê li gor qanûnan be.

**Madeya 8-ê:**

Organîzekirina cejn û minasebetên dînî û neteweyî û bêhvedanên resmî li gor qanûnan.

**Madeya 9-ê:**

Dewlet garantîkirina azadiya fikrî û miqatebûna li urf û adetên dînî yên hemî pêkhatiyan li xwe digire.

**Madeya 10-ê:**

Alîgirên pêkhatiyên dînî, ji bilî yên îslamê, heq heye ko rewşa dînê xwe yê taybet bi rêya avakirina dadgeha şexsî peyrew bikin û çênabe ko hikmê hîç dînekî li ser alîgirên dînekê dî bêt ferz kirin.

**Madeya 11-ê:**

Jihalêrakirin û nehiştina guhortinên demografîk li deverên tarîxî yên pêkhatiyan yên li gor serjimêriya sala 1957-ê û yên ji dema avakirina dewleta Iraqê ve. Jihalêrakirina şondewsên zilm û jenosîdê ko bi serê kurdên êzdî, kildanan, siryanan, aşûriyan, tirkmenan û hemî pêkhatiyan hatine. Pêşdebirina wan deverên ko rûbirûyî wêrankirinê bûn û qerebûkirina zerermendên wê.

**Madeya 12-ê:**

Garantîkirina mafê avakirina konsey, komele, organîzasyon û klubên taybet yên pêkhatiyan.

**Madeya 13-ê:**

Dewlet erka parastin û nûjenkirina cih û şonwarên medenî û dînî yên hemî pêkhatiyan li xwe digire.

**Madeya 14-ê:**

Di meseleya perwerde û fêrkirinê de divêt behsa tarîxa pêkhatiyan û mefhûma lêborînê û pêkvejiyanê û hevduqebûlkirinê bêt kirin. Û ji bilî wê jî divêt behsa rênedana kultura kîndariyê û hemî wan tiştan bêt kirin ko dibin sebebê bilavbûna şideta fikrî û fanatîzmê.

**Madeya 15-ê:**

Nûnerên hemî pêkhatiyên neteweyî û dînî dê beşdariyê di nivîsandina qanûna-esasî ya dewletê de bikin.

**Madeya 16-ê:**

Bi destpêkirina dewreya yekê ya parlamentoyê re û piştî derketina vê deklarasyonê, dê dest bi pêkanîna van madeyan hemiyan bêt kirin.

# Deklarasyona prensîpên qanûna-esasî [1]

## Pêşgotin

Paragrafa didoyê ya madeya yekê ya deklarasyona Neteweyên Yekbûyî behsa mîsyona Neteweyên Yekbûyî ya ”pêşxistina têkiliyên dostane di nêvbera miletan de li ser esasê rêzgirtina li prensîpa wekheviya di mafan û di biryardana-çarenivîsê ya gelan de” dike. Madeya 55-ê ya wê deklarasyonê jî behsa ”afirandina şertên minasib ji bo îstiqrarê û aramiyê ko ji bo têkiliyên aştiyane û dostane yên di nêvbera miletan de pêwistî pê heye û divêt li ser bingehê prensîpa rêzgirtina li wekheviya mafê gelan di biryardana-çarenivîsê de be” dike.

Li gor biryara hejmara 1514-ê ya meclisa giştî ya Neteweyên Yekbûyî di kanûna-yekê ya sala 1960-ê de, di deklarasyona mafê serxwebûnê yê gel û welatên kolonîzekirî de têt gotin ko ”hemî gelan mafê biryardana-çarenivîsê heye; û bi payeya vî mafî ew dikarin azadane biryarê li ser statuya xwe ya siyasî bidin û birêvebiriya pêşxistina civat û kultura xwe bikin”.

1- Projeya “Deklarasyona prensîpên qanûna-esasî” li ser pêşniyara serokê herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û biryara Konseya Bilind ya Referandumê ji aliyê sekreterê Hizba Şiyûî ya Kurdistanê doktor Kawe Mehmûd ve hat amade kirin.

Li gor madeya yekê ya Peymana Nêvneteweyî ya Mafên Medenî û Siyasî (International Covenant on Civil and Political Rights) û Peymana Mafên Aborî, Civakî û Kulturî (International Covenant on Economic, Social and Cultural Rights) ya sala 1966-ê, hemî "gelan" mafê wê çendê heye ko biryarê li ser paşeroja xwe ya siyasî bidin û azadane birêvebiriya pêşxistina aborî, civat û kultura xwe bikin.

Meclisa giştî ya Neteweyên Yekbûyî sala 1970-yê di biryara hejmara 2625-ê de, di "Deklarasyona prensîpên qanûnên nêvneteweyî yên di heqê têkiliyên dostane û hevkariya dewletan li ser esasê carnameya Neteweyên Yekbûyî" de wiha dinivîsîne: "Bi payeya prensîpa xudanbûna gelan ya mafên wekhev û biryardana-çarenivîsê ko di carnameya Neteweyên Yekbûyî de binecihkirî ye; hemî gelan mafê wê çendê heye ko bêyî midaxeleya ji derve azadane biryarê li ser statuya xwe ya siyasî bidin û birêvebiriya pêşxistina aborî, civat û kultura xwe bikin, û wezîfe ye li ser milên hemî dewletan ko rêzê ji vî mafî re bigirin ji ber di carnameyan de biryar li ser hatiye dan."

Li gor teksta Deklarasyona Gerdunî ya Mafên Gelan ya sala 1976-ê û herwiha li gor madeya heştê ya Peymana Helsînkiyê ko di netîceya Konferansa Ewlekarî û Hevkariyê ya Ewropayê de sala 1975-ê hat îmza kirin; û li gor Konferansa Cîhanê ya Mafên Mirovî ko sala 1993-yê li Viyanayê di bin çavdêriya Neteweyên Yekbûyî de hat çêkirin, çendcarî tekîd li ser wê yekê hatiye kirin ko "hemî gelan mafê biryardana-çarenivîsê heye". Ji bilî vê jî Dadgeha Edaletê ya Nêvneteweyî di heqê prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê de gelek caran hikim daye. Wekî nimûne biryara di heqê Namîbyayê de 21-ê hezîrana 1971-ê, biryara di heqê Sehraya Rojavayê de 16-ê oktobera 1975-ê, biryara di heqê Tîmûra Rojhilatê de 30-ê hezîrana 995-ê û qenaeta wê dadgehê di heqê Kosovayê de sala 2008-ê.

Nimûneyên berê yên qanûnên nêvneteweyî îtirafê bi mafê biryardana-çarenivîsê dikin. Biryarên civata nêvneteweyî di heqê cidabûna Senegalê ji Maliyê sala 1960-ê, cidabûna Sîngaporê ji Malezyayê sala 1960-ê, cidabûna Bengladeşê ji Pakistanê sala 1974-ê û serxwebûna welatên rojhilatê Ewropayê di destpêka salên 90-ê de, jidayîkbûna hinek komaran ji Yekîtiya Sovyetan û ji Yogoslavyayê û parçebûna wan li şeş dewletan, hemî delîlên vê heqîqetê ne.

Di dîbaceya qanûna-esasî ya sala 2005-ê ya Iraqê de tekîd li ser wê çendê hatiye kirin ko binecihkirina vê qanûna-esasî dibe hêmayê parastina ax, gel û serweriya Iraqê û qanûna-esasî garantora yekîtiya Iraqê ye. Bi hikmê ko eve zêdetirî 13 salan e di ser nivîsandina wê qanûna-esasî re derbas bûn û di vê midetê de zêdetirî 50 madeyên wê nehatine pêkanîn; û herwiha ji ber kûrtirbûna krîza bingehî ya girêdayî mafên pêkhatiyên dewleta Iraqê û nebûna şiyana binecihkirina sîstema federal ko ji aliyê pratîkî ve heqê yekîtiyeka dilxwaz dide kurdan û çênabe ko Iraq bi darê zorê bêt îdare kirin; û ji ber xetera mezin ya ko di encama vê rewşê de bi ser Kurdistanê de têt; û ji bo dûrketin û xweparastina ji hemî îhtimalên rûbirûbûneka neteweyî yan etnîkî yan mezhebî digel Iraqê, gelê Kurdistanê biryar da ko berê xwe bide pêkanîna referandumekê da çarçeweya têkiliyên xwe yên digel Iraqê destnîşan bike û ew jî li gor prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê û vegeriyana li viyan û biryara gelê Kurdistanê di vî warî de be.

Biryara pêkanîna referandumê jî li gor prensîpên demokrasiyeka aştiyane, dibe binaxeyek ji bo çareserkirina nakokî û problemên di nêvbera Kurdistanê û Iraqê de. Ev jî dê bibe havênê xuliqandina paşerojekê ji bo têkiliyên saxlem yên ko pişta xwe bi cîrantiyê, arîkariyê û karên hevbeş ve girêdide ko ew jî bibin havênê xizmetkirina berjewendiyên gelên Iraqê û Kurdistanê.

Biryara pêkanîna referandumê li gor fermaneka herêmî ya serokatiya herêma Kurdistanê bi hemî netewe û pêkhatiyên wê ve, netîceya xebata miletê Kurdistanê û netîceya têkoşîna tevgera rizgarîxwaz ya Kurdistanê û wan hemî qurbanên ko di operasyonên Enfalê, bombebarankirina kimyayî û kampanyayên jenosîdê de hatin dayin bû. Di heman demê de ev biryar şehnaziyek bû ji bo xebata miletê Kurdistanê ya di dirêjahiya tarîxê de ji bo azadî, edalet, wekhevî, serweriya niştimanî û aştbûna insanî û wan berhemên ko insaniyetê pêşkêşî medeniyetê kirine. Di heman demê de jî haya me ji wan astengan heye ko dê derkevin pêşiya me û em tekîdê li ser wê yekê dikin ko milet serkaniya desthilatê ye.

Ji ber giringiya biryara referandumê û wê alternatîva ko hat danîn ber destê miletî, me minasib dît ko em prensîpên qanûna-esasî wekî binaxeyekê ji bo dewleta niştimanî ya Kurdistana serbixwe îlan bikin. Ev deklarasyon nivîsareka siyasî ye ko têt raber kirin bo raya giştî ya nêvxwe û raya giştî ya herêmî û nêvneteweyî û hikûmet û welatên biyanî. Ev deklarasyon sozeka pêbawer e ko tê de behsa prensîpên qanûnên-esasî yên dewletên nûwelidî dike û tekîdê li ser tebîetê sîstema siyasî û pêbendbûna bi prensîpên nêvneteweyî dike ko ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve hatine îlan kirin. Herwiha pêbendbûna xwe bi prensîpên mafên mirov û avakirina dewleta qanûnê û pêbendbûna xwe bi hemî dezgehên medenî yên demokratîk û modern ve diyar dike.

Îlankirina prensîpên qanûna-esasî, ne alternatîva wê qanûna-esasî ye ko di nivîsandina wê de hemî pêkhatiyên neteweyî û dînî bi rêya mecliseka avaker beşdariyê tê de dikin û paşê milet bi referandumekê qebûl dike. Em wekî şehnaziyekê bi xebata miletê xwe û wekî dilsoziyekê ji bo ruhê şehîdên hemî şoreşên xwe, prensîpên serekî yên qanûna-esasî ya dewleta niştimanî ya Kurdistana serbixwe bi vî rengê li xwarê îlan dikin:

1. Komara Kurdistanê dewleteka medenî demokratîk e û li ser bingehê hemwelatîbûnê û serweriya qanûnê ava bûye; rêzê li pluralîzmê digire û azadî, edalet, wekhevî û afirandina firsetên wekhev ji bo hemî hemwelatiyan bêyî ferqûcidahiya li ser esasê dînî yan nijadî berdest dike. Herwiha ji bo hemî hemwelatiyên kurd, ereb, tirkmen, aşûr, kildan-siryan û ermenî dewleteka niştimanî ye. Dewlet dê pêbenda parastina mîrasê niştimanî yê xweser yê hemî netewe û pêkhatiyan be û ev jî dê di ala û sirûda niştimanî de bêt temsîl kirin ko rengvedana pluralîzma neteweyî û dînî tê de xuya dibe.

2. Milet serkaniya desthilatê ye û ev jî bi rêya referandumê û hilbijartinên bêqirêj têt pêkanîn. Proses jî bi rêya komîsyoneka serbixwe û bi serpereştiya mehkemeyan têt bi rê ve bibin û dê li gor sîstemeka hilbijartinan ya wisa be ko bibe hêmaya garantîkirina edaletê di temsîla hemwelatiyan de bêyî hîç ferqûcidahî û vederkirinekê. Di heman demê de qanûna-esasî dê temsîla hemî netewe û pêkhatiyên li Kurdistanê bi rêya kotayê garantî bike, digel parastina mafê wan yê di lîsteyên giştî de.

3. Sîstema siyasî ya dewletê dê komarî, parlamenterî û demokratîk be û li ser bingehê balansê di nêvbera ”desthilata qanûnnivîs”, ”desthilata bicihker” û ”desthilata dadgêriyê” de û jihevcidakirina wan avabûyî be. Dewrkirina desthilata siyasî dê bi awayekê aştiyane û li gor pluralîzma partiyên siyasî be û divêt ne li dijî maf û azadiyên bingehî be.

4. Dewlet li ser bingehê wekheviya di nêvbera ferd û pêkhatiyan de û bi liberçavgirtina xweseriyên wan, mafê hemî netewe û pêkhatiyan garantî dike. Dewlet li ser esasê demokrasiyê berfirehkirina hikmê nemerkezî, otonomiyê û xweseriya îdarî tetbîq dike û ev jî dê bi rêya hinek çarçeweyên guhortî ko viyan û daxwazên pêkhatiyan li ber çavan bigirin be; û formê îdarî dikare heta asta federaliyê jî biçe.

5. Dewlet azadiya hemî hemwelatiyan ya dînî û bîrûbaweriyê; û pêkanîna merasimên dînî yên misilmanan, êzdiyan, xiristyanan, kakeyiyan, cihûyan, zerdeştiyan, sabiyeyiyên mandeyî û hemî dîn û bîrûbaweriyên dî berdest dike.

6. Dewleta Kurdistanê beşeka Rojhilata-nêvê ye û xwe wekî beşek ji civata nêvneteweyî dihesibîne û xebatê ji bo avakirina têkiliyên dostayetiyê di nêvbera hemî miletên Rojhilata-nêvê û cîhanê û têkiliyên di nêvbera welatan de dike ko dê li ser esasê pêkvejiyanê û hevkarîkirina ji bo bidestxistina aştî, îstiqrar, nehiştina serkaniyên şidetê û lidijderketina terorê û rêzgirtina li serweriya welatan be. Di heman demê de dewleta Kurdistanê xebatê ji bo girêdana têkiliyên cîrantiyê û xurtkirina prensîpên edaletê û mafên mirovî û hevkariya di nêvbera miletan û welatan de bike.

Ji aliyekê dî ve dewleta Kurdistanê dê pêbenda deklarasyon û peymanên nêvneteweyî û wan peymanên ko taybet in ji bo diyarkirina tixûbên digel welatên cîran be. Herwiha dewlet dê pêbenda tixûbên

tarîxî û cografî yên Kurdistana başûr be û xebatê ji bo çareserkirina hemî problemên digel dewleta Iraqê bi rêya diyalogê bike û ew jî dê bi rengekî be ko bibe havênê xurtkirina aştî, ewlekarî û îstiqrarê. Dewleta Kurdistanê xebatê ji bo beşdarbûna di avakirina medeniyeta mirovahiyê de dike.

**7**. Hêzên pêşmergeyan hêzên çekdar yên kurdistanî ne û milkê miletî ne û divêt bibe dezgeheka niştimanî ya vekirî ji bo hemî hemwelatiyên Kurdistanê bi hemî netewe û pêkhatiyan ve, herwiha di bin çi navî de be jî dê rê li ber avakirina milîsan bêt girtin.

**8**. Dewleta ko li ser bingehê serweriya qanûnê û serbixwebûna dadgêriyê ava dibe dê bibe garantora pêkanîna edaletê ji bo hemî hemwelatiyan.

**9**. Hemî hemwelatî li hemberî qanûnê di maf, azadî û erkên giştî de wekhev in. Hêjabûna mirovan jî mafekê serekî û parastî ye. Rê ji bo ferqûcidakirina di nêvbera hemwelatiyan de, ji ber sebebên nijadî yan etnîkî, yan zimanî yan dînî yan bîrûbaweriyê, yan dewlemendiyê yan meqamê civatî û bîrûbaweriyên siyasî, nayêt dan. Herwiha dewlet dê azadiya jinan û mafên wan yê di beşdarbûna di merkezên biryarê de garantî bike. Û di heman demê de dewlet pêwistiyên wan çîn û tebeqeyên ko pêwistiya wan bi parastinê heye berdest bike.

**10**. Hîç tawan û sizayek nîne heger qanûneka nivîsandî jê re nebe. Tawanbar jî bêtawan e heta wê dema ko dadgeheka adil biryarê li ser tawankariya wî dide. Kesên

sivîl çênabe ko li dadgeheka awarte yan dadgeheka eskerî bên mehkeme kirin. Çênabe ko kesên sivîl bên binçav kirin, yan bên lêgeriyan, yan bên desteser kirin û girtin, yan jî azadiya wî ya şexsî jê bêt standin heger berê biryareka dadgirî jê re nebe. Dewlet azadiya manê û çûnûhatinê ji bo hemî hemwelatiyan garantî dike.

11. Hemwelatîbûna Kurdistanê mafê hemî hemwelatiyên dewletê ye û rê nayêt dan ko ew maf ji hemwelatiyan bêt standin, yan ji welatî bên dûr xistin, yan rê li ber vegeriyana wan bêt girtin.

12. Dewlet azadiya bîrûbaweriyê û pêkanîna îbadet û merasimên dînî garantî dike û cihên dînî diparêze.

13. Azadiya fikrê, bîrûrayê û derbirînê; û azadiya medyayê û navgînên wê dê bên garantî kirin, bi şertê ko nebin asteng li hemberî jiyana taybet û mafên netewe û pêkhatiyan. Bêyî ko biryareka berê ya dadgehê û mideteke mehdûdkirî hebe çênabe kontrola dezgehên medyayê bêt kirin, yan dest bi ser de bêt danîn, yan jî bên daxistin.

14. Mafê avakirina partiyên siyasî, sendîka, komele, konsey, dezgehên sivîl û mafê civiyanê û pêkanîna xwenîşandanên aştiyane parastî ye; bi şertê ko prensîp, maf û azadiyên bingehî yên kesên dî binpê neke.

15. Dewlet dê di siyaseta xwe de girêdayî pêşdebirineka berdewam ya piralî û prensîpên hikimdariya baş, şefafiyetê û beşdariya aktîv ya hemwelatiyên Kurdistanê

be. Dewlet dê xebatê ji bo parastina kultura niştimanî ya hemî gel û pêkhatiyan bike û dê pêbenda parastina samanên xwezayî yên wekî petrol, gaz, av û medenan be ji ber ew milkên giştî yên hemî miletî ne û dibin havênê pêkanîna refaha civatî û berdestkirina pêwistiyên bingehî yên hemwelatiyan û dibin sebebê teşwîqkirina învestmentê û parastina mafê bikarhêneran (bikiran). Divêt rikeberiyeka azad hebe û rê li ber monopolîzmê bêt girtin.

**16**. Sermayedariya xweser/şexsî destlêneder e û çênabe bêyî biryara dadgehê dest lê bêt dan; û destlêdan jî divêt tenê li hemberî dana qerebûyeka adil be.

**17**. Hemî hemwelatiyan maf heye ko bibin karmendên giştî/dewletê û mafê wan yê karkirinê garantîkirî ye. Dewlet ji bo peydakirina firseta karî ji bo hemî hemwelatiyan xebatê dike û pêbenda wê yekê ye miaşekê mînîmum yê wisa destnîşan bike ko têra berdestkirina asta jiyaneka hêjayî kerameta însanan be.

**18**. Xwendina dibistana destpêkê mecbûrî ye û dewlet serpereştiya hemî dezgehên perwerdeyê yên giştî, ehlî û taybet dike û divêt bi formekê wisa be ko bibe havênê garantîkirina parastina girêdana niştimanî, nasnameyê û kulturê. Dewlet xebatê dike ji bo garantîkirina mafê perwerdeyê, azadiya akademîk, lêkolînên ilmî, afirandinê û înovasyonên ilmî û peydakirin û pevguhortina enformasyonan û belavkirina wan; û xebatê ji bo beşdarîkirina di jiyana

kulturî û hinerî de bi hemî form û aktîvîteyên wê ve dike. Digel vê jî divêt biserxwebûna unîversîteyan û merkezên lêkolînê garantîkirî be. Dewlet pêbenda wê yekê jî ye ko firseta fêrbûna belaş di dezgehên perwerdeyê de çêke.

**19**. Rêzgirtin li jiyana şexsî ya her mirovekî, li nameyên wan, li axaftinên wan yên bi telefonê, li têkiliyên wan yên dîjîtal û enformatîv; û li têkiliyên wan yên bi hemî navgînên dî yên komûnîkasyonê. Heger ne bi biryara dadgêrekî û ji bo demekê mehdûdkirî be çênabe ko ew bên qeyd kirin, yan rê li ber bêt girtin yan dest bi ser wan de bêt danîn.

**20**. Mafê peydakirina jiyaneka aram û jîngeheka paqij û ji pîsiyê dûr; û mafê peydakirina xwarina saxlem, avahiya jiyanê, kontrola saxlemiyê û pêkanîna sporê; û digel van jî mafê hebûna sîgortayê li dijî bêkarî, nexweşî, seqetî û pîrîtiyê ko li gor pîvanên edaletê û hevkariya civatî be.

# Belgename

Belgenameya hejmara 1-ê

Serokatiya Herêma Kurdistan

# Fermana Herêmî

Hejmar (106), 2017

Komara Iraqê
Herêma Kurdistanê
**Serok**

# Fermana Herêmî

Hejmar (106)

Bi palpiştiya qanûna serokatiya herêma Kurdistanê ya hejmara 1-ê ya sala 2005-ê ya serastkirî, û bi liberçavgirtina berjewendiyên giştî û piştgirêdana bi prensîpa mafê biryardana-çarenivîsê ko ji bo gel û neteweyên cîhanê ji aliyê meclisa giştî ya Neteweyên Yekbûyî û qanûnên nêvdewletî ve mafekê îtirafpêkirî ye, û ji ber ko miletê Kurdistanê di warê xak, ziman, kultur, tarîx, nasname û hemî binemayên xwe-dan-nasînê ve miletekê xudanê hemî taybetmendiyên xwe ye, wekî miletekî bi hemî pêkhatiyên xwe ve li gor hemî pîvanên mirovî û nêvdewletî mafê wî heye biryarê li ser diyarkirina rengê jiyana xwe ya paşerojê bide.

Miletê Kurdistanê ji roja avabûna dewleta Iraqê ve xebat û têkoşîn ji bo bidestxistina mafên xwe û pêkvejiyaneka aştiyane ya digel miletên dî yên Iraqê kiriye da hebûna wî wekî miletekî parastî be. Di encama xebata bi dehsalan ya tevgera rizgarîxwaz ya miletê Kurdistanê de, di gelek qunaxan de hinek proje û soz ji aliyê desthilatdarên Iraqê ve jê re hatin dan herçend ew maf û soz bi temamî ne li gor armanc û qurbandana miletê me bûn. Wekî nimûne bo wan proje û sozan em dikarin îşaretê bidin daxuyaniya brîtanî–iraqî ya sala 1922-yê di heqê avakirina hikûmeteka kurdî de; qanûna zimanê xwecihan ya hejmara 74-ê li sala 1931-ê; daxuyaniya resmî ya Iraqê di heqê sozên Iraqê bo Cemiyeta Miletan de; pêgirîbûna Iraqê bi binecihkirina xwendina kurdî li Kurdistanê; mafên madeya 3-yê di qanûna-esasî ya miweqet ya Iraqê ya sala 1958-ê de; projeya îdareya nemerkezî li Iraqê di sala 1963-yê de; daxuyaniya 29-ê hezîrana sala 1966-ê; peymana 11-ê adara 1970-yê; qanûna otonomiyê ya hejmara 33-yê bo Kurdistan–Iraq di sala 1974-ê de; û madeya 58-ê di qanûna birêvebirina dewletê de li qunaxa miweqet ya sala 2004-ê de.

Hikûmetên Iraqê yek li dûv yekê, ne hema tenê belgenameyên xwe binpê kirine û piştguh kirine, belko bi agirî û sîlehan bersiva daxwazên miletê kurd yên ji bo mafên wî dane. Netîceya wê jî ji bo Kurdistanê felaket û malwêranî bû: wekî jenosîdkirina miletê kurd di bin navê ”Enfalê” de, jibinveguhostin, niştecihkirina bi darê zorê, wêrankirina gund û avahiyan û jêrxana

aborî; bikaranîna gaza kimyayî ya ko di asta nêvdewletî de bikaranîna wê li dijî xelkê sivîl qedexekirî bû.

Herwiha piştî prosesa rizgarkirina Iraqê di sala 2003-yê de û roxiyana rejîma berê ya Be'sê û berpêbûna firseteka nû ji bo avakirina Iraqê li ser bingehê demokrasî, dezgehîbûn û hemwelatîbûnê ko mafên pêkhatiyan tê de parastî be; miletê Kurdistanê bi rexmê hemî eziyetkişandin û qurbandanê, bi rêya nûnerên xwe beşdariyeka aktîv ji bo avakirina Iraqa nû û dariştina qanûna-esasî ya Iraqê di sala 2005-ê de kir; ko bûye binaxeyek ji bo avakirina dewleteka demokratîk, federal, parlamenterî, pirhizbî li ser bingehê prensîpa "yekîtiya dilxwaz" û diyarkirina prensîpên parastina mafên pêkhatiyan û çareserkirina problemên tarîxî yên welatî. Lê belê piştî derbasbûna gelek salan ji temenê vê qanûna-esasî, Iraq hêjî tejî binpêkirinên zeq yên qanûnî û qanûna-esasî ye û ew bingehên ko dewleta nû ya Iraqê li ser hat damezirandin – ko dabeşkirina maf û desthilatê bû di nêvbera merkezê û herêmê de – hatin binpê kirin.

Giringtirîn erka sîstema federal dabeşkirina hatiniyê û diyarkirina tixûbê herêma Kurdistanê ye. Di warê malî de butçeya herêma Kurdistanê hat qut kirin. Di warê diyarkirina tixûbî de herçend deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê ji aliyê tarîxî, cografî û demografîk ve beşek in ji herêma Kurdistanê, cardî jî serkirdayetiya siyasî ya Kurdistanê ji bo nîşandana niyetpakiyê û çareserkirina aştiyane ya prosesê rizamendiya xwe ji nêveroka madeya 140-ê

ya qanûna-esasî re diyar kir; ji ber ko wê nexşerêyek amade kiribû û diviya heta taliya sala 2007-ê prosesa rapirsiyê bihata pêkanîn da niştecihên wan deveran bi viyana xwe ya azad biryarê li ser paşeroja xwe bidin. Serkirdayetiya Kurdistanê gelek caran dubare kir ko dê pêbenda netîceyên rapirsiyê be vêca netîce çi jî be lê belê hikûmeta Iraqê ew made binecih nekir. Herwiha avakirina Konseya Federal li gor madeya 65-ê ya qanûna-esasî hat piştguh kirin.

Herwekî ko di dîbaceya qanûna-esasî de hatiye nivîsandin, miletên Iraqê bi azadî û dilxwazî ev yekîtî hilbijartine û "pêbendbûna bi qanûna-esasî yekîtiya dilxwaz ya Iraqê bi erd û xak û serweriya wê ve diparêze" û binpêkirina van bendan jî bileks dibe sebebê pirtûbelavbûnê.

Ji ber sebebê berdewamkirina hikûmetê û serkirdayetiya siyasî ya Iraqê li ser binpêkirin û pêbendnebûna bi nêveroka qanûna-esasî ve û piştguhkirina maf û daxwazên miletê Kurdistanê; û ji ber ko rewşa deverê û Kurdistanê bi giştî û ya Iraqê jî bi taybetî wisa dixwaze ko biryareka yekalîker ji bo paşeroja vî miletî bêt dan; û piştî hemî civîn û şêwrên digel aliyên siyasî yên Kurdistanê bi hemî pêkhatiyên wê ve, em roja heftê meha şeşê ya 2017-ê gehiştin wê netîceyê ko divêt em vegerin bo deng û îradeya miletê xwe ya ji bo biryardana li ser çarenivîsê û paşeroja xwe; li ser wan esasan me biryar da:

1. Pêkanîna rapirsiya giştî li roja 25/7 2017-ê li seranserê herêma Kurdistanê û deverên kurdistanî yên li derveyî îdareya herêma Kurdistanê.

2. Prosesa rapirsiyê bi dengdaneka giştî, nihênî, yekser û azad dê çêbe. Proses ji seet heştê sibehê destpê dike û heta şeşê êvarî berdewam dike.

3. Ji bo binecihkirina mafê biryardana-çarenivîsê, beşdarên prosesê dê bi ”Erê” yan ”Nexêr” bersiva vê pirsiyara li xwarê bidin ko ew jî bi danîna nîşana ”rastiyê” li hemberî yek ji wan e.

”Gelo te divêt herêma Kurdistanê û deverên kurdistanî yên li derveyî herêma Kurdistanê bibin dewleteka serbixwe?

— ”Belê”
— ”Nexêr”

4. Divêt di xisletê dengderan de li gor qanûn û rênimayiyên peyrewkirî, şiyana dengdanê hebe.

5. Karta dengdanê dê bi zimanê kurdî, erebî, tirkmenî û siryanî bi awayekê zelal bêt nivîsandin û bêt çap kirin.

6. Ew bijareya (alternatîva) ko piraniya dengan wergire dê wekî ”biserketî” bêt hesibandin û bibe ”îradeya giştî” ya miletê Kurdistanê bi hemî pêkhatiyên wê ve.

7. Di meseleya qeydkirina xudandengan û reklam, dengdan û tawanên hilbijartinan de, ew hukmên ko di qanûna hilbijartinan ya Parlamentoya Kurdistanê de,

qanûna hejmara 1-ê ya sala 1992-yê ya serastkirî de û di qanûnên peywendîdar de hene dê bên bi cih kirin.

8. Komîsyona Bilind ya Serbixwe ya Hilbijartin û Rapirsiyê li Kurdistanê dê bi erka pêkanîn û serpereştîkirina rapirsiyê û amadekirina qeydên dengan, vebijartin û hejmartina dengan û bilavkirina netîceyên wê rabe. Di vî warî de komîsyon dê peyrewiya rênimayî û hukmên qanûnên peywendîdar û standardên cîhanî bike.

9. Komîsyona Bilind ya Serbixwe ya Hilbijartin û Rapirsiyê dê ji bo bicihkirina prosesê hemahengiyê digel Komîsyona Bilind ya Referandumê ya Kurdistanê bike.

10. Dezgehên hikûmî û hizbî heq nîne ko bi hîç rengekî ji rengan desttêwerdanê li karûbarên berpirs û serperiştkarên pêkanîna prosesa rapirsiyê bikin; û rê nayêt dan ko hîç kes yan aliyek destê xwe bêxe nêv karûbar û desthilatên Komîsyona Bilind ya Serbixwe ya Hilbijartin û Rapirsiyê di dema pêkanîna erkên wê de, ko bi temamî li gor qanûnan bêalî, serbixwe û bi destpakî û aşkera tên kirin.

11. Aliyên peywendîdar dê firseta pêwist ji bo beşdarbûna hemî endamên miletî amade bikin û wê yekê garantî bikin ko milet bi azadî derbirîna xwe, kombûnan, hatinûçûnê û dengdanê li gor qanûnên peyrewkirî bikin; û ew aliyên peywendîdar dê ji bo birêvebirina prosesa rapirsiyê hêsankarî û

hemahengiyê digel Komîsyona Bilind ya Serbixwe ya Hilbijartin û Rapirsiyê bikin.

12. Garantîkirina beşdarbûna aliyên peywendîdar yên biyanî yên resmî û neresmî û rêxistinên civata sivîl û medyayê di çavdêrîkirina hemî karûbarên kampanya û birêveçûna dengdanê de, û vebijartin û hejmartina dengan û bilavkirina netîceyên wê de.

13. Komîsyona Bilind ya Serbixwe ya Hilbijartin û Rapirsiyê dê xebatê ji bo hindê bike ko firsetê ji bo revenda kurdistanî ya li derve çêke da bikarin beşdariyê di rapirsiyê de bikin.

**Mesûd Barzanî**
Serokê herêma Kurdistanê

Hewlêr
8/6/2017

کۆماری عێراق
هەرێمی کوردستان
سەرۆك

جمهورية العراق
إقليم كوردستان
الرئيس

## فەرمانی هەرێمی

### ژمارە (١٠٦)

پاڵپشت بە یاسای سەرۆکایەتی هەرێمی کوردستان ژمارە (١) ی ساڵی ٢٠٠٥ ی هەموارکراو، و بە لەبەرچاوگرتنی بەرژەوەندی گشتی و پشت بەست بە بنەمای مافی چارەی خۆنووسین کە مافێکی دانپێنراوە لەلایەن کۆمەڵەی گشتی نەتەوە یەکگرتووەکان و یاسا نێودەوڵەتییەکان بۆ گەلانی جیهان و نەتەوەکان، و بەو پێیەی گەلی کوردستان گەلێکی خاوەن هەموو تایبەتمەندییەکانی خۆیەتی لە رووی خاك و زمان و کلتور و مێژوو و شوناس و گشت بنەماکانی پێناساندنی وەکو گەلێك بە هەموو پێکهاتەکانییەوە، بە هەموو پێوەرە مرۆیی و نێودەوڵەتییەکان مافی هەیە بڕیار بدات لەسەر دیاریکردنی جۆری ژیان و داهاتووی خۆی.

گەلی کوردستان هەر لە دروستبوونی دەوڵەتی عێراقەوە خەبات و تێکۆشانی کردووە بۆ چەسپاندنی مافەکانی و بۆ پێکەوە ژیانێکی ئاشتیانە لەگەڵ گەلانی تری عێراقی، بۆ ئەوەی بوونی وەکو گەلێك پارێزراو بێت. لە ئەنجامی خەباتی دەیان ساڵەی بزوتنەوەی رزگاریخوازی گەلی کوردستان، لە چەندین قۆناغدا هەندێك پرۆژە و بەڵێنی پێدراون لەلایەن دەسەڵاتدارانی عێراقەوە، هەرچەندە ئەو ماف و بەڵێنانە بە تەواوی نەدەگونجان لەگەڵ ئامانجەکان و قوربانیدانی گەلەکەمان. نموونە بۆ ئەم پرۆژە و بەڵێنانە دەکرێت ئاماژە بدرێ بە بەیانی بەریتانی – عێراقی لە ساڵی ١٩٢٢ دەربارەی دامەزراندنی حکومەتێکی کوردی ، یاسای زمانە خۆجێییەکان ژمارە (٧٤) ی ساڵی ١٩٣١، لێدوانی فەرمی عێراق دەربارەی بەڵێنەکانی عێراق بۆ کۆمەڵەی نەتەوەکان ، پەیوەستبوونی عێراق بە جێبەجێکردنی خوێندنی کوردی لە کوردستاندا، ماددەی (٣) لە دەستووری کاتی عێراقی ساڵی ١٩٥٨ ، پرۆژەی ئیدارەی لامەرکەزی لە عێراق لە ساڵی ١٩٦٣ ، بەیانی ٢٩ ی حوزەیرانی ساڵی ١٩٦٦ ، رێککەوتننامەی ١١ی ئازاری ساڵی ١٩٧٠ ، یاسای ئۆتۆنۆمی ژمارە (٣٣) بۆ

کۆماری عێراق
هەرێمی کوردستان
سەرۆک

جمهورية العراق
اقليم كوردستان
الرئيس

کوردستان – عێراق ساڵی ١٩٧٤ ، ماددەی ٥٨ لە یاسای بەڕێوەبردنی دەوڵەت لە قۆناغی گواستنەوە ساڵی ٢٠٠٤.

حکومەتە یەک لەدوای یەکەکانی عێراق نەک هەر بەڵگەنامەکانیان پێشێل کردووە و پشتگوێ خستووە، بەڵکو وەڵامی داواکارییەکانی گەلی کورد بۆ مافە ڕەواکانیان بە ئاگر و ئاسن داوەتەوە ، و ئەنجامەکەی کارەسات و ماڵوێرانی بووە بۆ کوردستان، وەک جینۆسایدکردنی گەلی کورد لەژێر ناوی ئەنفال، ڕاگواستنەوەی و نیشتەجێکردنی زۆرەملێ، خاپوورکردنی گوند و ئاوایییەکان و ژێرخانی ئابووری، و بەکارهێنانی گازی ژەهراوی قەدەغەکراو لەسەر ئاستی نێودەوڵەتی لە دژی خەلکی سیڤیل.

هەروەها دوابەدوای پرۆسەی ڕزگارکردنی عێراق لە ساڵی ٢٠٠٣ و ڕوخانی ڕژێمی پێشووی بەعس، و هاتنە پێشەوەی دەرفەتێکی نوێ بۆ بنیادنانی عێراق لەسەر بنەمای دیموکراتی و دامەزراوەیی و هاولاتیبوون کە مافی هەموو پێکهاتەکان تێیدا پارێزراو بێت، گەلی کوردستان سەرەڕای هەموو نەهامەتی و قوربانیدانی، بەشدارییەکی کارای کرد لە ڕێگەی نوێنەرەکانییەوە بۆ بنیاتنانی عێراقی نوێ و دارشتنی دەستووری عێراقی لە ساڵی ٢٠٠٥ کە بووە بناغەیەک بۆ دروستکردنی دەوڵەتی دیموکراتی فیدراڵی پەرلەمانی فرەحیزبی لەسەر بنەمای پرەنسیپی یەکێتی ئارەزومەندانە، و دیاریکردنی بنەماکانی پاراستنی مافی پێکهاتەکان و چارەسەرکردنی کێشە مێژوویییەکانی وڵات، بەڵام لەدوای تێپەڕبوونی چەندین ساڵ لە تەمەنی ئەم دەستوورە ، عێراق هێشتا پڕە لە پێشێلکاری زەقی یاسایی و دەستووری و ئەو بنەمایانەی کە دەوڵەتی نوێی عێراقی لەسەری دامەزرا لە دابەشکردنی ماف و دەسەڵاتەکان لە نێوان ناوەند و هەرێم.

گرنگترین پایەکانی سیستەمی فیدراڵی دابەشکردنی داهات و دیاریکردنی سنووری هەرێمی کوردستانە. لەرووی داراییەوە بودجەی هەرێم بڕدرا. لەرووی دیاریکردنی سنوورەوە، هەرچەندە ناوچە کوردستانییەکانی دەرەوەی ئیدارەی هەرێم لەرووی مێژوو و جوگرافیا و دیموگرافییەوە

جمهورية العراق
إقليم كوردستان
الرئيـــس

کۆماری عێراق
هەرێمی کوردستان
ســـەرۆك

بەشێکن لـە کوردسـتان، بـەڵام سـەرکردایەتی سیاسـی کوردسـتان بـۆ سـەلماندنی نیـەتپاکی و چارەسەرکردنی ئاشتیانەی پرۆسەکە رەزامەند بوون لەسەر ناوەرۆکی ماددەی (١٤٠) ی دەستوور کە نەخشە رێگایەکی دانا و دەبوایە تا کۆتایی ساڵی ٢٠٠٧ پرۆسەی راپرسی گشتی ئەنجام بدرێت، تاوەکو دانیشتووانی ئەو دەڤەرانە بە ویستی ئازادانەی خۆیان بڕیار لەسەر داهاتووی خۆیان بدەن. و سەرکردایەتی کوردستان چەندین جار دووپاتیان کردەوە کە پابەندن بە ئەنجامی راپرسیەکە هەرچییەك بێت، بەڵام حکومەتی عێراقی جێبەجێی نەکرد. هەروەها دروستکردنی ئەنجومەنی فیدراڵیش بەپێی ماددەی (٦٥) ی دەستوور پشتگوێ خرا.

هەروەك لە دیباجەی دەستووردا هاتووە گەلانی عێراق بە ئازادی و ئارەزوومەندانە ئەم یەکێتییەیان هەلبژاردووە، و "پابەندبوون بەم دەستوورە یەکێتی ئارەزوومەندانەی عێراق و گەلەکەی و خاکەکەی و سەرەوەرییەکەی دەپارێزێ" . بە پێچەوانەوە پێشێلکردنی بەندەکانی دەبێتە هۆکاری لێکترازان.

بەهۆی بەردەوامبوونی حکومەت و سەرکردایەتی سیاسی عێراقی لەسەر سیاسەتی پێشێلکردن و پابەندنەبوون بە ناوەرۆکی دەستوور، و پشتگوێخستنی ماف و داواکارییەکانی گەلی کوردستان ، و بەو پێیەی بارودۆخی ناوچەکە و جیهان بە گشتی و عێراق بە تایبەتی وادەخوازێت بڕیارێکی یەکلاکەرەوە بدرێت بۆ داهاتووی ئەم گەلە، و دوابەدوای کۆبوونەوە و راوێژ لەگەڵ لایەنە سیاسیەکانی کوردستان بە گشت پێکهاتەکانیەوە لە رۆژی ٢٠١٧/٦/٧ ، گەیشتینە ئەو دەرئەنجامەی کە پێویستە بگەڕێینەوە بۆ را و ئیرادەی گەلەکەمان بۆ بڕیاردان لەسەر چارەنووس و داهاتووی خۆیان، و لەسەر ئەو بنەمایانە بڕیارماندا بە:

١. ئەنجامدانی راپرسی گشتی لە رۆژی (٢٠١٧/٩/٢٥) لە سەرتاسەری هەرێمی کوردستان و ناوچە کوردستانییەکانی دەرەوەی ئیدارەی هەرێم.
٢. پرۆسەی راپرسی بە دەنگدانێکی گشتی نهێنی راستەوخۆی ئازاد ئەنجام دەدرێت. پرۆسەکە لە کاتژمێر هەشتی بەیانی دەستپێدەکات و تا شەشی ئێوارە بەردەوام دەبێت

کۆماری عێراق
هەرێمی کوردستان
سەرۆک

جمهورية العراق
إقليم كوردستان
الرئيس

٣. بە مەبەستی جێبەجێ کردنی مافی چارەنوس، بەشداربووانی پرۆسەکە بە بەڵێ یان نەخێر وەڵامی ئەم پرسیارەی لای خوارەوە دەدەنەوە ، ئەویش بە دانانی هێمای راست بەرامبەری.

- ئایە دەتەوێ هەرێمی کوردستان و ناوچە کوردستانییەکانی دەرەوەی ئیدارەی هەرێم ببێتە دەوڵەتێکی سەربەخۆ؟

– بەڵێ [√]
– نەخێر [√]

٤. پێویستە دەنگدەر شیاوی دەنگدانی تێدا بێت بەپێی یاسا و رێنماییە پەیرەوکراوەکان.

٥. کارتی دەنگدان بە زمانەکانی کوردی و عەرەبی و تورکمانی و سریانی بە شێوەی چاپکراو بە روونی دەنوسرێت.

٦. ئەو بژاردەیەی کە زورینەی دەنگ وەردەگرێت بە براوە ئەژمار دەکرێت، و دەبێتە ئیرادەی گشتی گەلی کوردستان بە گشت پێکهاتەکانییەوە.

٧. سەبارەت بە تۆماری دەنگدەران و ریکلام و دەنگدان وتاوانی هەڵبژاردن ئەو ئەحکامانەی لە یاسای هەڵبژاردنی پەرلەمانی کوردستان ژمارە ( ١ )ی ساڵی ١٩٩٢ی هەموارکراو و یاسا پەیوەندیدارەکاندا هاتوون جێبەجێ دەکرێن.

٨. کۆمسیۆنی باڵای سەربەخۆی هەڵبژاردن و راپرسی لە کوردستان هەڵدەستێت بە ئەنجامدان و سەرپەرشتی کردنی راپرسیەکە وئامادەکردنی تۆماری دەنگدەران و جیاکردنەوە و ژماردنی دەنگەکان وبلاٌوکردنەوەی ئەنجامەکانی. لەم بارەیشەوە پەیرەوی رێنمایی و ئەحکامی یاسا پەیوەندیدارەکان و ستاندەرە جیهانییەکان دەکات.

٩. کۆمسیۆنی باڵای سەربەخۆی هەڵبژاردن و راپرسی هەماهەنگی دەکات لەگەڵ ئەنجومەنی باڵای راپرسی لە کوردستان بۆ جێبەجێکردنی پرۆسەکە.

١٠. دامەزراوە حکومیەکان و حیزبییەکان بۆیان نییە بەهیچ شێوەیەک لە شێوەکان دەستێوەردان بکەن لە کاروباری بەرپرسان و سەرپەرشتیاران و ئەنجامدەرانی پرۆسەی راپرسی، و ریگا نادرێت هیچ کەس و لایەنێك دەستبخاتە ناو کاروبار و دەسەڵاتەکانی کۆمسیۆنی باڵای

كۆماری عێراق
هەرێمی كوردستان
سەرۆك

جمهورية العراق
اقليم كوردستان
الرئيس

سەربەخۆی هەڵبژاردن و راپرسی لە كاتی ئەنجامدانی ئەركەكانی بە بێلایەنانە وسەربەخۆیی و دەستپاكی وئاشكرایی تەواو بە پێی یاساكان.

١١. لایەنە پەیوەندیدارەكان بواری پێویست دەرەخسێنن بۆ بەشداری كردنی تێكرای ئەندامانی گەل و گرەنتی ئازادی رادەربڕین و گردبونەوە و هاتوچۆ ودەنگدان بە پێی یاسا پەیرەوكراوەكان دەكەن ، و ئاسانكاری و هەماهەنگی دەكەن لەگەڵ كۆمسیۆنی باڵای سەربەخۆی هەڵبژاردن و راپرسی بۆ بەرێوەچوونی پرۆسەكە.

١٢. مسۆگەركردنی بەشداریكردنی لایەنە پەیوەندیدارە بیبیانییە فەرمی و نافەرمییەكان و رێكخراوەكانی كۆمەڵگەی مەدەنی و میدیا لە چاودێریكردنی گشت كاروباری ریكلام و بەریوەچونی دەنگدان و جیاكردنەوە و ژماردنی دەنگەكان و بڵاوكردنەوەی ئەنجامەكان.

١٣. كۆمسیۆنی باڵای سەربەخۆی هەلبژاردن و راپرسی كار دەكات بۆ رەخساندنی بوار بۆ بەشداری رەوەندی كوردستانی لە دەرەوە لەم راپرسیەدا.

مسعود بارزانی

سەرۆكی هەرێمی كوردستان

هەولێر

٢٠١٧/٦/٨

Belgenameya hejmara 2-ê

Serokatiya Herêma Kurdistan

Konseya Bilind ya Referandumê

# Biryar

Hejmar (4), 2017

Komara Iraqê
Herêma Kurdistanê
**Serok**

# Biryar

Hejmar: 4, sal: 2017

Di bin ronahiya civînên Konseya Bilind ya Referandumê yên di 23/8 2017 û 27/8 2017-ê de û ji bo zêdetir organîzekirina karûbarên konseyê biryar hat dan ko:

**Ya yekê: Pêkanîna sekreteriya konseyê**

A. Pêkanîna sekreteriyê ji bo Konseya Bilind ya Referandumê bi serpereştiya serokê dîwana serokatiya herêma Kurdistanê rêzdar Fuad Husên û beşdariya van rêzdarên li xwarê:

1. Hişyar Zêbarî
2. Sedî Ehmed Pîre
3. Xelîl Îbrahîm
4. Ebdurehman Faris (Ebû Karwan)
5. Behmen Hisên
6. Nûnerên pêkhatiyên li herêma Kurdistanê
7. Dilşad Şehab: nûnerê hikûmeta herêma Kurdistanê
8. Nûnerê Parlamentoya Kurdistanê

**B. Erk û karên sekreteriyê dê bi vî rengê li xwarê be:**

1. Organîzekirina civînên Konseya Bilind ya Referandumê û dokumantasyona wan civînan.
2. Amadekirina ajandaya civînên Konseya Bilind ya Referandumê.
3. Lidûvçûna biryarên Konseya Bilind ya Referandumê û agahdarkirina konseyê ji encamên wan biryaran.
4. Hemahengî digel hikûmeta Iraqa federal û welatên biyanî û digel cîranên herêma Kurdistanê û organîzekirina serdanên heyetên danûstandinan.

**Ya didoyê: Pêkanîna komîteya ragihandinê**

A. Pêkanîna komîteya ragihandinê bi serpereştiya rêzdar Mela Bextiyar û beşdariya van rêzdarên li xwazê:

1. **Mehmûd Mihemed:** berpirsê ofîsa ragihandinê ya Partiya Demokrat ya Kurdistanê
2. **Yehya Rêşaweyî:** berpirsê ragihandinê yê Yekgirtûya Îslamî ya Kurdistanê
3. **Hendirên Ehmed:** berpirsê ragihandinê yê Hizba Şiyû'î ya Kurdistanê
4. **Hîwa Seyîd Selîm:** berpirsê ragihandinê yê Hizba Zehmetkêşên Kurdistanê
5. Nûnerê pêkhatiyan li herêma Kurdistanê
6. **Ebdullah Enwer Ebdullah:** ji serokatiya herêma Kurdistanê
